# Gelo ez sûcdar im?
# Gelo em sûcdar in?
# Gelo ew sûcdar in?

Stenbol - Amed / Nisan 2012

Weşana Projeyê

Kurdî

Ev projeya hîbeyê ji hêla
Yekîtiya Ewrupayê û Hikumeta Komara Tirkiyê ve
tê fînansekirin.

Ev pîrtûkok ji bo projeyeke hîbeyê ku bi hevkariya Weqfa Çand û Hunerê Ya Başakê û ÇAÇA'ya li Amedê (Çocuklar Ayni Çatinin Altinda Derneği- Komeleya Zarok Di Bin Heman Banê De Ne) tê birêvebirin û ji hêla projeya hîbeyê ya bi navê "Pêşxistina Dîyalogê Di Navbera Saziyên Civaka Sîvîl De" ku Meqama Peymanê ya wê Yekeya Fînansa Navendî û İhale ye tê piştgirîkirin, hatiye amadekirin.

**Stenbol – Amed Nîsan 2012**

**" Gelo ez sûcdar im? Gelo em sûcdar in? Gelo ew sûcdar in?"**

**Nexşedanîn: Özgür Ekin Şahin, Enrico Cattabriga**

**Qapax: Enrico Cattabriga**

**Çap: Can Kardesler**

**Wergêra Îngîlîzî: -**Elif Özkaya, Sinem Şekercan

**Wergêrê Kurdî:** Muhammet Gözütok

**Amadekirin ji bo weşanê:** Ayşe Tepe Doğan – Handan Çağlayan

Ev belge bi alîkariya malî ya Yekîtiya Ewrupayê hatiye amadekirin. Ji naveroka vê belgeyê tenê Weqfa Çand û Hunerê Ya Başakê û ÇAÇA berpirsiyar e û ev naverok bi tu awayî nêrîn û helwesta Yekîtiya Ewrupayê nîşan nade.

**Başak ve Kültür ve Sanat Vakfı**

Kayışdağı Mah.Uslu Cad.Nihat Sok.
No55/A-Ataşehir/İstanbul
Tel&Fax: 0216 540 2 462
www.basaksanatvakfi.org.tr

**Çocuklarla Aynı Çatının Altında Derneği (ÇAÇA)**

Ofis Ekinciler Cad.Krıstal Apt.Kat 5 No21.
Yenişehir /Diyarbakır
Tel.04122239153
cacader@mynet.com

**FÊHRİST**


- Pêşkêşî
- Têgihana Zarokan A Li Ser Sûc, Xebata Anketa Amedê – Stenbol, Sermawez 2011, Nirxandina Kurte
- Bi Mazûbaniya Zarokên ku Hêviya Siberojê Ne Panel û Forumek: Zarok, Koçberî û Sûc
- Atelyeyên Fotografê û Çîrok Ji Zarokan
- Yücel Tunca, *Serokê Weqfa Fotografê*, Fotografên Ku Hesab Ji Sûc Dipirsin,
- Çîrok Ji Zarokên Ku Li Stenbolê Ne
- Çîrok Ji Zarokên Ku Li Amedê Ne
- Ji Çapemeniyê
- Müge İplikçi, “ Gelo ez sûcdar im? Gelo em sûcdar in? Gelo ew sûcdar in?”
- Banu Tuna, Zarok Çawa Dibin Tînerkêş?
- Feryal Saygılıgil, Sûcdar Kî Ye
- Pınar Öğünç, Li Ser Pîrozgeha 23’yê Nîsanê Wan Bidin Rûniştandin

# PÊŞKÊŞÎ

Zarok bi tevî dinyaya ku pêş dikeve û diguhere, her roj hîn zêde di rewşeke xeternak de dijîn û mixabin hîn zêde ber bi sûckirinê tên dehfdan. Fakterên sereke yên vê pêşketina nerênî ew fakterên sosyo-ekonomîk û polîtîk in ku edaleta civakî têk dibin, bi tevî tund û tûjiya aborî, her cure tund û tûjiyê kûrtir û firehtir dikin. Ev fakterên navborî çawa ku bandor li ser jiyana civakî dike, wisa jî bandor li ser malbatê dike, zarokan li hember xetereyan hîn bêtir bê parastin dihêle. Ji hêla din ve jî pêşketinên teknolojiya zanyarî û ragîhandinê, bandora medyayê ku her roj zêdetir dibe, zêdebûna hişyarkerên ku bandor li ser zarokan dikin ji bo zarokan fakterên xetereyê zêdetir dikin.

Îro em dibînin ku têgeha sûc bi hêsanî bi tevî zarokan tê bikaranîn. Lê belê zarokatî kategoriyeke yekcar xweser e. Divê neyê jibîrkirin ku têgeha sûc ji bo kesên gihîştî û ji bo zarokan di heman çarçoveyê de nayê bikaranîn. Naxwe fakterên nû li ser fakterên li jorê zêde bin ku zarokan ber bi sûckirinê dehf didin û her yek bi tena serê xwe dibin çavkaniya îstîsmar û tund û tûjiyê. Ji bo pêkanîna nêzîkahiyeke ku zarokan dixe navenda xwe divê şert û mercên civakî yên ku zarokan ber bi sûckirinê dehf didin werin diyarkirin, ji bo parastina zarokan ji xetereyên tund û tûjî û cihêkarî û îstîsmarê ku her roj zêde dibin divê mekanîzmayên bihêztir û bibandortir ên parastger û bergir werin danîn.

Mirov dikare bêje ku li welatê me guherîna nêzîkahiya li ser vê mijarê gelek dereng dest pê kir û ev guherîn bi awayekî giran didome. Bi pêkhatina Zagona Parastina Zarokan ku di sala 2005’an de kete meriyetê, li ser zarokên ku “pêwîstiya wan bi parastinê hene” û “ber bi sûckirinê tên dehfdan” mekanîzmayên parastger û xalên taybet ên ji bo darizandina zarokan hatin danîn.[1]

---

[1] Di zagona navborî de di xala çaran a li jêr sernivîsa Rêbazên Bingehîn de ji bo parastina mafên zarokan gelek bergirî hatine rêzkirin.

Xala 4 – (1) Di bicihanîna vê zagonê de ji bo parastina mafên zarokan;
a)Mafên jiyîn, pêşketin, parastin û beşdarîkirinê yên zarokan tên misogerkirin,
b)Girîngîdayîn ji bo sûdewarî û qenciya zarokan,
c)Zarok û malbata zarok divê li rastî cihêkariyan neyên,
d)Zarok û malbata zarok divê werin agahdarkirin û bi vî awayî beşdar bin ji bo pêvajoya biryargirtinê
e)Divê zarok û malbata zarok bi hevkariya kes û saziyên peywendîdar û saziyên civaka sîvîl kar bikin,
f)Şopandina rê û rêbazên bibandor û bilez ên li ser mafên mirovan û dadê ava dibin,
g)Di pêvajoya lêpirsîn û taqîbatan de divê pûte bi rewşa zarok were dayîn,
h)Di girtin û bicihanîna biryaran de piştgirîkirina perwerdehî, xwendin, pêşxistina kesayetî û berpirsiyariya civakî ya ku bi temen û pêşketina zarok re diguncên,
î)Bergiriyên ku azadiya zarokan bi sînor dikin û cezayên hepskirinê, divê wek çareya dawîn werin bikaranîn,
j)Dema ku biryara bergiriyê tê dayîn xweyîkirin di saziyê de û girtin di nav saziyê de wek çareya dawîn were dîtin û di girtin û bicihanîna biryaran de berpirsiyariya civakî were parvekirin,
k)Li saziyên ku zarok tên xweyîkirin, parastin û li saziyên ku biryarên bergiriyê tên bicihanîn divê zarok li derveyî cihên kesên gihîştî bimînin,
l)Dema ku di heqê zarokan de biryar û hukmên dadê tên bicihanîn divê bergirî werin stendin ku nasnameya zarokan ji hêla kesên din ve neyê kifşkirin,
ev rêbaz tên bicihanîn… (http://www.mevzuat.adalet.gov.tr/html/1527.html )

Bêguman danîna mekanîzmayên wekî Zagona Parastina Zarokan ku pêşikiyê dide parastina zarokan girîng e. Lê belê eşkere ye ku di jîngeheke wisa de ku bêedaletiyên civakî û çavkaniyên tund û tûjiyê heyîna xwe didomînin, digel xalên zagonê zarok dê di xetereyê de bin. Ji ber vê jî ji bo parastina zarokan û nehiştina fakterên ku zarokan dixin xetereyê, peywirên girîng dikevin ser milên sazî û kesayetiyên peywendîdar.

Em jî wek saziyeke ku bêtir derbarê zarok û ciwanan de dixebite, xwe di vê mijarê de berpirsiyar dibînin. Di xebatên xwe yên bi salan ên li ser zarokan de me ji nêz ve fakterên xetereyê yên ji bo zarokan û fakterên ku zarokan ber bi sûckirinê dehf didin, dîtin. Di encama çavdêriyên xwe de me xwe hîn zêde berpirsiyar dît. Em gîhiştin wê biryarê ku divê em bêtir bixebitin. Me di xebatên xwe de bêtir bala xwe da ser tedbîrên bergir. Lewre me fêm kir ku ji berê de destnîşankirina fakterên ku rê didin îstîsmariya zarokan û zarokan ber bi sûckirinê dehf didin pir girîng e. Di vê çarçoveyê de ji bo ku balê bikşînin ser wan fakterên ku rê didin îstîsmarkirina zarokan û zarokan ber bi sûckirinê dehf didin, me xebateke bi navê “Gelo ez sûcdar im? Gelo em sûcdar in? Gelo ew sûcdar in?” pêk anî. Piştre jî wekî ku dê were fêmkirin me hewl da têgihanên li ser “sûc” eşkere bikin.

Eşkere ye ku bi qasî mezinahî û firehiya pirsgirêkê qadeke berfireh a xebatê li ber me ye. Em ne di wê îdîayê de bûn ku xebateke wisa bikin ku tevahiya vê qadê bixe nava xwe. Ji ber ku xebatên berê yên weqfa me li ser wan koman bû ku li rastî koçberiya mecbûrî hatibûn, me xwest ji hêla koçberiya mecbûrî em li ser vê mijarê bixebitin. Lewre li gor çavdêriya me koçberiya mecbûrî ya ku di salên 1990’an de qewimîbû û bandoreke travmatîk li ser civakê kiribû, wan şert û mercên civakî yên ku zarokan îstîsmar dike û zarokan ber bi sûckirinê dehf dide, kûrtir kiribû. [2]

Tund û tûjiya ku di dema koçberiyê de diqewimin, ji warê xwe bûyîn, veqetîna, hepskirin yan jî windabûna hin endamên malbatê, zehmetiyên cihê nû yê piştî koçberiyê jî hin ji wan fakteran e ku şert û mercên navborî kûrtir dikin. Bi taybetî divê em qala hejariya ku piştî koçberiyê, ango hejariya ku li cihê nû koçber lê rast tên, bikin. Lewre ji bo zarokan yek ji encamên herî girîng ên koçberiyê karkeriya zarokan e ku ev yek him ji hêla aborî ve him jî ji hêla din ve rê ji îstîsmarkirina wan vedike. Karkeriya zarokan yek ji birînên kûr ên welatê me ye û zarokên ku mexdûrên koçberiya mecbûrî ne li qayî hemû encamên wê yên xirab hatin û hîn jî ev yek didome. Ji ber vê jî me wisa rast dît ku em li ser koçberiya mecbûrî nêzikî mijarê bin.

Me xebata xwe ya bi navê “Gelo ez sûcdar im? Gelo em sûcdar in? Gelo ew sûcdar in?” wekî ku li jorê jî hate gotin li du bajarên ku koçberî lê dibin, pêk anî. Dema ku me xebata xwe didomand me xwest em fakterên xweser ên ku li van bajaran zarokan ber bi sûckirinê dehf didin, kifş bikin û bizanin ka li hember van fakterên xweser bergiriyên çawa dikarin werin girtin û bergirî divê ewil ji hêla kîjan saziyan ve werin girtin. Di vê çarçoveyê de me çalakiyên ji hev cihê yên wekî anket, drama, atelyeya fotografê bi hev re kirin.

[2] Binihêrin xebatên me yên li ser bandorên xirab ên koçberiya mecbûrî ya salên 1990’an ên li ser zarok û ciwanan. Weqfa Hunerê Ya Başakê, 2004, SES ÇİK (Neke Pirsgirêk, xwedî lê derkeve) SES DUY (Bandorên Koçberiya Mecbûrî Ya Li Ser Zarok Û Cîwanan 2004-2010, ENCAMÊN LÊKOLİNÊN HEVBERKÎ (Weqfa Çand û Hurenê Ya Başakê 2010), Çağlayan Handan, Özer Şemsa û Ayşe Tepe Doğan ÇÎ GUHERÎ (Ezmûna Koçberiya Mecbûrî ya Jinên Kurd, İstanbul Ayizi Yayınları (2011).

Ji bo ku em bizanin ka manendî û cihêtiyên navbera herêman çi ne, di hêvî û karîna zarokan de çi guherîne, têgihana sûc a zarokan û ramanên wan ên li ser egerên tawanê çi ne, me pêşî xebata anketê pêk anî. Piştî xebata anketê wekî drama û atelyeyên fotografê me du xebatên atelyeyê pêk anîn. Di atelyeya dramayê de bi tevî zarokan xebata dramaya ku mijara wê sûc, zarok û medya ye, hate kirin. Di atelyeya fotografê de xebatên fotograf, pêkanîna çîrokên dîtbarî, nivîsandina gotarên li ser sûc, sûcdar û zarok, pêkanîna hevpeyvînê, xwendewarî û nivîskariya medyayê, pêkanîna çîrokê hatin kirin. Ev xebat li Stenbol û Amedê li cihên cihê cihê hatin nîşandan. Me bi panel/foruma ku mijara wê "Bi Mazûbaniya Zarokên ku Hêviya Siberojê Ne Panel û Forumek: Zarok, Koçberî û Sûc" bû û me bi beşdariya pisporên vê mijarê li dar xistibû, projeya xwe bi dawî anî. Dema ku me di panelê de li ser mijara zarok û sûc gengeşî dikir, helbet me kirdeya mijarê, ango zarok ji bîr nekirin. Me xwest em mafê axaftinê bidine wan û bila ew ramanên xwe bibêjin. Me encamên xebatên xwe ji bo ku bi awayekî berfireh bigihînin raya giştî di vê pirtûkê de kom kirin.

Di pirtûkê de li gel nirxandina kurt a li ser encamên anketa ku me li Amed û Stenbolê pêk anîbû, hûn dikarin gotarên panela ku me di dawiya xebatê de li dar xistibû, dîtin û çavdêriyên perwerdekarên me yên atelyeyê û xebatên zarokan bixwînin.

Em hêvîdar in ev proje di mijara zarok û sûc de balê bikşîne ser nêzîkahiya ku zarokan dixe navenda xwe û her wisa bibe hincet ku ji bo parastina zarokan bergiriyên bibandortir werin girtin.

## Spas;

Ji ber ku di amadekirina pirsên anketê de alîkarî kirin ji Behice Boran, Figen Paslı û Emrah Kırımsoy re; ji ber ku holên nîşandayînê bê destmiz dan ji Anadolu Kültür re, ji ber piştgiriyên teknîkî ji Tuğçe Bahadir, Emre Murat Ermiş û Nejat Taştan re; ji ber ku moderatoriya panela me kir, ji Gülnur Elçik re; ji ber ku ji me re wext veqetandin, zanîna xwe bi me re parve kirin, ji Pınar Öğünç, Nihat Tarımeri, Ayşenur Demirkale, Serra Muderrisoğlu, Yüce Yöney û Abdulkadir Güger re; ji ber ku piştgiriya redaktekirina bangewaziyên me kir, ji Nalan Kutlay re; ji ber ku ji zarokan re perwerdehiya fotografê dan, ji perwerdekarên xwe Yücel Tunca û Kibar Suvari Bozkuş re; ji ber ku di atelyeya dramayê de xebatên perwerdehiyê pêk anîn, ji Hasan Bahan Gönce û Berîvan Kaya re; ji ber ku bi tevî şirîka me ya projeyê ÇAÇA kreatoriya pêşaneya fotografê ya projeyê kiriye ji Enrico Cattabriga re; ji ber keda wî ya li Amedê ji şêwirmendê projeyê Taşkın Adıguzel re, ji ber ku malpera me danîye û rojane kiriye, ji Mehmet Deniz Perçin re; ji ber ku li Amedê bi zarokan re xebata atelyeyê pêk anî; ji koma muzîkê ya Başakê re, ji ber ku redaksîyona dawîn a pirtûkê kir, ji Baver Demircan re; ji ber ku pirtûk wergerandiye Kurdî ji Muhammet Gozutok re, ji ber ku pirtûk wergerandiye Îngîlîzî ji Sînem Şekercan re, ji ber dîzayna dîtbarî ji Mehmet Gtzel re; ji ber ku anketoriya projeyê kirin, ji Kadriye Kurt, Reyzan Şahin, Uğur Kaya û Abdulaziz İnce re; ji ber ku di panelê de xebitîn ji hevalên me yên ciwan Derya Aydın, Elif Dilan Güntaş, Aliye Kurd, Dilan Alabuga, Gökhan Ballıkaya, Hasret Kaya û Sercan Şengül re; ji ber ku di organîzasyonê de gelek keda wan heye ji Nurettin Erbek û Özgür Şahin re; ji ber ku holên xwe yên pêşaneyê ji me re veqetandin ji Şaredariya Bajarêmezin a Amedê; ji koma projeyê re; ji endamên çapemeniyê yên ku proje dan nasînê re; ji xebatkarên hola pêşaneya depoya Titûnê û xwaringeha Cezayîrê re; ji ber ku pirtûk ji bo weşanê amade kirin ji Ayşe Tepe Doğan û Handan Çağlayan re û ya herî girîng jî ji ber ku di projeyê de xebitîn, xwedî li projeyê derketin û di nav projeyê de cih girtin ji zarok û malbatên wan re em spas dikin.

***Weqfa Çand Û Hunerê Ya Başakê***

# *"GELO EZ SÛCDAR İM?*
# *GELO EM SÛCDAR İN?*
# *GELO EW SÛCDAR İN?"*

## Têgihana Zarokan A Li Ser Sûc
## Xebata Anketa Amed – Stenbol, Sermawez 2011

### Nirxandina Kurt

Encamên anketa ku di sala 2011'an de li Amed û Stenbolê bi 108 zarokan re, bi hevdîtinên rû bi rû hatiye kirin, ji hêla weqfa me ve berê hatibûn weşandin.[3] Li vir tenê li ser vedîtinên ku hatine bidestxistin, nirxandineke kurt were danîn.

Armanca lêkolîna ku me di nav projeyê de kiribû, bi têgihan û gotinên zarokan vekolîna aliyên civakî, psîkolojîk û aborî yên mijara zarok û sûc û di vê mijarê de afirandina haydariyek bû. Di anketê de li gel pirsên li ser têgihana têgehên wekî edalet, sûc, wekhevî, tund û tûjî hwd., hêviyên bêjedaran jî hatine pirsîn û bi vî awayî li ser çareseriyê done hatine komkirin. Her wisa li ser cihê jiyanê, zimanê nav malê, hejmara kesên ku li malê dijîn, rewşa sosyo-ekonomîk pirs hatine kirin û bi vî awayî di lêkolîna xwe de me xwest egerên lipişt û têgihanên beşdaran ên li ser vê mijarê eşkere bikin.

Anket, bi tevî zarokên ku ji bo sûckirinê hatine dehfdan, bi zarokên ku di bin xetereyên cur bi cur de ne, hatiye kirin.

Lêkolîn li du bajarên cihê, ango li Amed û Stenbolê hatiye kirin. %27'ê (14 kes) bêjedarên li Amedê keçik, %73'ê (36 kes) bêjedarên li Amedê kur in; %47'ê (27 kes) bêjedarên li Stenbolê keç, %53'ê (31 kes) bêjedarên li Stenbolê kur in.

Li gor vedîtinên anketê ji bo zarokên ku ber bi sûckirinê hatine dehfdan koçberî diyardeyeke balkêş bû. Ji nîvî bêtir (%57) zarokên ku li Amedê tev li anketê bûbûn ji gundên derûdorê hatibûn; bersivdarê li Stenbolê, hema di heman rêjeyê de ji bajarên herêmê koç kiribûn. Piraniya bersivdaran di nav malan de dijîn, %16'yê zarokên li Stenbolê û %8'ê zarokên li Amedê ragîhandine ku li derveyî malan (li wargehan yan jî li cihên karkirinê yên wekî depoya tiştên hişk ên ku hatine avêtin) dijîn. Ji çaran yekê zarokên li Amedê (%24) li malên qerebalix yên deh, donzdeh kesî dijîn û li Stenbolê rêjeya zarokên ku li malên wisa qerebalix dijîn kem e (%5).

Hejarî tabloya hevpar a wan malan e ku ev zarok lê dijîn. Ji nîvî bêtir (%56) xaniyên zarokên ku li Amedê ne, pêwîstiyên bingehîn bi cih naynin û rêjeya xaniyên li Stenbolê yên ku pêwîstiyên bingehîn bi cin naynin %24 e. Ji ber ku piraniya malbatan nikarin pêwîstiyên bingehîn bi dest bixin, zarok li derveyî sîstema perwerdehiyê dimînin û dibin karkerên zarok. Her wisa digel ku piraniya wan di temenê perwerdehiya bingehîn de ne, qeyda %12'yê zarokên li Amedê û %14'yê zarokên li Stenbolê li dibistanan tune ye. Rêjeya zarokên ku di karekî de

[3] Ji bo xwendina nirxandineke berfireh a li ser encamên anketê hûn dikarin li malpera Weqfa Hunerê Ya Başakê binihêrin. http://www.basaksanatvakfi.org.tr/suclumuyum/projeanket.pdf

dixebitin (dema ku anket hatiye kirin an jî beriya ku anket were kirin) li Amedê %82 û li Stenbolê %55 e. Di mijara îstîsmarkirina zarokan û ber bi sûckirinê dehfdana zarokan de ji ber hejariyê bêparman ji perwerdehiyê û zarokên karker diyardeyên wisa ne ku mirov nikare paşguh bike.

Li ser diyardeya dehfdana zarokan ber bi sûckirinê, hate dîtin ku di navbera Stenbol û Amedê de cihêtî heye. Ji bo pirsa "pirsgirêkên we bi zagonan re heye yan na" li Amedê %10, li Stenbolê %29 bersiva "erê" hatiye dayîn. Piraniya zarokên ku bersiva "erê" ji bo vê pirsê daye di wê baweriyê de ne ku "neheqî li wan tê kirin".

Dema ku tund û tûjî hatiye gotin ewil tund û tûjiya ku zarok li malê lê rast tên, hatiye bîra zarokan. Bi taybetî li Amedê hema bêje tevahiya zarokan (%94) bi vî şiklî bersiv daye û ji ber vê jî mirov dikare bêje ku zarok bi awayekî giştî di nav malbatê de li rastî tund û tûjiyê tên. Her wisa li nav zarokên li Amedê wexta ku qala tund û tûjiyê hatiye kirin şkence jî hatiye bîra hin zarokan. Ev bersiv jî, mirov dikare bêje bi rewşa polîtîk a bajêr re girêdayî ye. Di nav bersivên zarokên li Stenbolê de hebûna "tund û tûjiya li hember jinan" nîşan dide ku nûçe û şiroveyên ku di çapemeniyê de dij li tund û tûjiya li hember jinan hatine dayîn, wisa kiriye ku zarok bibin xwedî têgihaneke bi vî şiklî.

Yek ji pirsên anketê li ser wê bû ku zarok çawa sûc terîf dikin. Li gor bersivan dema ku sûc hatiye gotin li gel diyardeyên edlî yên wekî kuştin, dizitî, narkotîk; pirsgirêkên civakî yên wekî tund û tûjiya li hember jinan û bêedaletiya civakî hatine bîra zarokên li herdu bajaran.

Divê mirov li ser têgihana zarokan a li ser egerên ku mirovan ber bi sûckirinê dehf didin, bisekine. Di herdu bajaran de zarok di serî de dizitiyê, zexta civakî, hejarî û beedaletiyê di nav egerên ku mirovan ber bi sûckirinê dehf didin de rêz kirine.

Di herdu bajaran de jî dema ku edalet hatiye gotin ji cezakirinê wêdatir bicihanîna mafên bingehîn hatiye bîra zarokan. Jixwe rêjeya zarokên ku ji bo vê pirsê bersiva cezakirinê dane li Amedê %8, li Stenbolê jî %19 ye û rêjeya zarokên ku ji bo vê pirsê bersiva "azadî, wekhevî, demokrasî…" dane li Amedê %39 û li Stenbolê %47 e.

Bersivên pirsa tund û tûjî çawa kêm dibe nîşan didin ku zarok bawer dikin ku tund û tûjî dikare were kêmkirin. Zarok wisa bawer dikin ku ragîhandin û empatî dê tund û tûjiyê kêm bikin. Ji hêla din ve jî bersivên zarokan nîşan didin ku zarok haydar in ku di navbera dehfdan ber bi sûckirin û pirsgirêkên maddî de peywendiyek heye. Her wisa di nav egerên ku mirovan ber bi sûckirinê dehf didin de zarokên li Amedê %47 û zarokên li Stenbolê jî %36 fakterên aborî yên wekî bêkarî, rêz kirine. Peyva "bêçaretî" ya li nav bersivan nîşan dide ku zarok hesta bêçaretiyê nas dikin.

Di bersivên li ser nehiştina tund û tûjiyê de xala ku balê dikşîne ev e ku li Amedê herî zêde (%35) bersiva nehiştina pirsgirêkên maddî û pêkanîna derfetên kar hatiye dayîn. Li Stenbolê jî %21 edalet û wekheviyê wek bersiva vê pirsê daye. Li Amedê bersiva duyem a vê pirsê aştî û azadî ye, li Stenbolê bersiva duyem a vê pirsê jî nehiştina pirsgirêkên maddî ye.

Bersivên ku ji bo pirsa "Gelo herî zêde kî serî li tund û tûjiyê didin" nîşan didin ku tund û tûjî li ku û çawa dest pê dike û ji bo zarokan çawa zemîneke sûckirinê pêk tîne. Tiştekî balkêş e ku li Amedê ji bo vê pirsê bi rêjeya %47 vebijêrka malbatan (dayik û bav) û bi rêjeya %39 jî vebijêrka mamosteyan wek bersiv daye. Li Stenbolê jî %40'ê beşdaran ji bo vê pirsê vebijêrka dewlet, artêş û polîs wek bersiv daye û ev bersiv girêdayî wê rewşa polîtîk e ku koçberiyê pêk aniye. Li Amedê %27'ê beşdaran heman bersiv daye.

%78'ê beşdarên li Amedê ji bo cihê tund û tûjiyê vebijêrka mal, dibistan û kolan (her der) nîşan daye, %29'ê beşdarên li Stenbolê ev vebijêrk wek bersiv daye.

Tiştekî girîng e ku %82'yê beşdarên li Amedê û %60'ê beşdarên li Stenbolê ji bo nehiştina tund û tûjiyê bersiveke erênî daye û her wisa tiştekî balkêş e ku %40'ê beşdarên li Stenbolê di vê mijarê de bersiva neyînî daye. Beşdarên herdu bajaran jî wisa difikirin ku lihevhatin, edalet û aştî dikarin rê li tund û tûjiyê bigirin. Di heman demê de ramana firehbûna azadiya jinan dikare tund û tûjiyê kêm bike ji bo beşdaran gotineke girîng e.

Wek encam, di anketa ku li Amed û Stenbolê hatin kirin de her çiqas bi awayekî giştî bersivên hevpar ji pirsan re werin dayîn jî, li gor cihên ku beşdar lê dijîn carna bersiv cihê bûne. Her wisa mirov dikare bêje ku him bûyerên ku rojane mîrov lê rast tên û him jî nûçeyên ku di çapemeniyê de cih digirin bandor li ser nêrînên zarokan yên li ser sûc, tund û tûjî, edalet, maf, wekhevî û hwd. dikin.

Bersivên ku hatine dayîn ji bo herdu bajaran jî carna bêhêvîbûna zarokan nîşan bide jî, pêşniyarên wan ên ji bo nehiştina tund û tûjiyê û hêviyên wan ji bo me pir girîng in. Bersivên zarokan ên li ser tund û tûjî ji hêla kê tê kirin û tund û tûjî li ku tên kirin, ji bo çareseriyê rê nîşan dide.

***Bi Mazûbaniya Zarokên ku Hêviya Siberojê Ne Panel û Forumek***

# ZAROK, KOÇBERİ Û SÛC

*Ev çalakiya ku di forma panel-forum bû di 31 Adar 2012'an de li Stenbolê, di Cezayîr Restorantê de hate lidarxistin. Di panela ku moderatoriya wê Gülnur Elçik kiribû de nivîskara rojnameya Radîkalê Pınar Öğünç, ji Bianetê Yüce Yöney, ji Zanîngeha Boğaziçiyê Doç. Dr. Serra Muderrisoğlu, ji Baroya Stenbolê perêzer Ayşenur Demirkale, Rêvebirê Şubeya Xizmetên Zarok û Kreşê yê Şaredariya Bajarê Mezin ê Amedê Abdulkadir Güger, Pisporê Xizmeta Civakî Nihat Tarımeri wek gotarbêj tev lê bûn. Ew zarokên ku tev li projeya me ya bi navê "Gelo Ez Sûcdar Im? Gelo Em Sûcdar In? Gelo Ew Sûcdar In?" bûbûn tenê bi guhdarkirina panelê neman. Wan mafên axaftinê girt û ramanên xwe gotin. Axaftina vekirinê ya panel-forumê koordînatora projeyê Hümeyra Tusun Yeğinê kir û Şêwirmendê Projeyê Taşkın Adıguzel jî gotar pêşkêş kir.*

## Axaftina Vekirinê

## HÜMEYRA TUSUN YEĞİN

### *Weqfa Çand û Hunerê Ya Başakê (Koordînatora Projeyê)*

Dostên hêja, endamên hêja yên çapemeniyê, ciwan û zarokên ezîz, hûn hemû bi xêr hatin. Îro ji bo gengeşîkirina mijarekê ku em hemû ji nêz ve peywendîdar in û ji bo lêgerîna rêyên çareseriya vê mijarê em hatin ba hev. Îro em ê li ser zarokên ku hêviya sibêroja me ne, biaxivin. Bêguman li ser vê mijarê her kes xwedî ramanekê ye. Baş e, di vê pêvajoyê de em çiqas guh didine zarokan, em çiqas hewl didin ku zarokan fêm bikin? Gelo em dikarin guh bidin zarokan ku kirdeyên vê mijarê ne û gelo çavdêriya egerên ku wan ber bi sûckirinê dehf didin, dikin? A ha ji ber van pirsan, em wek Weqfa Çand û Hunerê Ya Başakê bi tevî ÇAÇA'yê me dest bi vê projeyê kir. Me xwest em têgihan, gotin û ji hemûyan jî girîntir hestên zarokan

eşkere bikin. Îro, li vir bi hev re em ê fikrên xwe parve bikin. Em ê ne tenê di çarçoveya yasayî de, di heman demê de di çarçoveya civaknasî, psîkolojî û têgihana civakî de li ser egerên ku zarokan ber bi sûckirinê dehf didin nîqaş bikin. Bi tevî saziyên cihê yên civaka sîvîl, akademîsyen, hiqûqnas, pispor, nûnerên rêveberiyên deverî û bêguman bi tevî zarok û ciwanan em ê li ser mijara sûcên zarokan biaxivin.

Dil dixwest îro ew kesên ku di vê mijarê de biryarê digirin jî di nava me de bibûyana. Me ew vexwendin vir, lê belê nehatin. Di nav vê çalakiyê de pêşaneya me ya ku ji fotografên zarokên me yên ku ji ber koçberiya mecbûrî hatine Stenbol û Amedê, pêk tê di navbera 1-8 Nîsanê li hola kêlekê were nîşandan. Fotografên ku di pêşaneyê de tên nîşandan dê rê ji me re nîşan bide ji bo ku em zarokên xwe baştir fêm bikin û têgihana wan zarokan a li ser xwe bizanin. Rapora ku em ê di panel û hola pêşaneyê de berhev bikin, bi Tirkî, Kurdî û Îngîlîzî dê were çapkirin. Bêguman em ê di serî de bi meqamên biryarder re, bi raya giştî re vê raporê parve bikin. Em hêvîdar in li ser mijara sûcên zarokan xebateke baş bikin. Em spasiya xwe ji wan kesan re dikin ku keda wan di vê xebatê de heye. Pêşî ji perwerdekarên me, koma me ya projeyê, zarokên me, hemû endamên çapemeniyê yên ku di vê mijarê de bihîstyar in re û ji we mêvanên hêja re bi dilgermî spas dikin.

Ez hêvîdar im ku ev çalakî dê bibe çalakiyeke baş û berhemdar.

### Taşkın Adıguzel

### ÇAÇA (Şêwirmendê Projeyê)

Careke din hûn bi xêr hatine. Niha ez ê bi kurtî qala serpêhatiya heşt mehî bikim. Ji bo cihên xebatê Amed û Stenbol hatin destnîşankirin. Armanca projeyê pêkanîna haydariyek e li ser egerên ku zarokên me ber bi sûckirinê dehf didin, pêwîstiya danîna bergiriyan ji bo nehiştina sûc, ev bergirî ji hêla kê ve were girtin dê bibandor bin, bi guhdarîkirina gotinên zarokan, têgihana wan a li ser aliyên civakî, psîkolojîk û aborî yên vê mijarê. Mîna ku di danasînê de jî hate gotin ev yek bi armanca ne tenê bi têgihana kesên gihîştî yên wekî me, lê belê bi beşdariya aktîf a zarokan pêkanîna pêşniyara çareseriyê hate destpêkirin. Koma ku mijara xebata me bû ji zarokên 12-18 salî yên ku ber bi sûckirinê hatine dehfdan yan jî di wê xetereyê de ne ku ber bi sûc werin dehfdan, pêk dihat. 100 zarokan jê sûd girt. Di nav çalakiyên me de anket, atelyeya dramayê, atelyeya wêneyê, pêşane û panel hebûn. Ev çalakiyên ku min rêz kirin di heman demê de him li Amedê him li Stenbolê bi tevî zarokan hatin kirin. Di atelyeya fotografê de li ser xwendina fotografê, di fotografan de ronahî û kompozîsyonê di hefteyê de rojekê û bi giştî çar hefte dersên perwerdehiyê hatin dan. Di mijarên wekî sûc çi ye, sûç çawa tê vegotin, çawa tê derbirîn de bi tevî zarokan kupûrên rojnameyan hatin komkirin û bi vî şiklî dersên kolajê hatin dan. Naveroka dersên fotografê ji xwendin, anîmasyon û pêkanîna kareya fotografê, danasîna makîneya fotografê, rê û rêbazên fotograf kişandinê, çîrokên ku bi sûc re peywendîdar in, pêkanîn û anîmasyona nûçeyan, ger û fotografkêşiya qadan pêk dihat. Di atelyeya dramayê de naveroka xebatê ew bû ku zarokên li Amedê çawa li sûc û sûcdarbûnê dinihêrin. Rêbazên ku hatin bikaranîn jî ev in: rolên jixweberî, kareya fotografê, îmgeya mat, name nivîsandin, empatî û di nav rolên listikê de nivîsandin. Di lêkolîna qadê de jî li herdu bajaran heman formên hevdîtinê hatin bikaranîn. Li ser têgihîştina têgehên wekî edalet, wekhevî, sûc, tund û tûjî û yên din pirs hatin kirin.

Her wisa em hêviyên bêjedaran hîn bûn û bi vî awayî li ser çareseriyê delîl hatin berhevkirin. Li Stenbolê 58 û li Amedê 50 bi giştî 108 zarokan re anket hatin kirin. Dema ku me pirsî bê ka pirsgirêkên çawa mirov ber bi sûckirinê dehf didin zarokên herdu koman jî di

serî de neheqiyê, pirsgirêkên zexta civakî, hejarî û bêedaletiyê nîşan dan. Ji bo min yek ji pirsa herî girîng ew bû ku kî herî zêde tund û tûjiyê pêk tîne û tund û tûjî li ku dibe û bersivên vê pirsê jî pir balkêş bûn. %39'ê koma Amedê gotiye ku tund û tûjî li dibistanê bi destê mamosteyan pêk tê û %47 vê komê jî gotiye ku tund û tûjî li malan bi destê dê, bav an jî yek ji endamên mezin ên malbatê pêk tê. Ango tê dîtin ku zarok li du cihên ku ew herî zêde lê dimînin li rastî tund û tûjiyê tên. Bersivên vê pirsê yên koma Stenbolê hinek cihê bûn. %40'ê zarokên li Stenbolê ji bo vê pirsê bersiva dewlet û polîs da. Her wisa derket holê ku li Amedê qada sêyem ku zarok lê li rastî tund û tûjiyê tên kolan e. Zarokan got ku li kolanan li rastî tund û tûjiya him kesên gihîştî him jî zarokên hevsal tên. Piştî vê pirsê dema ku me ji wan pirs kir bê ka ji bo nehiştina vê tund û tûjiyê pêşniyara wan çi ye, zarokan wiha got: “Bila mirov li jîngeheke demokratîktir û wekhev bi hev re biaxivin, guh bidine hev, bila ragîhandin û empatî pêş keve, mirov ji hevûdu re baş bin û ji hev hez bikin.” Wexta ku me pirsî bê ka kîjan ji van têgehên edalet, wekhevî, sûc, lihevhatin, tund û tûjî ji bo wan girîngtir e, %39'ê zarokên li Amedê got wekhevî û %34'ê zarokên li Stenbolê got edalet. Wan got ku li jîngeheke ku li gor niha hinekî din wekhevtir û biedalet be, bi misogerî sûc û tund û tûjî dê ji holê rabin. Vê rewşê nîşan dide ku kesên ji ber heman egeran koçber bûne bingeha civakî, aborî û polîtîk a li herêmên xwe yên nû jî bixwe destnîşan dikin. Pêvajoyeke heşt mehî evqas kurt nayê vegotin, lê belê ez dibêjim qey piştî min zarok jî dê ji we re tiştna bêjin. Xebata me ya heşt mehan wiha bû, spas dikim.

**Gülnur Elçik**
**Moderator**

Merheba ji we re, hûn bi xêr hatine. Di mijareke wiha de axivîn bi rastî jî pir girîng e, lewre zêde li ser vê mijarê kar nehatiye kirin, qet nebe mijareke wisa ye ku karekî fireh li ser wê nehatiye kirin. Sê hevalên me yên ciwan li vir in. Ev sê hevalên me yên ku li rastî koçberiya mecbûrî hatine, dê ezmûnên xwe ji me re vebêjin.

**M.A. (14 salî):** Hûn bi xêr hatine. Ez ji Weqfa Çand û Hunerê Ya Başakê têm, navê min M. ye û ez 14 salî me. Ez ji 4-5 saliya xwe heta niha diçim Weqfa Çand û Hunerê Ya Başakê. Malbata min ji Bedlîsê ye. Li vir em ê li ser wan zarokên ku ber bi sûckirinê tên dehfdan, bipeyvin. Careke din hûn bi xêr hatine.

**E.B. (16 salî):** Ez jî dixwazim xêrhatiniya we bikim. Lewre dibe ku îro ji bo we rojeke jirêzê be, lê ji bo me rojeke hêja û watedar e. Ez gelek bextewar im ku hûn hemû li vir in. Ji ber ku hûn li vir in, ez spasiya we dikim. Ku ez qala xwe bikim, divê bêjim ku malbata min koç kiriye û hatiye vir. Lê koçberiya wan ne koçberiyeke mecbûrî bû. Ez zarokê şeşem ê malbateke Sêrtê me. 16 salî me, di pola dehan a dibistana amadeyî ya pîşesaziya bazirganî de dixwînim.

**K.T. (13 salî):** Hûn bi xêr hatine. Hûn çawa ne, baş in? Navê min K. ye. Ji Amedê têm. Me bi hev re biryar girt û me dest bi dersa kişandina fotografê û dramayê girt. Piştî ku me ev qedandin, me fotografên ku kişandibûn, pêşan dan. Me biryar da ku em wan bi we re par ve bikin. Em ê niha bi we re parve bikin.

**Gülnur Elçik**
**Moderator**

Gelo hûn dikarin ezmûnên xwe yên projeyê vebêjin? We çi kir?

**E.B. (16 salî):** Li me biborin, lewre em gelek biheyecan in. Min xwest ez vê ji we re bêjim. Li pêşangehê ji xeynî me hevalên me yên ku ji koma Amed û Stenbolê beşdar bûne, hene. Di vê projeyê de em tenê nebûn, beşdariya wan jî çêbû, beşdariya mamosteyên me jî

çêbû. Dema ku me ev proje pêk dianî me bi serê xwe çîrokên xeyalî nivîsandin û em bûn lehengên van çîrokan. Paşê me çîrokên xwe nivîsandin û ev çîrok kirin fotograf. Em çawa ji hêla çapemeniyê ve wek nûçe tên dîtin? Vêca me nûçeya vê yekê kir.

**M.A. (14 salî):** Ya rastî min nekarî ez tev li wan xebatan bim. Ez tenê tev li wê civîna li ser sûc bûm. Me di van civînan de qala xwe kiribû. Me qala sûc çi ye, zarok çi ye, egerên ku zarokan ber bi sûckirinê dehf didin çi ne, kiribû. Me hemû qala wan sûcan kir ku me bixwe kiribûn. Eger hûn jî bixwazin, ez dixwazim qala yek ji wan sûcan ji we re bikim. Ez tevî hevalan çûbûm dikanê. Ji ber ku perê piraniya hevalên min hebûn, wan ji xwe re tiştna kirîn. Paşê min ji xwe re tiştek girt. Hevalê min ji min re got, ma perê te heye. Min jî got, na. Wê demê ev pir li zora min çûbû. Min çîkolota hilgirtibû. Dema ez difikirîm ka ez wê bigirim yan na, min xwe avêtibû derve. Paşê min ev ji hevalan re got û min xwest ez bi we re parve bikim.

**E.B. (16 salî):** Beriya ku werim ser meseleya sûc, dixwazim pêşî qala pirsgirêka zimên bikim. Rastiyeke wiha heye ku malbata min, ya rastî diya min ji ber ku li Sêrtê hatiye dinê û li wir mezin bûye, Kurdî dizane. Lê wê zarokên xwe li Stenbolê anî dinê û em hemû jî Tirkî dizanin û em ji zimanê hev fêm nakin. Ez Kurdî fêm dikim, lê nikarim bipeyvim û ji ber vê yekê jî him li nav malê, him li dibistanê, him jî li kolanê li rastî gelek pirsgirêkan hatim. Diya min Kurdî dizane, Tirkî fêm dike, lê nikare bipeyve. Li malê zarokên wê bi Tirkî, bavê min jî carna bi Tirkî carna bi Kurdî dipeyve, ew bixwe jî bi Kurdî dipeyve. Em ji hev fêm dikin û ev yek ji bo me pir hêja ye. Em ji hev fêm dikin, ev têra me dike. Dibe ku em bi heman zimanî nepeyvin, lê bi zimanên cihê jî bipeyvin, em ji hev fêm dikin. Ji ber zimên li gelek deran li rastî pirsgirêkan hatim. Ez dema ku qala xwe dikim, gelek zehmetî dikşînim. Niha awayê axaftina min wisa ye. Li dibistanê mamoste pêşî dipirsin, navê te çi ye, tu ji ku yî, diya te çi karî dike, bavê te çi karî dike hwd. Dema ku min bajarê xwe digot her kes bi endîşe, hinek jî bi hêrs û kerb li min dinihêrî. Bi min wisa dihat ku qey ez sûcdar im. Ji ber ku we ji min fêm kir, ez spasiya we dikim. Ji hêla psîkolojiyê ve him jî ji hêla xweîfadekirinê ve ez bi gelek pirsgirêkan re rû bi rû mam. Ez dixwazim hinek qala meseleya sûc bikim. Mîna ku min got, mirov wisa li min dinihêrin, qay ez sûcdar im. Bi ya min tu kes ne sûcdar e. Bi taybetî jî zarokên ku ji 18 salî biçûktir in, qet ne sûcdar in. Eger li derekê bêedaletî, newekhevîtî hebe, li wir têgeha sûc dibe. Ez dixwazim vê pirsê bikim: Bi dîtina we, eger li derekê edalet û wekhevî hebe, ma li wir sûc dibe?

**Mêvan:** Belê, dibe. Ez gelek serbilind bûm. We bi awayekî xweş ramanên xwe gotin. Em gelek spasiya we dikin. Ez bi we gelek şanaz bûm.

**E.B (16 salî):** Ez pêşî, ji ber ku we ev derfet da me û ji me fêm kir û rêz li ramanên me girt, dixwazim spasiya we bikim. Ez dîsa dixwazim qala têgeha sûc bikim. Yekî wek sûcdar binavkirin tiştekî hêsan e. Lê bi ya min tiştekî wiha heye ku tu zarok ne sûcdar e. Eger hûn ji min bipirsin, eger em bibînin ew zarok sûc dike, ma ew sûcdar nabe; ez ê bibêjim ku belku jî ji hêla kesekî din ve tê teşwîqkirin û ew bixwe ji vê haydar nîn e. Wek mînak, di çîrokeke ku me nivîsîbûn de hevalê min ji bo malbata xwe nan didize û wî diavêjin hepsê. Belê, li wir sûc heye, lê ew zarok çima nan didize? Ew bixwe jî baş nizane bê ka çi dike, pirsgirêka wî ya psîkolojîk jî heye. Ma şûna ku wê biavêjin hepsê û wî darizînin divê neşînin navendeke rehabîlîtasyonê? Di peymana mafên zakoran de jî şûna ku mafên alîgirên zarokan werin pejirandin, zarok di gelek mahkemeyan de tên darizandin. Gelek mînak ji bo vê yekê hene û em vê di televîzyon û çapemenî û nûçe û rojname û gelek derên din de dibînin. Belku jî her kes ji ber çapemeniyê bi pêşderazî li têgeha sûc dinihêre. Lê ez dibêjim qey ez hinek zêde axivîm. Ez dixwazim bi destûra we mafê gotinê bidim hevalên xwe.

**M.A. (14 salî):** Dewsa ku zarokek wek sûcdar were binavkirin, divê egerên ku wî zarokî ber bi sûckirinê dehf didin, werin lêkolandin. Wek mînak, li qerekol û cihên wisa li zarokan

egera sûcê wan dipirsin. Lê belê eger li cihên ku zarok lê rehet in, mesela li parkê vê pirsê bikin, zarok jî dikarin bi rehetî xwe îfade bikin. Lewre ji ber ku li cihekî wisa ye ku jê hez dike, zarok xwe di bin zextan de nebîne. Bi ya min civaka Tirkiyê hîn negihîştiye wê astê ku guh bide zarokan.

**K.T. (13 salî):** Ez dîxwazim pêşî vê bîbêjîm: Em hatin vir, lewre me xwest tîştên ku em hîn bûne bî we re parve bikin. Me ewil dest bi atelyeya dramayê kir. Dema ku me dest bi atelyeya dramayê kir em hemû dilşa bûn. Lewre em ê biçûna wir û me yê gelek kesên cihê bidîtana. Em ê çawa bi wan re têkîlî daynin, em ê hîn bibûyana. Vê yek em gelek kêfxweş kirin. Piştî atelyeya dramayê me dest bi atelyeya fotografê kir. Her wisa dema ku em ê biçûna atelyeya fotografê, em gelek biheyecan bûn. Heta hin ji me şaş mabûn, lewre em cara ewil diçûn atelyeya fotografê. Baş bû ku em çûne wir. Em li wir hînî kişandina fotografan hîn bûn. Me gelek kes nas kirin. Fotografên ku me kişandin him li Amedê him li Stenbolê me bi kesên din re parve kirin. Em bi dîtina Stenbolê biheyecan bûn. Me wisa pêşniyar kir ji bo ku tund û tûjiya ku di nav jiyana me û derûdora me de ye kêm bibe, tiştên ku em hîn bûbûn bi kesên din re parve bikin.

**M.A. (14 salî):** Hevala/ê me E gava berê behsa pirsgirêka zimên kir. Di rastiyê de pirsgirêka zimên di nav civakê de xwedî cihekî girîng e. Wek mînak, dema ku ez li dibistanê bûm, ji Mêrdînê hevalek hat pola me. Ji ber ku ez hinek Kurdî dizanim, ez bi wê/wî hevalî/ê re bi Kurdî dipeyivim, lê dema ku em di nav polê de, di nav civakê de bi Kurdî dipeyvin ev yek mirovan ji me dûr dixe. Em wek sûcdar tên dîtin. Qey ji me re dibêjin, hûn çima di nav civakê de wiha bi hevdu re dipeyvin. Di rastiyê de zimanê me Kurdî ye. Ji ber vê em dixwazin bi zimanê xwe bipeyvin. Her wisa dema ku ez derfeta axaftinê bibînim her gav dipeyvim. Lewre dema ku ez bi malbata xwe re dipeyvim hevokekê fêm dikim, hevokekê fêm nakim. Ez hewl didim ku hîn bim. İnşale ez ê hemûyan hîn bim.

**E.B. (16 salî):** Madem mijar li ser zimên e, ez dixwazim vê bêjim. Tiştekî baş e ku zarokek du zimanan bizane. Lê dema ku yek zimanê Frensî, Almanî an jî Îtalyanî bizane ew tişt pir normal tê dîtin. Lê belku di civaka me de zanîna me ya Kurdî an jî zanîna me ya Kurdî û Tirkî ji hêla civakê ve bi çavekî din tê dîtin. Ne bi çavekî baş, lê bi çavekî xirab li vê meseleyê dinihêrin. Dema ku ez biçûk bûm, yek ji min bipirsiya bê ka ez dixwazim du zimanan bizanim an na, ji ber tiştên ku hatine serê min, min ê bigota ez naxwazim. Rastiyeke wiha jî heye: Ji ber ku ez bi du zimanan dizanim ez xemgîn im. Lewre her çiqas bi temamî bi Kurdî nizanibim jî tiştên ku tên gotin fêm dikim, lê nikarim bipeyvim. Lê belê ez, xwe wekî yekî ku xwedî du kesayetî be, dibînim. Ez wisa dibînim ku zerer dane kesayetiya min. Zimanek mirovek e û du ziman jî du mirov in. Lê belê di vê civaka ku ez lê dijîm de bi çavekî din li vê meseleyê dinihêrin. Ji ber vê jî ez naxwazim du zimanan bizanim.

**M.A. (14 salî):** Di rastiyê de tiştekî baş e ku mirov du zimanan bizane. Lê belê di nav civakê de, wek mînak eger tu bi Îngîlîzî, Fransî yan jî Îtalyanî bipeyvî ev yek xelet nayê fêmkirin. Lê belê gava ku tu bi Kurdî bipeyvî xelk bi çavekî xirab li te dinihêrin. Bi çavekî wisa li te dinihêrin ku qey dibêjin tu Kurd î, tu mirovekî xirab î.

**K.T. (13 salî):** Ku mirov du zimanan bizane, tiştekî baş e. Lê belê wexta ku du kes bi Tirkî dipeyvin û li kêleka wan zilamekî Kurd dixwaze axaftinên wan fêm bike, lê jê fêm nake. Eger em bixwazin ji wî re jî bibêjin, em çawa bikin? Eger tu wî zimanî bizanî û jê re bêjî baş dibe. Ji ber vê jî tiştekî baş e ku mirov du zimanan bizane.

**Gülnur Elçik**
**Moderator**

Hînnebûna zimên dibe sedema bidestnexistina derfetên jiyanê. Herdu jî ji ber koçberiyê derdikevin, lê belê ji ber ku bêtir mêr qadên civakî, giştî bi kar tînin ji jinê re li malê mayîn dimîne. Ji ber vê jî ew wê derfetê bi dest naxe ku zimanên cihê hîn bibe, qet nebe nikare zimanê ku di jiyanê de serdest e hîn bibe. Ev yek jî wê ji jiyanê dûr dixe û dibe sedem ku di navbera jin, ango dayik û zarokan de cihêtiya zimên pêk were. Min xwest ez vê bibêjim.

**Yüce Yöney**
**Edîtorê Rojnameya Bianetê**

Gava ku me guh dida zarokan ez wisa fikirîm ku xwezî tim zarok biaxiviyana. Lewre ez dibêjim qey ew ji me hemûyan baştir pirsgirêk vegotin. Piştî axaftina wan a dilsoz ji ber ku hûn ê guh bidin axaftineke micid a kesên gihîştî ku mirovan nerehet dike, ez lêborîna xwe ji we dixwazim. Lê çi mixabin em naçar in ku bi çavê kesên gihîştî li vê meseleyê binihêrin û çapemenî çawa nêzikî zarokan dibe, divê bibêjin.

Pêşî mirov dikare vê bibêje: Em her tim bi qasî ku di vê xebatê de me dengê zarokan bihîst, di nav civakê de nabihîsin yan jî guh nadin gotinên wan. Medya jî ji me cihê nîn e. Temsîlkirina zarokan di çapemeniyê de gelek bipirsgirêk e. Em dikarin bêjin ku pirsgirêka ewil ew e ku li gor rêjeya zarokan a li nav civakê rêjeya temsîlkirina zarokan di çapemeniyê de gelek kêm e. Ango xala yekan temsîliyeta kêm e. Di rastiyê de ev yek ji ber wê ye ku çapemenî nûfusa mezin a zarokan û pirsgirêkan zarokan wisa dihesibîne ku qey tune ye. Bi awayekî giştî zarok an jî zarokên ku ber bi sûckirina hatine dehfdan dema ku di çapemeniyê de cih digirin, bi mînakên neyînî cih digirin.

Belê rûpelên zarokan ên rojnameyan hene, edîtorên rûpelên zarokan hene, nivîskarên ku li vir quncikan dinivîsin, hene. Lê belê ez wisa difikirim ku ew di çarçoveya vê axaftinê de cih nagirin. Belku jî divê ew were gotin ku bi van ve sînor kirina temsîliyeta zarokan ya rastî pirsgirêk bi xwe ye. Lewre ez wisa difikirim ku ev rûpel di nav têkîliyên sektorî û têkîliyên bazarê de hatine manuplekirin. Ji ber vê jî eger em vê daynin alîkî, em dikarin bibêjin ku di çapemeniyê de zarok mîna ku tune bin, tên hesibandin an jî zarok bêtir bi binpêkirina mafan û mînakên neyînî tên rojevê. Di destpêka binpêkirina van mafan de jî eşkerekirina navan tê.

Fotograf yek ji wan mînakan e ku hema tê bîra mirov. Em tim fotografên zarokên ku ber bi sûc hatine dehfdan, dibînin. Ma em di malperan de fotografên temsîlî nabînin? Belê, fotografên temsîlî hene, lê bêtir em fotografê bixwe dibînin, wexta ku fotograf tê şêlûkirin jî pir kêm tê şêlûkirin û zarok tê naskirin, yan jî xeteke reş li ser çavên zarokan tên danîn. Em hemû jî baş dizanin ku ew xeta reş ne bes e, armanc tenê formalîteya zagona nasnekirina zarok pêk tîne, lê peywira xwe ya exlaqî bi cih naîne. Nivîsandina navên zarokên mexdûr û ber bi sûckirinê hatine dehfdan, eşkerekirina nasnameya wan binpêkirineke mezin a mafan e.

Yan navê zarokên ku ber bi sûckirinê hatine dehfdan, tên nivîsîn yan jî herfên pêşîn ên nav û paşnavê wan tên nivîsîn. Baş e bi herfên pêşîn ên nav û paşnavên wan temsîlkirina wan gelo bergîriyeke bes e an jî helwesteke rast e? Na, ne bes e. Li vir divê ewil nav werin guherandin û herfên pêşîn ên van navên guherandî werin danîn. Wek mînak herfên pêşîn ên Yüce Yöney daynin alîkî û li dewsa wan herfên pêşîn ên Pınar Öğünçê hildin û wek P.O. temsîl bikin. Yên ku vê dikin jî hene, divê em heqê wan nexwin. Wek mînak dema ku bûyerên li girtîgeha Pozantiyê hate rojevê, di hevpeyvîneke ku bi zarokên mexdûr ên TMK (Zagona Têkoşîna Dij Li Terorê) hatibû kirin de navê zarok wek T.G. bi kurtî hatibû nivîsandin. Tu eleqeya navê zarok bi T. Û G. Tunebû. Ev, helwesteke pir rast bû, divê em ewil bêjin ku tiştê ku divê were kirin ev e. Lê di %90'ê nûçeyên ku ji ber vê nûçeyê hatin kirin de navê rasteqîn ên zarok hate bikaranîn.

Bêguman hînbûna navê zarok pir hêsan e. Dema ku hûn nûçeyê amade dikin ji saziya peywendîdar re telefon dikin, ji wê zanyariyê digirin. Dema ku hûn zanyariyê digirin, ji we re navê zarok jî dibêjin. Li vir pirsgirêk tune ye, ji bo şopandina nûçeyê jixwe ev lazim e. Divê hûn navê zarok bizanin, lê belê malper, televîzyon an jî rojnameya ku vê nûçeyê belav dike, divê wî navê veşêre û herfên pêşîn ên wî navî jî biguherîne.

Çi mixabin gelek mînakên neyînî hene. Ev jî yek ji wan binpêkirinên rêbaza veşartina navên zarokan e. Herfên pêşîn ên nav û paşnavê zarok bi awayekî guherandî yan jî ne guherandî tê dayîn, navê zarok nayê dayîn, lê derbarê zarok de terîfêk tê kirin. Bajarê ku lê dijî, girtîgeha ku lê dimîne, dibistana ku lê dixwîne, taxa ku ew berê lê maye, hevalên wê/î … Ev zanyariyên bikitekit nepêwîst in, lê dîsa jî tên bikaranîn û di wan nûçeyan de hûn bi hêsanî dizanin ka ew zarok kî ye. Nas û lêzimên wê/î zarokê/î hene, taxa wê/î zarokê/î heye, dibistana wê/î zarokê/î heye. Ew li van deran bi van zanyariyan bi hêsanî tê naskirin. Ji ber vê jî ev yek binpêkirina mafekî ye. Ew tê deşîfrekirin. Divê ev yek neyê kirin.

Mînakeke pir balkêş heye, madem mijar ev e, ez vê mînakê bibêjim. Rojnameyek navê zarok veşartiye. Lê bi bavê zarok re jî axivîne. Di heman nivîsê de li derekê navê bavê zarok, li derekê jî paşnavê bavê zarok derbas dibû. Hûn nav û paşnavê bavê zarok êdî dizanin. Ji ber vê jî êdî dikarin navê zarok jî bizanin. Jixwe cihê ku lê dijî tê zanîn. Êdî te navê zarok daye yan jî nedaye, qet ferq nake. Ev ji hêla exlaqî ve jî nayê qebûlkirin. Ev yek dij li peymanên navnetewî yên li ser vê mijarê ye. Ev yek di nav têgihîştina exlaqî ku heta niha hatiye avakirin de jî tune ye. Xaleke din heye ku eger em qal bikin dibe ku sûdewar be, lewre yek ji xalên here bipirsgirêk ên nêzikbûna çapemeniyê ye.

Me li ser girtîgeha Pozantiyê mînakek da. Em dîsa li ser wê mijarê berdewam bikin. Ez niha dikarim çar herfên pêşîn ên navên wan zarokan bihêjmêrim, lewre min nûçeyên vê bûyerê kiribûn. Hûn jî dikarin du herfên pêşîn ên wan navan bihêjmêrin. Eger nehat bîra we, hûn dikarin ji înternetê hîn bin. Lê eger hûn bixwazin herfên pêşîn ên nav û paşnavê çar peywirdarên ku ji ber binpêkirinên mafan yên li girtîgeha Pozantiyê cihê xebata wan hatiye guherandin an jî ji kar hatine dûrxistin, hîn bin, heta eger hûn bixwazin tenê herfên pêşîn ên nav û paşnavê peywirdarekî hîn bibin, hûn wisa bi hêsanî nikarin hîn bibin. Ka hinek bifikirin, ma hûn wan dizanin? Nizanin ne wisa? Ez jî nizanim. Dema ku ez dixwazim navên wan hîn bim, gelek astengî derdikevin pêşiya min. Cihê peywirên van kesan hate guherandin. Heta ku pirsgirêkeke nû dernekeve hûn gelek zehmetî dikşînin ku navê cihê peywirên wan ên nû hîn bibin. Raya giştî cihê nû yê peywirê wan nizane. Me gava dinê got ku derbarê zarok de terîfek tê kirin. Ne tenê navê wan, her wisa taxa wan û cihê wan ê kar jî dikarin terîf bikin. Lê belê rêvebirekî girtîgehê heye ku derheqê wî de lêpirsînek hatiye kirin. Ev kengê derdikeve holê? Dema ku ew zarok ji bo girtîgeha Sincanê tên veguhastin, ev yek eşkere dibe. Hûn çawa vê nûçeyê hîn dibin? Ev yek bêtir bi hewl û xabata Komeleya Mafên Mirovan, hin parlamenter û aktîvîst û rêxistinên civaka sîvîl eşkere dibe û ji ber nerizayî û protestoyan cihê peywira wî kesî hate guherandin. Wek mînak, hûn nizanin ew rêvebir çû kî derê. Ez dixwazim vê bêjim ku yek ji wan rêbazên bingehîn ên exlaqî ku divê çapemeniyê pêk bîne ew e ku divê çapemenî ji ba zarok ve li bûyeran binihêre. Lê belê him ji ba zarokan ve li bûyeran nanihêrin him jî wisa nêzikî meseleyê dibin ku ev yek ji bo kesên ku mafên zarokan bin pê dikin, dibe xizmet. Çi mixabin piranî dewlet jî wisa nêzikî meseleyê dibe.

Lazim e mirov qala binpêkirineke din a mafan bike: Binpêkirina mafên ku ji bo parastinê hatine danîn. Çapemenî çi dike? Di nûçeyên li ser zarokên ku ber bi sûckirinê hatine dehfdan da çapemenî bêtir bala xwe dide ser bûyerê bixwe. Em bêjim ku tawan dizitî ye. Bêguman bûyer ji ber xwe dibe nûçe, lê belê dema ku nûçe tê amadekirin divê ev şert û merc çawa pêk hatin, çima ev zarok naçak ma ku wî nanî bigire, çima naçar ma ku ev zarok dizitî bike. Eger bûyer kuştin be divê pirsa, ev zarok çima naçar ma ku bikuje, were pirsîn. Ango çapemenî gelemperî li ser bûyeran hûr dibe, egeran û sîstemê piştguh dike û bi vî awayî nûçeyan amade dike. Lewre aliyekî sansasyonî ya bûyeran heye. Piraniya nûçeyên rûpela sêyem ên rojnameyan ji van pêk tê. Çi mixabin êdî têgeheke binavê nûçeyên rûpela sêyem heye. Lê belê nûçegîhaniyeke wisa nayê kirin ku qala sîstema ku rewşa wê/î zarokê/î baş nake, heyîna pirsgirêkên sîstema ewlekariya civakî, egerên ku zarokê/î ber bi sûckirinê dehf dide nake. Ez bêtir qala saziyên sereke yên çapemeniyê dikim. Li aliyê din jî çapemenîyeke alternatîf jî heye û bi qasî ku ji dest tê rêbazên li rojê pêk tîne. Di saziyên sereke yên çapemeniyê de egerên tund

û tûjî û sûc (divê mirov têgeha sûc bi baldarî bi kar bîne) dernaxin pêş. Di dawiyê çi derdikeve pêşiya me? Zarokên bextreş û dewleta ku şefqeta xwe nîşan dide. Ez hêvî dikim ku ev mînandineke şaş nebe. Lê belê dema ku em van nûçeyan dixwînin ev tê pêşberê me. Em tu car wê yekê hîn nabin ku ka çima ew zarok li wir e û ew zarok ji ber kîjan pirsgirêkê wiha kiriye. Lewre li wir dewlet tê parastin. Çapemenî wisa nîşan dide ku qey dewlet hemû berpirsiyariyên xwe bi cin anîne. Lê belê li holê dewleteke wisa heye ku rê daye ku tund û tûjî li zarokan were kiri, zarok ji mafên xwe yên gerdûnî bê par bimînin; mekanîzmayên parastina civakî pêk neanine û berpirsiyariyên xwe bi cih neanîne. Divê em vê yekê bibêjin. Bi hevokeke biçûk tespîteke din jî bikin. Tevahiya zarokan di van nûçeyan de wek tehdît tên dîtin. Di bin nivîsarê de tim ew tê gotin. Pirsek heye ku yek ji hevalên ku gava din li ser mafên zarokan axivîn, anî bîra me: Him wek civak him jî wek amadekarên nûçeyên çapemeniyê divê em ji ku ve binihêrin? Bêguman bêalîbûn tiştekî girîng e, lê belê ya herî girîng parastina berjewendiyên bilind ên zarok e. Ev yek rêbaza bêalîbûnê ji holê ranake, lê belê derdikeve jor wê. Nêrîna me divê wiha be: Mîna ku di romana Mirovên Hejar de hatiye vegotin, gelo Jean Valjean nan girtiye an diziye?

Awayekî din ê nûçeyên ku di çapemeniyê de cih digirin û mafên zarokan bin pê dikin ew e ku beriya ku sûcdariya zarokan were îspatkirin, zarok bi peyvên wekî “diz”, “bikuj”, “xwînxwar” û hwd. tên sûcdarkirin. Ev jî yek ji wan binpêkirinên gelemperî yên mafan e ku di çapemeniyê de tê dîtin. Dixwazim mînakeke kevn ku hate bîra min ji we re bêjim. Mirov dikare gelek mînakên rojane bibêje. Lê ji ber ku gelek tê dîtin ev mînak dê baştir be. Di despêka salên 2000’an de Uzeyîr Garîh hatibû kuştin. Du an sê sa’et şûnde zarokek girtin, zarokekî 13 salî girtin. Eger ez şaş nebim dû-sê rojan di bin çavan de ma. Yek ji rojnameyên populer û tîrajbilind ên wê demê û ya niha û gelek rojnameyên din jî ji ber vê rojnameyê ev zarok wek sûcdar nîşan dan. Di van nûçeyan de bi awayekî eşkere navê zarok jî hate nivîsîn. Her wisa ew sûcên ku li zarok hatibûn barkirin bi agadariya Emniyet û Wezareta Karê Hundir hatibûn girtin. Eger ez şaş nebim sê roj şûnde zarok hate berdan. Lewre hate dîtin ku tu eleqeya wî bi bûyerê tune ye. Hate dîtin ku ev zarokekî sêzde salî bû ku bi boyaxkirina pêlawan him debara xwe, him debara mala xwe dikir him jî dixwend. Lê di vê navberê de bav û kekê vî zarokî ji kar hatin avêtin. Zarok û malbata wî ji hêla xwediyê xanî ve ji xanî hatin derxistin. Gelo kî hesaba vê bide?

Çapemenî dema ku nûçeyan amade dike divê ne tenê berjewendiya wê gavê ya zarok, lê belê berjewendiya demdirêj a zarok jî biparêze. Ev yek ne tenê li Tirkiyê, lê belê li dinyayê jî wisa ye. Pirtûkeke Bianetê heye. Bi ya min di vê pirtûkê rêbazên wisa hene ku divê kesên ku dibêjin nûçegîhaniya mafparêz dikin, an jî kesên ku her çiqas nûçegîhaniya mafparêz nekin jî, rojnamegeriyê dikin, her wisa divê her mirov teqez raçav bike. Ez ê ji vê pirtûkê mînakeke biçûk bidim. Ev mînak li ser vegotina çapemeniyê ye û di asta dinyayê de jî tê dîtin. Mînak li ser zarokên kolanê ye. Zarokên kolanê her çiqas ne ji bo kesên ku li vir in, lê belê bi awayekî giştî ji hêla civakê ve biçûk tên dîtin û wisa tên dîtin ku qey ew pirsgirêkan derdixin û xetere ne. Vêca ji pirtûka Bîanetê mînakek li ser wateyên terîma zarokên kolanê wiha ye: li Brezîlyayê zarokên kolanê wek yên marjînal tên binavkirin, ango ew yek bi awayekî eşkere tê gotin ku ew ji civakê hatine dûrxistin. Li Kolombiyayê ji bo wan keziyên nivînê, li Peruyê çivîkên fêkiyan, li Vîetnamê keziyên tozê, li Kamerunê mêş, li Ruandayê jî wek zarokên xirab tên binavkirin. Bi taybetî di piraniyan de nîgaşa kezîkan heye ku ev yek ji bo min balkêş e: Kesên ku divê bi wan re şer were kirin, keziyên ku dê zererê bigihîne civakê. Turkiyê jî ji vê yekê bêpar nîn e. Her çiqas ji bo zarokên kolanê peyva kezî nayê bikaranîn, lê di rastiyê de wisa tê dîtin ku li hember van zarokan têkoşînek were dayîn. Gelek caran jî wisa tê dîtin ku ev zarok divê werin xilaskirin. Lê qesta me ji xilaskirinê pir girîng e. Divê mirov xebatên ku li ser van zarokan tê kirin ji vî aliyê ve eşkere bike.

Paşê eger wext bimîne ez dixwazim behsa du sê sernavên din jî bikim. Eşkerekirina zimanê çapemeniyê û ji ber vê jî di çapemeniyê de xuyabûna zarokan di çi rewşê de ye,

mijareke girîng e. Zarokên ku kevir diavêjin yek ji wan gotinên alîgir e ku çapemenî bi kar tîne. Tiştekî pir girîng e ku zarok çima kevir diavêjin. Li ser vê xebateke gelek baş heye ku ji zanîngeha Hacettepeyê Sedat Yarcioğlu kiriye. Di hevdîtinên li ser egerên kevir avêtina zarokan gelek gotinên cihê hene. Çi mixabin ji nebûna wext ez ê van nexwînim. Ev gotin bêtir dihêle ku em bizanin ku ev zarok mexdûrên TMK'yê (Zagona Têkoşîna Dij Li Terorê) ne. Dema ku em dixwînin, em fêm dikin bê ka çima ji van zarokan re zarokên ku kevir diavêjin, tê gotin. Di dawiyê de divê bêjim ku ew zarok divê ne li girtîgehê bin. Divê ew li saziyên wisa yên civakî de bin ku bikarin perwerde bibin, carna malbatên xwe bibînin. Ez ji her kesî re spas dikim.

**Doç. Dr. Serra Muderrisoğlu**
**Zanîngeha Boğaziçi**

Merheba ji we re. Ez xebata Weqfa Çand û Hunerê Ya Başakê û Komeleya Zarok Di Bin Heman Banê De (ÇAÇA) ya ku hewl dide bi çavê zarokan tund û tûjî, sûc, wekhevî, edalet û peywendiyên navbera wan fêm bike, xebata wan a anket û atelyeya fotografê û berhemên vê atelyeyê pir girîng dibînim. Em dibînin ku encam û peywendiyên ku di vê xebatê de derketine li gor kesên gihîştî tune ne û tenê di hin çalakiyan de xwe didin der û mîna ku birêz Yüce jî got kesên gihîştî van encaman bi çalakiyên sûc bi nav dikin. Ji ber vê jî ez wisa difikirim ku divê vegotinên zarokan di nav vê çarçoveyê de bi cih be. Sernavê projeyê jî bala min dikşîne. Bi ya min pirsên wekî “Gelo ez sûcdar im? Gelo tu sûcdar î? Gelo ew sûcdar in?” pir girîng in. Di dawiyê de ez ê balê bikşînim ser vê pirsê ku ramana min e û bi vî şiklî gotara xwe biqedînim. Lê ez wek psîkologek dixwazim ji hêla psîkolojiyê ve nêzikî mijarê bim. Ez ê hinek li ser bermayiyên zarokatî û pêvajoyên ku di zarokatiyê de qewimîne û çalakiyên ku (eger di dawiyê de çalakî hebin) bi bandorên wan re peywendîdar in, bipeyvim. Bêguman mîna ku gava berê me got kî bike bila bike tiştekî pir giran e ku peyvên zarok û sûc bi hev re werin bikaranîn. Di rastiyê de tu peyveke din nizanim ku subjetiya zarok an jî kes ji raborî û sibêroja wî biqetine û wî bike berkarek (heyokek). Dema ku ew peyv tê bikaranîn di kêliyekê de her tiştî razber û biyanî dike û bikaranîna wê peyvê jî nîşaneya meyla tund û tûjiyê ye. Lewre her tiştî diqetîne. Çi mixabin mîna ku gelek caran çapemenî dike, bala mirovan dikşîne ser çalakiyekê, ango ji mirov dûr dixe û bala mirovan li ser çalakiyan kom dike. Him mêjiyê kesên li der û dorê dide sekinandin, deşehitîne û tenê li ser wê tevgerê disekine. Ango tenê ji bo bersiva vê pirseke wekî “kê ew kêr di kê re kir?” bi meseleyê re eleqedar dibe. Lê di rastiyê de pêşketina û peywendiya bûyerê xalên pir girîng in. Ji bo ku baş were fêmkirin bê ka sûc çi ye, ji bo vejandina mêjiyên şehitî, ji bo fêmkirina ka çi li ku dest pê dike, divê fîlmê hêdî hêdî ber bi paş bizivirînin. Incex dema ku em fîlmê ber bi paş bizivirînin em dikarin fêm bikin bê ka tiştên ku pêk hatine çima pêk hatine û bi vî şiklî em dikarin ji zarokatiyê ve di navbera eger û encaman de peywendî daynin. Divê em li ser wê meseleyê jî rawestin bê ka çima em kesên gihîştî yên ku di rojname û bi giştî çapemeniyê de nûçeyan amade dikin an jî kesên ku di cihên biryarder de ne çima vê sedemîtiyê xirab dikin. Lewre mîna ku min berê jî got ji temenên biçûtiyê de her kes dikare wê peywendiya eger û encamê dayne. Her kes hizir dike bê ka li pey wê çalakiyê dê çi hebe. Em xwedî wê taybetmendiya zênî ne, lê em bi kar naînin. Divê em li egerên bikarneanîna vê taybetmendiyê binihêrin. Bi zanebûnî xirabkirina peywendiya eger û encamê û cihêkirina vê peywendiyê ji raborî, têgihan û kêlî û pêvajoyên ku ew mirov tê re derbas bûne, bi ya min pirsgirêka herî mezin e ku divê em kesên gihîştî çareser bikin. Mîna ku birêz Yüce jî got di vê mijarê de rola çapemenî û rola kesên gihîştî pir girîng e. Lewre eger em vê meseleyê çareser nekin em ê binpêrkirina herî mezin a mafan pêk bînin û di vê çarçoveyê de di rastiyê de sûcdûr em in. Eger em wisa li peywendiya eger û encamê nenihêrin, eger em tenê li çalakiyekê binihêrin em nikarin bizanin bê ka sûc çi ye û sûcdar kî ye. Ji ber vê jî di rastiyê de em nikarin sûcdar jî bikin. Tenê em sûcekî diavêjin ser yekî û gelek caran jî mekanîzmeyeke parastinê

nahêlin ji wî kesî re. Ev hemû tiştên wisa ne ku em dizanin û tim li ser wan difikirin. Ez di vê xalê de tiştekî nû nabêjim. Dema wiha tê pirskirin ev bersiv tê dayîn: “Baş e, em tim ber bi paş bizivirînin, li wir jî dîmeneke din heye û li wir jî tevgerek heye ku ji ber tund û tûjiya kesekî din ew pêk hatiye. Eger em wisa herin em nikarin sûcdarek bibînin.” Bi vî awayî reflekseke nelirê derdikeve holê. Qey divê tim yek bibe hedef, divê tim bûyer li derekê dest pê bike û ne li ser mercan divê qey li ser mirovan were vegotin. Ez ne hiqûqzan im, dibe ku di sîstema hiqûqê de têgînîbûneke wiha hebe. Lê ez ê ji hêla psîkolojiyê ve li meseleyê binihêrim. Bi ya min fikrîna bi vî şiklî, girêdana egeran bi kes û bûyeran re helwesteke bipirsgirêk e. Serê mirovan tevlihev dibe, ne tenê kesên ku ji derve ve li meseleyê dinihêrin, lê belê serê wan kesên ku di nav çalakiyan de ne jî tevlihev dibe. Ji ber vê jî pirsa “Gelo ez sûcdar im?” çi zarok çi kesên gihîştî, tê bîra mirov. Bi ya min ev, pirseke wisa hêsan nîn e. Doh dema ku ez li ser vê axaftina xwe fikirîm, fîlmeke ku min berê temaşa kiribû, hate bîra min. Min ew fîlm careke din temaşe kir. Navê fîlmê Bandora Perperikan e. We temaşe kir? Fîlmeke pir bibandor e. Bêguman tevnsaziya wê pir xurt e û hêmanên fantastîk jî di wê fîlmê de hene. Mijara fîlmê bi mijara me re peywendîdar e: Jiyan û serpêhatiyên çar hevalên wisa ne ku dema ew heft an heşt salî bûne bi awayekî micid hatine îstîsmarkirin. Helwestên wan ên li hember wê îstîsmarê ji hev cihê ne. Di wê çîrokê de îstîsmareke cinsî heye. Ew, li nîşaneyên tund û tûjiyê yên ku ji ber wê îstîsmarê ketine nav jiyana wan, digerin. Li malê dînamît dibînin û dibêjin ku gelo em vê dînamîtê li dereke din biteqînin dê çi be. Dînamîtê dixin nav sindoqeke posteyê û diteqînin. Bêyî ku texmîn bikin, di wê navberê de jinek bi tevî bebikê xwe di wir re derbas dibe û ji ber teqînê dimirin. Belê ev bûyer jî parçeyekî meyla tund û tûjiyê ye. Ew zarokê ku dînamît datîne wê derê, di dîmena peşîn de bê hiş dimîne. Piştre di kêliyên tund û tûjiyê de mêjiyê yek ji wan zarokên ku li qayî wê îstîsmarê hatine disekine, tîştek nayê bîra wî û bi vî şiklî kêlî ji hev diqetin. Zarokekî din jî ji hêla derûniyê ve li qay pirsgirêkan tê û meyle kekê wî jî li ser tund û tûjiyê zêdetir dibe. Piştî ku wêne wisa tê danîn fîlm li ser pêvajoya piştî heft salan û şûndetir dest pê dike. Ya balkêş ew e ku di vê navberê de lehengê sereke yê fîlmê kêliyên xwe berhev dike, ango ew kêliyên ku ji hev qetiyane û bi tund û tûjiyê re peywendîdar in ji nû ve tîne bîra xwe û dema ku li ser wan kêliyan difikire, pê dihese ku dikare bikeve nav wan bûyeran û wan bûyeran biguherîne. Bi he guherînekê di rastiyê de hin tişt diguherin. Lewre dema ku hûn di jiyana zarokekî de tiştekî biguherînin, berê jiyana wî zarokî diguhere. Riya ku dê tê re biçe, şansa wî ya sibêrojê, şiyan û hilbijartinên wî diguherin. Ev yek pir balkêş e. Pir balkêş e, lewre jiyan jî bi vî şiklî diherike. Ew bûyerên ku di jiyana wî zarokî de diqewimin, piştî ji dayikbûna wî, wisa tên danîn ku mirov dibîne ku hilbijartin bê dawî nîn in. Her zarok ji bo her hilbijartinê mîna hev dûr an jî nêzik nîn in. Ev yek pir girîng e û gelek caran em guh nadin vê yekê. Dîsa ez ji çapemeniyê yan jî zênan mînakan bidim. Çima wî zarokî ev yek hilbijart? Gelo bi rastî jî xwedî wê derfetê bû ku yeka din hilbijarta? Bi rastî jî di nav wan hestan û pêvajoyên jiyanê de em ji zarokan re alternatîfên wisa dihêlin? Alternatîfên wan çi ne? Ev yek gelek caran dibe pratîkeke wisa ku em lê nafikirin. Ku ez werim ser fîlmê, di wê fîlmê de mijareke din a balkêş heye ku zarok bi hizra gelo ez ê çawa bikarim hevalên xwe xilas bikim paşve vedigere û dixwaze kêliya herî baş biafirîne. Bi fikra min fîlm bi vê tevnsaziya xwe dixwaze li ser pêşketina zarok tiştna bêje. Ji ber vê çendê divê mirov niqteyên şkestinê baş fêm bike û divê em bizanin bê ka çima piştî niqteyên şkestinê çima vegerîna ser rewşa berê ne hêsan e û çima çarçove guheriye. Eger em jiyana zarokan bi tevî peyva suc bifikirin em ê bibînin ku sucê ewil ew e ku zarok wek mexdûrek tê nav vê jiyanê. Ango zarok tê nav jiyana bi tund û tûjî. Zarok ewil li qayî her cure tund û tûjiyê tê. Tund û tûjiya aborî ya ku malbat lê rast tê û tund û tûjiyên wekî koçberiya mecbûrî jîngeheke wisa ye ku zarok tê nav. Paşê jî li nav malê, li taxê, li kolanê, li dibistana ku divê zarokan biparêze, zarok li rastî tund û tûjiyê tên. Zarok li qayî tund û tûjiya fîzîkî, hestyar û cinsî tê û ev tund û tûjî wisa hatine meşrûkirin ku kes hesaba van nade. Di rastiyê de li gor kesên ku niha li vir in, em hemû dizanin ku ev sûc in, lê di jiyana zarokan de ev tu car wek sûc dernakevin pêşiya zarokan. Tu kes jî nayê cezakirin. Ev yek ji ber rewşa aborî ya malbatê ye. Çima di vî halî de ne? Kî berpirsiyar e? Kî sûcdar e? Ev pirs bi tu awayî nayên pirskirin. Mamoste an jî kesên gihîştî her tim bi awayekî li cihên wisa ne ku tên parastin. Ji ber vê jî em ji bo zarokan edalet û wekheviyê dixwazin. Ew li ku û çawa werin danîn? Ev

hinek bipirsgirêk in. Vêca piştî van hemû tiştan em ji zarokên ku li rastî ezmûnên travmatîk û tund û tûjiyê tên wisa hêvî dikin ku baş bin, xwe biguherînin û bê deng werin nav civakê. Em van tiştan nakin tu. Çi li dibistanê mamoste bin, çi li nav malê dê û bav bin, em wek kesên ku ji parastina zarokan berpirsiyar in gelo çiqas dikarin rê li ber tund û tûjiya em dikin meşrû û dibin parçeyekî wê, bigirin? Ev pirseke pir girîng e. Ji ber wê jî di vê projeyê de em divê pirsa “Gelo em sûcdar in?” ji xwe bikin. Lewre psîkolojî ji bo jîngeha ku zarok tê de dijî, wiha dibêje: Hûn dest bi dibistana seretayî dikin. Hîn hûn pir biçûk in û xwendekarekî pola pêncan wekî sûtalek tê dixwaze perê we hilgire, li we de. Tiştên wisa diqewimin. Lê dema ku hûn jî hinek mezin dibin û dibin xwendekarên pola pêncan, gelo çiqas ji we heman tiştî li zarokekî ku xwendekarê polan yekan e, dikin? Rêjeya kesên wisa di rastiyê de gelek zêde ye. Ev yek ne ji bo ku em bizanin ka kî sûcdar e, kî mexdûr e, lê belê ji hêla psîkolojiyê ve girîng e. Ji bo ku mirov v êneke, ango ji bo ku vê dubare neke lazim e hin mercên psîkolojîk pêk werin. Tu kes naxwaze di roleke binderst û bêhêz de bimîne. Ji ber vê jî dema ku hêz dikeve destê mirov, bivê nevê wê hêzê bi kar tîne û dema ku rêyên bitendirust ji bo bikaranîna wê hêzê neyê vekirin û ji ber vê hêzê maf werin bin pê kirin, eger hinek hêza mirov hebe him ji bo suîîstîmalkirina aliyê din û ji bo parastina xwe vê hêzê bi kar tîne. Lewre ev yek tê meşrûkirin. Lewre eger bandora wê tund û tûjiyê ya li ser zarok neyê fêmkirin û zarok li vê tund û tûjiyê nebore gelek pirsgirêk derdikeve. Ji bo ku zarokek hêrsa xwe, bindestiya xwe, bêrûmetî û bêhêziya xwe veguherîne jê re jîngehên guncaw lazim in. Di serî de jî jê re jîngeheke wisa lazim e ku empatî bi jiyana wan zarokan re bike, ji wan fêm bike û ji bo ku ew tişt careke din neqewimin hewl bide. Naxwe eger rewş dubare bibin, mîrov nebihîzyar dibe. Him li hember tund û tûjiya ku ew lê rast tê, nebihîzyar dibe him jî li hember tund û tûjiya ku ew ê pêk bîne, nebihîzyar dibe. Ev yek tiştekî bingehîn e. Ev yek di psîkolojiyê de rastiyeke bingehîn e. Ji ber wê jî divê bizanin ka em li kê derê bi tund û tûjiya ku em meşrû dikin, tevdigerin. Her wisa divê em bizanin bê ka em bi ziman û raman û tevgerên xwe ji zarokan re jîngeheke çawa pêk tînin. Digel ke me ev derfet nedabin jî em zarokan wisa dadirizînin ku qey me ew derfet dane wan. Ez dixwazim gotina xwe wiha bi dawî bînim: Divê em xalên ku em sûcdar in, qebûl bikin û vê meseleyê çareser bikin.

**Parêzer Ayşenur Demirkale**
**Baroya Stenbolê**

Merheba, ez ji ber vê xebatê Weqfa Çand û Hunerê Ya Başakê û ÇAÇAyê pîroz dikim. Lewre yek ji pirsgirêkên herî girîng ên li welatê me kêmasiya xebatên îstatîstîk, nirxandin û agahdarkirinê yên wan saziyên e ku di qadan de dixebitin. Ev cure xebatên lêkolînê di mijara destnîşankirina pirsgirêkan û riyên çareseriyê de dê rêber bin.

Beriya ku ez behsa proseya hiqûqî ya li ser zarokan bikim dixwazim bêjim ku tund û tûjî ne tenê tund û tûjiya fîzîkî ye. Li gel vê nebûna xwedî heq, bikarneanîna heqên xwe û sûdnegirtin ji parastinên taybet jî hene. Ji ber vê jî dema ku em zagonên navnetewî û netewî bînin ber çavê xwe divê em qebûl bikin ku çi kirdeyên sûcan bin, çi mexdûrê sûcan bin, hemû zarok mexdûr in. Peymana herî bingehîn a li ser zarokan Peymana Mafên Zarokan a Neteweyên Yekgirtî ye. Ev peyman mafên bingehîn ên zarokan destnîşan dike. Mafên sereke, mafê jiyan, beşdarîkirin, pêşketin û parastinê ne. Bi vê peymanê dewlet bûne berpirsiyarên hînkirina û bicihanîna van mafan. Her wisa ji ber hin zagonên navnetewî mafê zarokan heye ku zarok tev li proseya biryargirtina li ser zarokan heye. Ew dikarin ramanên xwe bibêjin û dikarin sûd ji alîkariya parêzeran bigirin. Di hiquqa navxweyî de bi taybetî bi zagonên dawiya sala 2005’an mafên bingehîn ên peymana navborî di nav zagonan de cih girt. Di makezagon û gelek zagonên din de li ser zarokan hukim hene. Di nav zagonên cihê cihê de belavbûna van hukman

di pêvajoya bicinanînê de pirsgirêk der dixe. Di sala 2005'an de Zagona Parastina Zarokan hate derxistin û bi vê zagonê him ji bo zarokên ku ji sûc zerer dibînin û him jî zarokên ku kirdeyên sûc in hukim hatin danîn. Bi vê zagonê Dadgeha Cezaya Giran a Zarokan û dadgehên zarokan hatin danîn. Dadgehên Cezaya Giran a Zarokan ji bo sûcên ku cezayên wan giran in, dadgehên zarokan jî li ser mijarên cezayên sulh û cezayên aslîye kar dikin. Bi Zagona Parastina Zarokan li ser zarokan xalên parastin û piştgirîkirinê hatin danîn û awayê biryargirtina parastina zarokan jî hate destnîşankirin. Di zagonê de hate destnîşankirin ku di derheqê zarokan de bergiriyên hewandin, perwerdekirin, çavdêriya tenduristî û şêwirmendiyê dikarin werin danîn. Her wisa di zagonê de hate gotin ku ev bergirî di çarçoveya hiqûqa cezayê de wek bergiriyên ewlekariyê werin bicihanîn. Lê belê di bicihanînê de dadgehên zarokan wek dadgehên cezayê kar dikin û biryarên ji bo parastina zarokan kêm man. Heta gelek dadgeh wisa biryar girt ku eger zarok ne mexdûrê sûc be biryardayîna parastinê ji dadgehên malbatan re hişt. Ev jî di parastina zarokan de pirsgirêkên micid pêk tînin. Eger hûn heman bergiriyê ji bo cezadayînê bidin, ev yek dibe bergiriya ewlekariyê. Ya girîng ew e ku zarok li ba malbata xwe were parastin û piştgirîkirin. Ev yek tê maneya piştgirîkirina malbata zarokan jî. Her wisa di zagona xizmetên civakî de ji bo parastina malbat û zarokan hukim hatine danîn. Her wisa dadgehên malbatan jî li ser parastina zarokan dikarin biryaran bigirin. Wek mînak, ji bo parastina zarokan ji muameleyên xirab ên malbatên wan hûn dikarin zarokan di nav saziyan de bi cih bikin û bi armanca cezadayînê jî hûn dikarin di nav saziyan de bi cih bikin.

Wextekê di çapemeniyê de nûçeyên wisa hatin belav kirin ku zarokên ku tev li çalakiyên kolanan dibin dê di nav saziyan de werin bicihkirin. Ev yek bergiriyeke cezayê ye û wek bergiriyeke ewlekarî tê binavkirin. Di navbera bergiriyên parastin û bergiriyên ewlekariyê de di mijara mueyîde û şopandina encamên van bergiriyan de cihêtî hene. Di dadgehên zarokan de bi wextê re li dewsa bicihanîna biryarên parastinê biryarên mueyîdeyê hatin girtin. Niha ji bo zarokekî ku bi sûcekî re peywendîdar tê dîtin muxatabê yekemîn li gor zagonê divê ew polîs bin ku di rêveberiya parastina zarokan de peywirdar in. Divê ev polîs bi taybetî werin perwerdekirin û di vê mijarê de bibin pispor. Jixwe li gelek deveran polîsên rêveberiya parastina zarokan di perwerdehiyên dirêj de tên perwerdekirin, di vê mijarê de dibin xwedî ezmûnekê. Ev polîs heta ku li qayî sûcên ku tim dubare dibin, neyên bi giştî, bi awayekî baş nêzikî zarokan dibin û zarokan dikin navendên têkîliyên xwe. Lê zarok heta ku di bûyerên civakî de bi polîsên parastina zarokan re rû bi rû bimînin, bi gelek polîsên şubeyên din re rû bi rû dimînin. Wek mînak, piştî çalakiyeke kolanan a ku dikeve nav çarçoveya xala 2911'an de wexta ku zarok tên binçavkirin, muxatabên zarokan ne polîsên şubeya parastina zarokan in. Di nav tu çalakiyekê de polîsên şubeya parastina zarokan nayên zarokan hilnadin. Li wir yan asayîş wan hildide, yan hêza çapik (çevik kuvvet) yan jî polîsên şubeya dijterorê wan hildide. Vêca ewil ev polîs bi zarokan re rû bi rû dimînin, îfadeyên wan hildidin û karê nîşandana cih bi wan didin kirin. Li wer eger li ser zarok nasname jî tune be heta ku temenê xwe îspar bike di derheqê zarok de gelek kar tên kirin. Paşê jî lêzimekî zarok tê, nasnameya wî tîne an jî eger polîs ji ber temenbiçûkiya wî qane bibe zarok diçe rêveberiya parastina zarokan û pêvajo piştî wê dest pê dike. Dema ku zarok diçin rêveberiya şûbeya parastina zarokan, hema ji baroyê gazî parêzerek tê kirin û tenê nasnameya zarok tê destnîşankirin, îfadeya zarok nayê girtin. Eger birçî be tê têrkirin, hewcedariyên wî yên din tên pêkanîn. Ez qala zagonê dikim. Ango divê praktîk wisa be. Paşê piştî destnîşankirina nasnameyê hemû belge ji dozgeriya zarokan tê şandin. Dema ku zarok diçe ber dozgerê zarokan divê parêzerek û yan psîkolog yan jî pisporê xizmetguzariya civakî li gel zarok hebe. Lê di pratîkê de ji ber ku di zagonê de peyva "dîbe ku" tê gotin, eger zarok bikare îfade bide yan jî dema kar nebe dozger gelek car gazî pisporan nakin. Paşê di xala 31'an a Zagona Cezayê ya Tirk de ji bo zarokan xalên bikitekit hatine danîn. Çî ye ev? Li ser zarokên jêr 12 salî şubeya zarokan ya polîsan nikare tu karek bike. Tenê nasnameya zarok destnîşan dike û teslîmî welî yan jî wasî dike. Eger zarok bêmal be dihewîne û agahiyên nasnameya zarok dide dozger. Dozger ji bo zarok bergiriyan digire, li vir jî di zagonê de gotina "bergiriyên ewlekariyê tê girtin" heye. Ango di nav çorçoveya hiqûqa cezayê de bergiriyan digire. Çi ne ev bergirî? Wek mînak eger zarokekî heft salî xwîşk yan jî birayê

xwe bikuje û ji ber vê were girtin, dozger tenê dikare bixwaze ku derheqê wî zarokî de bergiriyên ewlekariyê werin girtin. Li ser doza cezayê nikare tiştekî bike. Ev bergiriyên ewlekariyê çi ne? Wek mînak dikare biryareke wisa bigire ku zarok di saziyeke de were tedawîkirin. Dikare biryareke wisa bigire ku zarok ji malbatê were girtin li saziyekê an jî dibistaneke şevînî were bicihkirin. Ev bi pejirandina hakîm tên bicihanîn. Her weha di derheqê zarokên 12 heta 15 salî de ji bo ku were fêmkirin ka ew zarok dizane sûc û encamên sûc çi ne, raporek ji pisporên tenduristiya edlî tê girtin. Dema ku zarok ji dozgeriya ji bo qerekolê tên birin, dozger hema ji rêveberiyên şubeyê yên tenduristiya edlî re dinivîse û raporekê daxwaz dike ku ew zarokên 12 heta 15 salî gelo dizanin sûc çi ye û dikare cezayên wî sûcî semax bike an na. Dozger her wisa miayeneke fîzîkî û psîkolojîk jî daxwaz dike. Niha pisporên tenduristiya edlî di civînan de tim îtîraz dikin û dibêjin: “Em naxwazin van raporan bidin.” Lewre êdî rapor wek belgeyeke wisa tên qebûlkirin ku bi wan êdî biryara girtin an jî beraatkirina zarokan tê dayîn. Eger ev rapor rabigihîne ku ew zarok dizane bê ka sûc û encamên sûc çi ne, di derheqê wî zarokî de biryara girtinê tê girtin û doz tê vekirin. Ew rapor eger berevajiya vê bibêje, ew zarok tê serbest hiştin. Tenê bi rapora ku piştî hevdîtineke belku deh deqîqeyî belku jî piştî hevdîtineke nîv saet an jî saetekê û bi înîsiyatîfa şexsî ya pisporên tenduristiya edlî di derheqê zarokan de biryarên wisa tên girtin. Ji bo zarokên 15 heta 18 salî jî eger nexweşiyeke fîzîkî ya paralojîk nebe, bêyî ku raporeke wiha were girtin di dozgeriyê de pêvajo tê bidawîanîn. Her wisa di çavdêriya parêzeran de (dema ku îfade tên girtin bi awayekî mecbûrî divê parêzerek li ba zarokan hebe) ev pêvajo tê bidawîanîn û ji bo dadgehê tên veguhastin. Divê dozger bixwe îfadeyê bigire. Yek ji rewşa herî dilêş ewe ku eger tu navnîşaneke zarokan tune be, eger cihekî destnîşankirî yê zarokan tune be ev yek dibe egereke bingehîn ji bo girtina zarokan. Piştî ku doz hate vekirin dadgeh ji ber nebûna derfeta xwegîhandina zarokan, gelek car biryara girtina zarokan dide. Hevalên parêzer ên ku li ba zarok in digel ku dibêjin “Ji bo parastin û piştgirîkirina zarok bergirî werin girtin, ji bo zarok mekanîzmayên çavdêriyê werin danîn. Eger were darizandin jî pêvajo bila wisa bidome.” Hakimên dadgehên zarokan çi mixabin ji bo ku pêvajoya darizandinê dirêj nekin gelek caran biryara girtinê didin. Darizandina zarokan nehînî ye. Dema ku zarok di dadgeha zarokan de tê darizandin, li gel wan ji xeynê welî û wasiyên zarokan tenê kesên ku dê hakim destûrê bide, dikarin bimînin. Di dadgehên cezaya giran ên zarokan de li gel zarokan divê psîkolog, pedagog yan jî pisporekî xizmetguzariya civakî dimînin. Lê ew jî ji wan kesên ku wê gavê li dadgehê peywirdar in, tên gazîkirin. Hema wisa li ser piyan pênc an jî deh deqîqe bi zarok re dipeyvin yan jî qet napeyvin. Di dema darizandinê de piştî ku zarok îfadeya xwe dide, hakim pirseke wisa dike: “Tu çi dibêjî?” Psîkolog jî bi vî şiklî şirove dike: “Belê, dikare xwe îfade bike. Di navbera tiştên ku hatin gotin de lihevhatinek heye. Ji ber vê jî mirov dikare guh bide îfadeyên wî.” Piştre jî pêvajoya darizandina zarok didome. Her wisa di darizandina zarokan de digel ku zagon rê dide ku rapora lêkolîna civakî were nivîsandin jî, ji ber ku di zagonê tê gotin ku rapora lêkolîna civakî dikare were nivîsandin, di pratîkê de di dadgehên zarokan de tenê ji bo zarokên 12 heta 15 salî û di dadgehên cezaya giran ên zarokan de jî eger pêwîstî were dîtin ji bo zarokên 15 heta 18 salî raporên lêkolîna civakî tên amadekirin. Dema ku hakim van raporan hilnede divê egera vê yekê nîşan bide. Raporên lêkolîna civakî ew rapor in ku li edliyeyê ji hêla psîkolog û pisporên xizmetguzariya civakî ve tên amadekirin. Di vê raporê de egerên sûckirina zarok û peywendiyên vê yên bi zarok, malbat, dibistan û derûdora zarok re, rewşa dêrûnî ya zarok a dema sûckirinê û bergiriyên ku divê paşê werin girtin, tên nivîsandin. Ev raporên ku pir bikitekit in û xwedî taybetmendiyên wisa ne ku çarenivîsa zarok destnîşan dikin, çi mixabin gelek caran piştî hevdîtineke sa’etekê ya li odeyeke edliyeyê û tenê bi gotinên zarok ev rapor tên amadekirin. Ev rapor tên pêşberê dadgehan. Dadgeh jî van raporan dinirxînin. Niha mecbûriyeta bicihanîna bergiriyên parastin û piştgirîkirinê yên kê di Zagona Parastina Zarokan de hatine gotin, bêtir bi dosyeyên ku ji hêla dozgerên zarokan ve hatine amadekirin û tên pêşberê hakimên dadgehên zarokan, tên pêkanîn. Bicihanîna biryarên parastinê yên zarokê ku kirdeya sûc e, nayê dîtin. Di zagonên cihê de li ser parastina zarokan hin xal hene. Ez dixwazim hinek bikitekit qala hepskirina zarokan û pêvajoya girtîgehên zarokan bikim. Divê em vê pirsê bikin: Digel ku ji bo parastina zarokan di zagonan de gelek bergiriyên parastin û piştgiriyê hatine danîn, li hember

malbat û kes û saziyan ji bo parastina zarokan ewqas xalên bikitekit di zagonan de hatine nivîsandin, çima ewqas zêde zarok tên girtin? Çima wisa bi hêsanî biryara girtina zarokan tê dayîn? Di rewşeke wisa de ku zaroka bi hêsanî tên girtin, ne pêkan e ku li girtîgehan û piştî pêvajoya girtîgehan pirsgirêkên zarokan ji holê rabin. Eger hûn girtina bergiriyên parastin û piştgirîkirinê nexin navenda vê mijarê û karên piratîk jî li ser vê pêk neynin, kêmasiyên jeresaziyê temam nekin, hûn çiqas zagonên nû çêkin jî ew zagon dê zarokan ji girtîgehan xilas neke. Li vir ez dixwazim balê bikşînim ser vê mijarê: Zarok, çi mexdûrê sûc be, çi kirdeyê sûc be, mexdûr in. Pirsa bingehin ku divê em li jêr vê sernivîsê bikin ev be: Çima wisa bi rehetî biryara girtina zarokan tê dayîn? Spas dikim.

**Nihat Tarımeri**
**Pisporê Xizmetguzariya Civakî**

Ji we hemûyan re merheba,

Bi min wisa tê ku ez di demeke dijwar de dipeyvim. Lewre herkes westiyayî dixuyê. Lê belê mijar hesas e. Ez jî wek kesekî ku li Swîsreyê demeke dirêj pisportiya xizmetguzariya civakî kiriye, dixwazim ezmûnên xwe ji we re bêjim. Ez dixwazim qala serdana xwe ya bajarê Viyanayê bikim. Ez çûbûm Vîyanayê. Li wir hevwelatiyekî Tirk dixebitî. Hevwelatî û mirov bi awayekî bala min dikşînin. Vêca li Viyanayê hevalekî me qala jiyana xwe kir. Wî got ku “Li vir her tişt xweş e. Lê çi mixabin li vir tu nikarî li zarokê xwe jî bidî. Li vir daîreyeke ciwanan heye. Hema tê zarokê te ji destê te digire.” Li kêleka wî jî hevalekî wî yê mamoste hebû. Wî jî got ku, ma ez ê nekarim li zarokê xwe jî bidim. Dema ku em li bingeha hiqûqî ya sîstema parastinê, ango parastina zarok dinihêrin em dibînin ev sîstem li ser Zagona Medenî ava bûye. Dema ku em bala xwe bidin Swîsreyê, em dibînin ku Swîsreyê Zagona Medenî kiriye sazî. Di çarçoveya bicihanîna wesayetê de bi navê bicihanîna wesayeta fermî bi rêya Daîreya Ciwanan xizmeta parastinê wek karekî îdarî kirine du beş. Yek ji wan ji bo ciwanan, ya din jî ji bo kesên gihiştî ye. Lê belê ev sîstem dema ku hatiye Tirkiyê wek xizmeteke darizandinê hatiye dîtin. Ango wek rayeyeke mudaxelekirinê ya îdarî nehatiye dîtin. Dr. Fîkret Arik di sala 1942’an de dema ku li Stenbolê li ser zarokan xebitiye ku wê demê doktoraya xwe kiriye û paşê jî bûye profesor, li ser saziya wesayetê ya fermî gotarek nivîsiye û di kovara Wezareta Edaletê de weşandiye. Wî di gotara xwe wiha gotiye: “Me ev kar çewt kiriye. Kêmasiyeke me ya wergerandinê heye. Eger em li ser vê mijarê rêziknameyê bigûherînin û tiştên din bikin ev kar tê bicihanîn.” Gotar di sala 1942’an de hatiye nivîsîn, lê di rastî de ev gotar hîn jî li Tirkiyê nehatiye fêmkirin. Pirsgirêka heyî hinek jî ji ber vê ye.

Me xizmetguzariyên parastina zarokan bi rêk û pêkî nedaye rûniştandin. Çima Hiqûqa Cezaya Tirk bi vê meseleyê re peywendîdar e? Lewre herdu mijar paralel in. Zagona me ya Medenî jî eynî ye. Me ji Zagona Medenî ya Swîsreyê girtiye. Xala 317’an a zagonê dibêje ku “Eger zarok sûcek bike divê hema pêwîstî bi danîna peywendî bi saziya wesayetê ya fermî heye.” Ango eger zarok ber bi sûckirinê were dehfdan, parastina civakî, hiqûq û hiqûqa cezayê bi awayekî paralel pêş dikevin. Berê niha Ayşenur Xanim jî qal kir, ya ku pêvajoyê destnîşan dike Zagona Parastina Zarokan e. Ev zagon zagoneke wisa xweser e ku herdu pêvajoyê di nav xwe de dihewîne. Di rastiyê de çi li Almanyayê be çi jî li Swîsreya ku me wek mînak dabû, be hiqûqa parastina civakî û ceza du pêvajoyên cihê ne ku li ser zagonên cihê tên birêvebirin û piştgiriya hev dikin. Niha di nav vê binyeyê de ji ber ku bişkovê xelet girêdaye binyeyeke xweser derketiye holê. Niha em qala sûdewariya zarok dikin, em qala sûdewarî û qenciya zarok dikin. Baş e em di vê pêvajoyê de sûdewarî û qenciya zarok li gor çi destnîşan bikin? Me rêbazên ku di Mafên Zarokan de hene xistine nav xala çaran a Zagona Parastina Zarokan, heta me xistine nav îddîanameya dê were çêkirin û biryara ku dê were dayîn. Di rastiê de ji bo qencî

û sûdewariya zarok berpirsiyarî dikeve ser hemû tetbîqkeran. Gelo em heta çi radeyê vê pêk tînin? Gelo em çiqas girîngî didin vê? Ya duwem ew navgîn e ku bi vê mijarê re peywendîdar e. Navgîna herî bingehîn a van navgînan rapora lêkolîna civakî ye. Ya rastî rapora lêkolîna civakî wêneyekî datîne pêşiya me. Ne tenê li ser jîngeh û mercên ku zarok tê de dijî, lê belê perspektîfek li ser sibêroja zarok jî datîne. Çî ye ev perspektîf? Divê ev rapor nîşan bide bê ka di vê pêvajoyê de sûdewarî û qenciya zarok heta kîjan radeyê hatiye pêkanîn. Di rastiyê de ev yek di xala 16'an a Rêzika Pekînê de wek berpirsiyariyek heye. Lê belê ji ber çi ye nizanim, me ev veneguhastiye rêveberînameyê. Lê belê divê em bizanin ku ev yek ji wan mafan e ku divê bi awayekî normal were daxwazkirin. Ez dixwazim ji Zagona Cezayê ya Tirk ji we re xalekê bixwînim. Xal dibêje ku "Ji bo wan kesên ku wate û encamên hiqûqî yên sûcên ku kirine nizanin an jî ji bo wan kesên ku hêza birêvebirina tevgerên xwe heta radeyeke mezin ji dest birine ceza nayê dayîn." Bi fikra we ev xal kîjan xal e? Sernavê wê xalê li ser nexweşiya eqlî ye. Ango ev rewşeke wisa ye ku bi nexweşiya eqlî ve peywendîdar e. Ji hêla din ve dema ku em bala xwe didine xala 31'an ku darizandina zarokan destnîşan dike, qala heman rewşê dike. Ango ev tê vê maneyê: Di vê mijarê de armanc û navgîn gelek ji hev cihê ne. Ji bo destnîşankirina vê rewşê digel ku di Zangona Parastina Zarokan de rapora lêkolîna civakî wek navgînek hatiye danîn, bûye navgîna armanceke çewt. Wek bingeh rapora lêkolîna civakî rewşeke wisa destnîşan nake. Ji ber ku rêveberîname hinek jî bi zorê bi vê çewtiyê hesiya, ev hinek guherand. Ez demeke dirêj ji vê mijarê dûr mam û paşê di sala 2007'an de dema ku min xwest ez gotarekê binivîsim du pirtûk derketin holê. Sernavê pirtûkê Zagona (Ne)Parastina Zarokan e. Lewre ne pêkan e ku ez ji bo karekî wisa navê Zagona Parastina Zarokan bi kar bînim. Li tu dereke dinyayê tu sîstemeke darizandinê tune ye ku Dadgeha Cezaya Giran A Zarokan ava kiribe. Dema ku tu zarok dişînî Dadgeha Cezaya Giran tu di serî de qebûl dikî ku tê cezayeke giran bidî zarok. Her wisa ne xala 31'an, lê belê xaleke din bi kar tînin ku hûn bi dilê xwe şîrove dikin û konseptê li gor vê destnîşan dikin. Êdî di rewşeke wisa de ne pêkan e ku hûn ji bo parastina zarok tiştekî bikin. Niha ji vê hêlê ve ev zagon ne Zagona Parastina Zarokan e û bi ya min ev zagon Zagona Neparastina Zarokan e. Heta ez ji we re mînakekê bêjim: Gelo di nav we de kesê ku çûye dadgeha zarokan, heye? Dema ku hûn diçin wê dadgehê li ser derî lîsteyên rûniştinan tê daliqandin. Di lîsteyên rûniştinan de navê mexdûr tê nivîsandin. Xala 4'an a Zagona Parastina Zarokan dibêje ku divê nasnameya zarok neyê ragîhandin û navê zarok neyê zanîn. Hîn li ber derî nav hatiye gotin. Hûn bi tesadûfî çûne edlîyeyê, karekî we yê îcrayê heye. Dema hûn di wir re derbas dibin we dengekî dibihîsin, navê kurê cînarê xwe yan jî navê kurê xwe dibihisîn. Lewre mubaşîr diqîre. Niha dema ku mubaşîr wiha navê zarokan bi dengekî bilind bibêje ma di pratîkê de rêbaza nehînîbûnê dimîne? Jixwe bingeha xala yekem a darizandina zarokan li wir dest pê dike. Doh, dema ku ez hatim Stenbolê, bi tesadûfî hevalekî ku dizanî ez li ser van mijaran bihîstyar im, hin ji wan lîsteyên ku li ser deriyan tên daliqandin, ji min re anîn. Ev lîste dîyardeyeke şênber e, ev mekanîzma hema bêje di nav tevahiya sîstemê de (UYAP) tê bikar anîn. Li cihê ku ev kar were kirin, li cihê ku çewtiyeke wisa were kirin parastina zarokan nayê kirin. Lazim e ku ev mijar were lêpirsîn. Ya duwem, dixwazim ez ramaneke xwe ya din jî ji we re bêjim. Li tu dereke dinyayê, di dadgehên zarokan de pisporeke/î xizmetguzariya civakî an jî peywirdarekî din a karên civakî naxebite. Ev jî karekî wisa ye ku tenê li Tirkiyê dibe. Lewre li wir pisporê xizmetguzariya civakî ku divê ji bo sûdewarî û qenciya zarokan bixebite li hember hakim serbixwe nabe. Jixwe divê ew rapora ku ji hêla xebatkarekî wisa ku ji hakim serbixwe nebe, were amadekirin, dijberê rêbaza darizandina adil be. Divê zarok jî ji pêvajoya bicihanîna wan biryarên ku di wê çarçoveyê de tên girtin, werin dûrxistin. Di nav mekanîzmayeke wisa de li ser çewtiyê axaftin mijarek e û rastkirina çewtiyê jî mijareke din e. Dema ku em bi awayekî giştî dinihêrin, em dibînin ku pirsgirêk binyeya çewt e û encamên wê binyeyê ne. Kêmasiya me ya herî mezin ew e ku me sîstemeke civakî û gelemperî ku li ser bingeha hevwelatîbûnê takekesan diparêze, ava nekiriye. Çend roj berê sempozyumeke me hebû, yek ji mijarên nîqaşê jî ev bû. Diyardeya ku em jê re dibêjin xizmetguzariya civakî, di rastiyê de xêrxwaziya ser dinê ye ji bo takekesan. Xêrxwazî bûye dinyayî û xwedî li binyeyekê bûye. Berpirsiyariya derheqê xizmetguzariya civakî aydî îdareyê ye. Lê belê li Tirkiyê xizmetguzariya civakî wek berpirsiyariyeke îdarî nehatiye dîtin û wisa

hatiye dîtin ku ev yek di nav çarçoveya xêrxwaziyê de hatiye dîtin. Niha eger pirsgirêkên li ser van cure nêzikbûnan çareser nekin em ê di vê civînê û çend civînên din de li ser zarokan bipeyvin û meseleyê heta pirsgirêkeke din ji bîr bikin. Yek ji mînakên herî şênber ên li ser parastinê jî li Antalyayê hate rojevê. Hevalên ku di çapemeniyê de dixebitin hîn baş dizanin: Keçeke bi navê E.Y. li gor ku tê gotin ji hêla bavê xwe ve hatiye firotin. Di tespîtkirina vê bûyerê de dema ku keçik 12 salî bûye ev peymana firotinê hatiye danîn. Ew peyman di pêvajoya edlî de tê tespîtkirin û dibe mijara dadgehê. Dema ku min ev bûyer vekoland, tiştekî wisa derket pêşiya min: Di vê pêvajoyê de dosye ji ber meseleya rayeyê di navbera dadgehan de digere. Lê belê di îddîanameya doza di vê pêvajoyê de hatiye vekirin de him li hember bav him jî li hember dayik doz tê vekirin. Lê belê di vê pêvajoyê de ne dozger, ne hêzên ewlekariyê ne jî dadgeh berpirsiyariyên ku di xala 6'an ya Zagona Parastina Zarokan de hatine gotin bi cin neanîne. Lê belê dema ku em dinihêrin, dibînin ku berpirsiyariyeke îxbarkirinê heye. Bi ya min ev xal yek ji xalên herî girîng û bingehîn ên Zagona Parastina Zarokan e bi ya min.

Di derheqê kesê ku vê pêk nahîne bi tu awayî tu pirs nayê kirin. Ev yek nayê kolandin. Gelo em dema ku zarokan diparêzin, em zarokan ji kesên ku divê zarokan biparêzin, diparêzin? Lewre ew dema ku berpirsiyariyên xwe bi cih naînin gelo tu mueyidekeyek ji bo wan tê danîn? Na. Ev jî yek ji pirsgirêkên bingehîn e. Tu kes li hember sûcnekirinê ne xwedî sîgorte ye. Riya me hemûyan jî dibe ku rojekê bikeve ber dadgehan. Rast e, divê ji bo me hemûyan mafê darizandina hevçerx hebe. Ji vê hêlê ve divê em darizandina zarokan cihê bikin. Divê em vê qet nebe bi navê darizandina ciwantiyê li gorî lîteratura dinyayê bikin. Lewre li dinyayê, li Almanyayê di sala 1924'an de dadgehên ciwantiyê hatiye danîn. İngîlîzan di sala 1970'an de dadgehên ciwantiyê danîne, ango dadgeha zarokan bûye, paşê bûye dadgeha ciwanan. Dema ku em berê xwe didine îstatîstîkên du salên dawîn ên wezareta Dadê, em dibînin ku rêjeya sûckirinê ya zarokên ku di navbera 16-18 salî ne de %60 e. %40 jî zarokên 13-15 salî ne. Ango piranî ciwan in. Darizandina ciwanan û darizandina zarokan xwedî taybetmendiyên ji hev cihê ne. Ji ber vê jî divê em di riyên rast re bi rê kevin û divê em vê yekê ji nû ve bikin konsept. Ev xebat qet nebe ji bo şênberkirina van mijaran, di asta Stenbolê de nîqaşkirina vê mijarê, nîşandana rewşa zarokan (bi taybetî ji hêla zarok ve ) pir girîng e. Ez wek hevwelatiyek spasiya xwe ji wan kesan re dikim ku alîkariya vê xebatê kirine. Ez wek xebatkarek spasiya xwe dikim. Lê zêdê hêvîdar nîn im. Ez di vê mijarê de pesîmîst im. Egera vê jî ev e ku carna em naxwazin ji keran bêtir bibihîsin. Carna em ne dibînin, ne dibihîsin û ne jî dipeyvin. Zagon ji sala 2005'an vir ve tê pêkanîn û di vê mijarê de krîtîkeke rast û dirust tune ye. Ez hêvîdar im ev xebat dê bibe destpêka nîqaş û pêvajoyeke nû. Di rastiyê de divê em zêde ji zarokan hez nekin. Em rêz li zarokan bigirin û rûmet bidine wan. Ji ber ku we guhdariya min kir, ez spas dikim.

**Abdulkadir Güger**
**Rêvebirê Şubeya Xizmetguzariya Zarok û Kreşê ya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê**

Di mijareke wiha de tijîbûna vê salonê gelek xweş e. Ez dixwazim vê bibêjim û wisa dest bi axaftinê bikim. Û ez spasiya wan zarokên ku keda wan di vê xebatê de hene û hevalên xwe yên xebatê dikim. Ez ji ber ku wek Rêvebirê Şubeya Xizmetguzariya Zarok û Kreşê ya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê dixebitim li rastî gelek gelek xebatên hiqûqî û civakî yên li ser vê mijarê hatim. Ez ê qala him aliyên hiqûqî him jî travmatîk ên vê meseleyê bikim. Lê pêşî dixwazim bêjim ku li Başûrê Rojhilatê bingeha vê meseleyê koçberî ye. Lewre bajarê Amedê ku bîst sal berê hejmara şêniyên wê 300.000 bû di nav bîst salan de gîhişt mîlyonek û nîv. Ev bajar bêyî ku di aliyê civakî û bajarvaniyê ve pêş keve gelek mezin bû. Ev yek jî bi xwe re gelek pirsgirêkên mezin tîne. Pirsgirêka din jî bihêznekirina rêveberiya deverî ne. Rêveberiya deverî bi bacan li ser piyan dimîne. Lê belê bajarê ku em lê dijîn bajarekî pir hêjar e. Ji ber vê jî

dahatên bacê hema bêje tune ye. Hûn nikarin perê faturayên avê bistînin. Ev yek di xizmetguzariyê de astengiyan pêk tîne. Nediyarbûna polîtîkayên deverî, bi zanebûnî û bi sîstematîk paşdehiştina dever û bajaran gelek pirsgirêkan bi xwe re tîne. Lê belê pirsgirêkeke din heye ku nayê hesibandin. Ango ev pirsgirêk tenî li deverê namîne. Carna ev pirsgirêk li Stenbol, Îzmîr, Bursa û Enqereyê jî dibe pirsgirêk. Êdî malbat ber bi cihên din koç dikin. Zarok li qadên cihê dixebitin û rêjeya sûckirina zarokan êdî hin beşên cihê yên civakê aciz dike. Ev pirsgirêk di rastiyê de dibe pirsgirêka welêt. Ji ber vê jî gelek xebat bi ser nakeve. Carna dê û bavên zarokan tiştên wisa jî dibêjin: “Xebatîna zarokan a li kolanan ji bo me ne pirsgirêk e. Ji ber ku ji bo we pirsgirêk e hûn li ser vê mijarê nîqaş dikin.” Dema ku hûn berê xwe didin raboriya wê malbatê egera sereke ya vê pirsgirêkê derdikeve. Malbateke xwedî zevî û erd e, xaniyê wê malbatê çar, pênc ode ye. Ango rewşa wê malbatê li gund gelek baş e. Zarok dema ku li zevî an jî li dereke din bixebite di jiyana gundewariyê de ne pirsgirêk e.

Ji ber ku rewşa aborî ya malbatê diguhere di jiyana zarokan de gelek pirsgirêk derdikevin. Bi awayekî xwezayî pirsgirêkên ku zarokal li kolanan lê rast tê bandor li ser malbatê dike. Rolên nav malbatê gelek guherîn. Êdî bav desthilatdariya xwe ya li ser malbatê êdî êdî ji dest dide. Zarok ji ber ku beşdariya debara malê dike, di nav malbatê dibe xwedî gotin. Ji ber ku malbat û zarok ji perwerdehiyê dûr dimînin tund û tûjiya li hember zarokan û tund û tûjiya nav malbatê zêde kiriye. Dema ku em van hemûyan dinirxînin dibînin ku pirsgirêke bingehîn a li deverê koçberî û hejarî ye. Mîna ku hevalê me yê hiqûqnas jî got him Peymana Mafên Zaroka tê binpêkirin, him jî xalên ku divê werin bicihanîn, hema bêje bi giştî nayên bicihanîn. Xalên bişert pirsgirêkeke girîng e. Çawa ku hevalê me yê E. jî got keçek nikare bi diya xwe re bipeyve. Dayik kesê herî nêz e ji mirovan re. Ev rewş dibe egera travmayên mezin. Lê belê em çi dikin? Dema ku peymanan îmze dikin, em Peymana Lozanê wek hincet nîşan didin şert datînin li ser xalên 17, 29 û 30 ku li ser mafê perwerdehî, azadiya derbirîn, mafê geşkirina çanda xwe û mafê bikaranîna zimanê xwe ne. Ev yek rûreşî ye. Ev xal him di nav malbatê de him li ser zarok pirsgirêkên mezin pêk tîne. Lê belê ev pirsgirêk biçûk tên dîtin.

Çima zarok (bi taybetî li Amed û Rojhilata Başûr) li kolanan e? Egerên vê yekê di serî de polîtîk in. Egerên malbatî, newekheviya derfeta xwendinê jî mîna li derên din jî egerên vê yekê ne. Ez vê yekê him wek perwerdekarek him jî ji ezmûnên xwe yên qadan dibêjim. Koçberiya mecbûrî, egerên hawîrdorê, hejarî, egerên şexsî, bicihneanîna Peymana Mafên Zarokan, heyîna xalên bixert pirsgirêkên sereke pêk tînin. Dema ku em li egerên polîtîk dinihêrin em di serî de koçberiya mecbûrî dibînin. Bi salan ev mesele wek meseleya koç û koçberan hate dîtin. Lê êdî di demên dawî de ev yek wek koçberiya mecbûrî tê dîtin. Di rastiyê de zarokên me yên ku niha di vê holê de ne û parçeyekî girîng ê vê xebatê ne ji ber ku temenê wan biçûk e, bi çavê xwe ango bi awayekî rasterast nebûne şahidên pêvajoya koçberiyê. Lê belê ew li qayî travma û encamên giran ên vê koçberiyê hatin. Ew çawa li qayî pirsgirêkên wisa mezin hatin? Ew zarok bi çîrokên giran û êşbar ên koçberiyê mezin bûn. Malbatan di şevên dirêj ên zivistanê di di xaniyên xwe yên yek odeyî de tim qala rewşa xwe ya berê kir û rewşa xwe ya berê û ya niha anîn berhev. Zarokên me piştî demekê ev pirs ji xwe kir: “Madem rewşa me berê baş bû, çima em niha di vî halî de ne? Em çima mecbûr in ku bixebitin? Çima em ji nav paşmayiyên xelk nan berhev dikin? Em çima birçî ne? Em çima wisa di xaniyekî teng de dijîn?” Piştî vê travmayê zarok li gor me bi awayekî nenormal lê belê li gor şert û mercên xwe yên jiyanê bi awayekî normal wisa tev digerin ku îro di civakê de ew wek zarokên ku kevir diavêjin, zarokên ku ber bi sûckirinê tên dehfdan û hwd. tên binavkirin. Li gor gelek kesan tevgerên wisa nenormal in. Lê belê li gor rewşa jiyana zarok û malbatan tevgerên wisa normal in. Baş e, di vê pêvajoyê de em çi dikin? Ji bo Zagona Parastina Zarokan gelek amadeyiyên baş hatine kirin û hatine pêşkêşkirin. Ez lêborîna xwe ji hevalên hiqûqnas dixwazim û dibêjim ku hema bêje yek ji xalên wê zagonê nayê bicihanîn. Wek mînak, zarok dema ku bi awayekî hêsan ji hevalê xwe yê li mektebê re qala îstîsmariyeke dike, ez bawer dikim nêzikî 20 kesên vatinîdar re naçar dimîne ku bipeyve. Ango zarok naçar dimîne ku qet nebe ji bîst kesan re heman tiştî dubare bike û bêje. Ji pisporê xizmetguzariya civakî, mamosteyê rêber, mamosteyê polê, birevêbirê dibistanê, pisporên xizmetguzarî yên li saziyên asayişê, psîkologan û hwd. re… Eger em mînakên hêsan bidin, dema ku zarok fîlmekê de dibîne ku jin û mêrek hevûdu maç dikin, ji

hevalê re dibêje ku bavê min jî heman şiklî ez maç kirim. Ev mesele ji mamosteyê polê re tê gotin. Ji wir jî mamosteyê rêber hîn dibe. Di vê pêvajoyê de gazî zarok dikin û eynî pirsan li ser hev ji zarok dipirsin. Hevalên hiqûqnas baştir dizanin, li Tirkiyê avakirina navendên çavdêrîkirina zarokan pêwîstiyeke pir lezgîn e. Ev navend ji bo kinkirina vê pêvajoyê pêwîst e. Bi avakirina navendên çavdêrîkirina zarokan hindik jî be dawî li travmayên zarokan bîne û bi awayekî sîstematîk ev kar were kirin. Naxwe Zagona Parastina Zarokan û zagonên din ên li ser vê meseleyê bi qasî ku tê hêvîkirin piştgiriya van bûyeran nake. Her wisa li Rojhilata Başûr pirsgirêkên wisa derdikevin pêşiya me: Xetereyên bêparmana ji perwerdehiyê ya zarokan, pêkneanîna hewcedariyên zarokane ya zarokan, ango zaroka wek zarok najîn. Di têbîniyên me yên hevdîtinan de zarokek wiha gotibû: “Mamoste ma ez qet dixwazim bixebitim? Ez jî dixwazim gogê bilîzim. Lê ez naçar im ku bixebitim.” Yê ku ev got zarokekî neh salî bû. Pêkanîna şert û mercên ku zarokan ber bi maddeyên narkotîk dikşîne, zêdebûna îstîsmariya fîzîkî, cinsî û hestewerî, pêşketina nelirê ya netewî û civakî, tevgera bêhişmend a zarokan, jîngeha bêserûber, azad û xeternak a kolanan, pêkhatina zexta malbat û civakê û pêkhatina nifşeke bêpirsiyar tê xwestin. Di rastiyê de sîstem tam vê dixwaze. Bi maddeyên tevzîner dixwazin mêjiyên mirovan têk bibin û nifşeke wisa pêk bînin ku dij li sîstemê dernekeve. Pevçûna nasnameyê û pevçûna rolan. Pêkhatina civakeke wisa ku di navbera bajar û jiyana gundewariyê de asê maye. Zêdebûna xetereyên sûckirinê û sûckirinê wek helwestên normal dîtin. Êdî ev rewş gelek caran tê pêşberê me.

Bi destûra we dixwazim çend agahiyên îstatîstîk bidim. Li navenda Amedê di sala 2000’an de 1524 zarok ji bo saziyên ewlekariyê hatine veguhastin. Ev hejmar di sala 2006’an de bûye 3308. Ev hejmar tenê li ser bûyerên edlî yên ku hatine tomarkirin e. Her wisa di sala 2006’an de li gor îstatîstîkên rêjeya sûckirinê di rêjeya sûcdariya zarokan de Stenbol di rêza yekemîn a Tirkiyê de ye û mixabin Amed jî di rêza duyemîn de ye. Piştî Amedê bajarên wekî Bursa, Mêrdîn, Sêrt, Bedlîs, Sêwas, Grîdax, Êlih û Erzirom tê. Dema ku em herdu bajarên yekemîn û duyemîn ji hêla hejmara şêniyan ve didin ber hev tabloyeke tirsnak derdikeve. Em dibînin ku ji hêla hejmara şêniyan ve potansiyeleke micid derketiye. Di dawiyê de em dîsa digihîjin vê encamê: Egerên ku zarok anîne nav kolanê û egerên hejariya malbatan. Polîtîkayên asîmîlasyonê yên ku di serdema komarê de li Rojhilata Başûr bi salan hate pêkanîn û bi ser neketin, mixabin îro li Rojhilata Başûr civakeke bihêrs pêk anî. Her wisa koçberiya mecbûrî û malbatên ku hatin hejarkirin û parçekirin wisa kir ku ev mesele ne tenê li Amedê bimîne û li bajarên din belav bibe û bibe pirsgirêkeke welêt. Îro ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê gelek xebatên micid tên kirin. Lê ev xebat bi teknîkên çewt tên kirin. Ez li vir dixwazim mînaka tedbîrê ku mamosteyê min Nihat Tarımeri di pirtûka xwe ya li ser Zagona Neparastina Zarokan de daye nîşan bidim. Di rastiyê em wiha pirsgirêkê ji ber çavan winda dikin. Mamosteyê min Nihat di mînaka xwe de wiha dibêje: Ji ber qeyrana aborî cîhê ku du kesên ku ji heman malbatê ne û ji dibistana amadeyî mezûn bûne, lê dixebitin, tê girtin. Malbat bê kar dimîne. Zarokên vê malbatê hene. Malbat ji bankayê kredî kişandiye û êdî nikare deynên krediyê bidin. Bûyerên tund û tûjiyê yên ku gelek kêm diqewimîn êdî zêde dibe. Ji zarokan keça neh salî li rastî tund û tûjiyê tê. Lêzim an jî cîranan wê dibin nexweşxaneyê. Bûyer di çarçoveya Zagona Parastina Zarokan de di saziyên edlî de tê tomarkirin. Paşê birayê wê keçikê yê 12 salî dema ku ji dikanê nan didize, tê girtin û herdu dosye di dadgehê de dibe yek. Biryara tedbîrê ya ku dadgehê digire dibe biryara tedbîrê ya perwerdekirina malbatê. Ango di dawiya hefteyan de malbat tê perwerdekirin, pisporên xizmetguzariya malbatan xal û pêşniyarên xwe li ser nehiştina tund û tûjiyê li hember zarokan, ji malbatê re dibêjin. Lê belê pirsgirêka bingehîn, ango bêkariya malbatê û qeyrana aborî didome. Malbat tund û tûjiyê bi awayekî sîstematîk û profesyonel pêk tîne. Ango bêyî ku li dû xwe şop bihêlin tund û tûjiyê dikin. Di rastiyê de zarok bêtir dibe mexdûr. Êdî nikare here nexweşxaneyê û xwe biparêze. Em dema ku li ser kaxezê zarokan diparêzin, di rastiyê de zarokan ber bi rewşeke xirabtir dehf didin. Em pirsgirêka rasteqîn jî piştguh dikin. Li pirsgirêka bingehîn hejariya malbatê ye, egerên aborî û encamên vê ne. Dema ku em zarok diparêzin zarok ji malbatê digirin. Ango li gor sîstema me ev yek wek sîstema parastinê tê dîtin. Lê girtina zarok ji malbatê di rastiyê de parastina zarok nîn e. Di rastiyê de ev ye cezakirina zarok e. Lewre hûn nikarin çavdêriya zarokan di saziyên parastinê de bikin. Ango

hûn zarok ji malbatê digirin û dixin nav saziyên parastinê yên dewletê, lê bi qasî ku pêwîst e xizmetê nadin. Ev yek ji bo zarokan metirsiyên cihê pêk tîne. Em di nav zagona parastin û xebatên din de pirsgirêka rasteqîn piştguh dikin. Êdî divê em vê yekê bi awayekî eşkere bepeyvin: Li vî welatî mirov li qayî travmayan tên. Hevalên ku bûyera Pozantiyê eşkere kirin, hatin girtin. Ango li ser çapemeniyê zexteke psîkolojîk tê pêkanîn. An jî zarokê ku li ser bûyera Pozantiyê peyivî piştî rojekê bi hinceta ku cezaya wî heye, tê girtin. Ew zarok dema ku em li vir dipeyvin dibe ku hewl bide ku xwe bikuje. Malbat bi gelek pirsgirêkên cihê re rû bi rû dimînin. Lê belê em di nav sîstemeke wisa de dijîn ku ev sîstem bi pisporî hatiye danîn û em jî tê de bûne navgîn. Îro me zarok dane aliyekî û em li ser sîstema 4+4+4 nîqaş dikin. Polîtîkayên li ser zarokan divê polîtîkayên deverî bin. Peymana Mafên Zarokan divê were bicihanîn û divê li gor deverê polîtîka ji bo zarokan were danîn. Pirsgirêka zarokê ku li Amedê dijî û ya zarokê ku li Stenbolê dijî eynî nîn e. Le Amedê newekheviya derfetên perwerdeyê heye. Ez ê dibistaneke li taxa ku ÇAÇA lê xebitî wek mînak nîşan bidim. Ez ê hemû şert û mercên fîzîkî yên dibistanê venebêjim, lê belê dibistan ji girtîgeha nîvvekirî xirabtir e. Lewre bilindahiya dîwarên wê 3-4 metro ye û li ser dîwaran jî têldirik hatiye danîn. Li ber deriyê hesinî jî her tim notirvanek heye. Hûn nikarin bikevin nav dibistanê û jê derkevin. Em dev ji van berdin ez dixwazim qala wan pirsgirêkên ku li deverê zarokan ji me re gotin, bikim. Rêvebirê dibistanê ji ber ku hevalekî mey ê dilsoz bû ji min re tiştekî girîng got. Ji 350 kesan re tenê kabîneke tuvaletê dikeve. Ez qala kabîneke tuvaletê dikim. Ev yek ji hêla tendirustiyê ve xirab e û xalên bingehîn ên Peymana Mafên Zarokan bin pê dike. Ev yek tenê mînakek e. Zarok di nav şert û mercên netendirustî de perwerde dibin û perwerdekarên zarokan di hefteyekê de carêk diguhere. Lewre mamoste nayên tayînkirin. Digel ku li deverê gelek pirsgirêkên micid hene, mamosteyekî/e bidestmiz tê şandin û ev mamoste ji ber xirabiya şert û mercan hefteyek şûnde dev ji wê dibistanê ber dide û diçe. Mamosteyekî/e nû tê û hema ders dîsa ji serî de dest pê dike. Lê belê sîstem van zarokan li gel zarokên ku li kolejeke Antalyayê dixwînin dixe heman ezmûnê û ji ber vê jî asta serkeftina van zarokan dikeve. Ez dixwazim mînakeke din a biçûk jî bêjim. Zarokek di hevdîtinê de ji me re qala serpêhatiyeke xwe kiribû. Wî gotibû ku divê şanseke din ji zarokan re were dayîn. Çima divê em şanseke din bidin zarokan? Dozgerekî/e zarokan mînakeke wiha gotibû: Rêvebirê dibistanê li oda xwe bi tevî mamosteyên din, ji ber ku bi hevalên xwe re şer kiriye, li zarokekî/ê dixe û cezaya sê rojan a dûrxistina ji dibistanê dide zarok. Piştî sê rojan ev zarok diçe edliyeyê, ango diçe ba dozger. Zarok bi egere zererdayîna malê gelemperiyê tê pêş dozger. Dozger dipirse: “Te çima kablo birrî?” Zarok di serî de fam nake, lê piştî ku hînek dipeyve vê dibêje: “Rêvebirê dibistanê li min xist, paşê jî ez ji dibistanê dûr xistim. Min jî dê û bavê xwe re negot. Sê rojan ez çûm dibistanê. Ji ber ku rêvebir ji min gelek mezintir û bihêztir e, min tiştek nekir. Ez wisa fikirîm ku eger ez kablo bibirim ew ê cezayê bigire. Loma min kablo birrî.” Eger em ji hêla sîstema hiqûqê ya zarokan binihêrin, dibe ku zarok sûcek kiribe û divê were cezakirin. Lê belê eger em ji hêla zarok û hestên mirovî ve binihêrin zarok ji ber naçariyê, ji bo ku ceza bide kesê ku li hemberê wî ye, tiştekî wiha kiriye. Çewtiya sîstemê ew e ku nizane bê ka em çawa nêzikî zarokan bibin. Hevalên hiqûqnas jî, hevalên ku di qada civakî de dixebitin jî li ser vê mijarê pispor nîn in. Bûyereke wiha qewimiye: Hakim ji ber ku nizane bê ka çawa pirsan bike, ji zarokekî/e neh salî ku li qayî tacizî hatiye pirseke wiha dike: “Bû an nebû?” Hakim vê pirsê bi hêrs dike. Zarok nikare bipeyve jî. Li gel wî/ê dê û bavê wî/ê heye û hûn ka ew hatiye tacizikirin an na, pirsan dikin. Hûn bêyî ku bizanin bê ka psîkolojiya zarok çawa tesîr dibe, pirseke wiha dikin. Ango ji bo pirsa gelo ez sûcdar im, gelo em sûcdar in, em bawer dikin ku kes nikare bersiveke neyînî bide. Divê tu kes bersiveke neyînî nede jî. Tu kes nikare xwe li derveyî van bûyeran dayne. Bi ya min her kes sûcdar e û divê herkes rola xwe bi cih bîne. Lê belê pirsgirêkên cihê hene û divê polîtîkayên cihê, li gor şert û mercên deverê werin danîn û ji bo pirsgirêkê çareyek were dîtin. Egera bingehîn nebûna şert û mercên bicihanînê, ber bi sûckirinê dehfdana zarokan û sûcdar hesibandina zarokan e. Spas…

**Pinar Ogunc**

## Qunciknivîsa Rojnameya Radîkalê

Merheba. Ez ji çend hêlan ve di nav rewşeke dezavantaj im. Ya ewil ew e ku piştî evqas axaftinên ku çarçoveya mijarê datîne, gelek zehmet e ku mirov tiştekî nû bibêje. Bi rastî jî ew tiştên ku min plan dikir ku bigotana ji kaxizê yek bi yek derxistin. Her wisa ez ê ji ber ku di mijara axaftina Yüce Yoney de bipeyvim, karê min zehmettir dibe. Ez dixwazim ji vir dest pê bikim: Yek an jî du meh berê tevahiya Tirkiyê li ser wê bûyera ku li hola konferansê ya Dibistana Amedeyî ya Erziromê agahdar bû. Li wir çi qewimîbû? Li ser deriyê konferansê "Civîna hedûrê" hatibû nivîsandin.

Vêca li vir rêvebirê Dibistana Seretayî ya Dumlupinarê ji nav temaşevanan mafê gotinê digire (hinek dûdilî jî kiriye) û di destpêkê de dibêje "Dibe ku hûn ecêb bibînin" û bi vî şiklî axaftina xwe didomîne: "Êdî li welatê me rû tê neqlkirin. Ji zarokan xwîn were girtin û genên xwînên zarokan werin lêkolandin. Zarokên ku dê ji welat û neteweyê re zererê bide beriya ku bi meşê bikeve ji holê were rakirin." Rêvebirê dibistanê dibêje "Dibe ku hûn ecêb bibînin" û dû re jî tiştên ecêb wek tiştên normal dibêje. Bi ya min divê em li ser vê yekê hinekî din bifikirin. Lewre ev gotin têgîhana serdest a li ser zarok û sûc deşîfre dike. Dibe ku piştî vê axaftinê derheqê rêvebir de lêpirsîn hatibe vekirin. Dibe ku ev mijar bi vî awayî were girtin. Lê qet ji bîra min naçe, piştî axaftina rêvebir gelek kes bişarî û hol bi dengê çepikan tijî bû. Salon bi dengê çepikan hejiya. Ya ku divê em li ser bifikirin ev çepik in. Hûn dikarin wî rêvebirî ji kar biavêjin, lê hûn ê wan kesên ku çepik lê da bû, çi bikin? Em qala rêvebirekî wisa dikin ku dibêje zarokên ku dê zererê bide welêt û gel beriya ku bi meşê bikevin divê ji holê werin rakirin.

Niha di nav vê têgîhana serdest de ez di nav saziyeke çapemeniya serdest de dixebitim. Baş e zarok di nav çapemeniya serdest de çawa tê dîtin? Ji nûçeyan bigire heta reklaman zarok wek berhemxurekî potansîyel tê dîtin û piraniya reklaman li ser zarokan tê çêkirin. Ev yek jî nêzîkatiya çapemeniya serdest a ji zarokan re diguherîne. Êdî zarok dibe hêmayeke mêtingeriyê. Zarok ji ber bûyerên edlî û sûc jî di nav çapemeniyê de cih digirin. Zarokê ku bi sûc re tê têkîldarkirin (dibe ku hatibe binçavkirin, girtin an jî biryara cezayê girtibe) di nav çend merhaleyan de di nav çapemeniya serdest de cih digire. Çapemeniya serdest ji bo domandina heyîna xwe bi rêbaza "Hin kêmasiyên ku di nav civakê de hene wekî ku gelek belav e divê were nîşandan" tev digere. Eger di civakê de reheke netewkar hebe divê ev taybetmendî bêtir were nîşandan. Eger di nav civakê de reheke exlaqî hebe divê ev taybetmendî bêtir were nîşandan. Dema ku peyvên zarok û sûc tên ba hev, motîvasyona ewil xurtkirina xemên xwedêgiravî yên civakê û têgîhana populîst a exlaqê dibe. Ev pêvajo bêguman tê maneya binpêkirina mafên zarokan ku bi peymanên hiqûqî yên gerdûnî ve hatine destnîşankirin. Lewre fîgûreke zorakan heye ku li gor çapemeniya serdest divê wek cinawirek were nîşandan û marjînalîzekirin. Lewre eger ew zarok wek cinawir werin nîşandan û ji civakê werin dûrxistin, piraniya civakê dê rehet be. Bi vî awayî sûc ji wan dûr dikeve û civak jî xwe têkîldarî wan zarokan nabîne.

Kesê ku tê deşîfrekirin zarok e û ji vê jî wêdatir, bi awayekî giştî zerereke dide deşîfrekirina gumanbar û mexdûran. Piştî pêvajoya darizandinê jî ew ê ji hêla psîkolojiyê ve li qayî pêşdaraziyan werin û ji nû ve tevlêbûna wan a li civakê zehmettir dike. Bi pakêta îstîhdamê ya sala 2008'an ve zagona mecbûriyeta xebitandina kesên ku ceza girtine hate guherandin. Berê li cihên ku ji 50 kesan zêdetir dixebitin divê li kerta gelemperî %1 û li kerta taybet jî %2 kesên ku berê cezaya hepskirinê girtine bihatana xebitandin. Bi tevî vê paketê berpirsiyariya kerta giştî hate betalkirin. Jixwe wek psîkolojîk me kesên ku cezaya hepskirinê girtine dûr dixist û bi vê guherandinê ve jî derbeyeke wiha lî me li wan xist.

Di nûçeyên li ser zarokan ên çapemeniya serdest de vegotina nefretê jî heye. Dibe ku polîtîkaya weşanê ya wê saziyê li ser vegotina nefretê be. Rojname û kovarên wisa hene, em dizanin. Lê belê weşanên ku ne wisa ne jî, hene. Vegotina nefretê ya nûçegîhanê, edîtorê wê nûçeyê û rêvebirê ku destûr dide ku ew nûçe were weşandin di nûçeyên li ser zarokên ku bi sûc re tên têkîldarkirin de hîn zêde dibe. Gelek zehmet e ku rojnamegerekî/e ku li hember

Qereçiyan vegotina nefretê bi lêv dike nûçeyên ku tê de vegotina nefretê tune be, binivîse. Lewre li gor wî eger mirov qereçî be jî xwe ji bo dizîtiyê meyîldar e. Eger nefret li Elewiyan bike, dema ku nûçeyeke li ser sûc hebe di nivîsa nûçeyê de dê heqeretê bike. Ev heqeret li hember hejaran û çînên bindest were kirin. Her wisa li hember Kurdan jî ev heqeret tê kirin. Vegotina nefretê şêwaz û zimanê nûçeyên ku di çapemeniya serdest de cih digirin, diguherîne.

Şêwaza cihgirtina nûçeyan û helwesta îdeolojîk a wê organa weşanê jî girîng e. Em li ser zarokên Kurdan, bi taybetî jî li ser zarokên ku di çapemeniyê de bi qalibên wek "Zarokên ku kevir diavêjin" tên nîşandan, axaftina xwe bidomînin. Jixwe eşkere ye ku organên weşanê yên ku di meseleya Kurdan de gotina wan diyar e, zarokan wek navgîneke manîpulasyona siyasî bi kar bînin. Mirov divê zêde jê hêvî neke. Qaliba zarokên ku kevir diavêjin çawa pêk hat? Ev ne fikreke wisa ye ku yekî di salên 2000'an de gotiye. Zarokên ku di çalakiyan de bi avêtina keviran xwe îfade dikin di her xwepêşandanê de derketin pêşiya me. Baş e, gelo wek qalib di çapemeniyê de cihgirtina zarokan sûdewar bû? Ji bo ku hîn bin ka çiqas sûdewar bûye, min sernav û spotên hin nûçeyên ku di wan serdeman de hatine weşandin, bi xwe re anîn. Wek mînak, nivîskarekî quncikê wiha dipirse: "Gelo kevir avêtin mafê zarokan e?" Ew wisa tercîh dike ku ji vê hêlê ve li meseleyê binihêre. Nivîskarekî din ê quncikê jî rasterast bi zimanê vegotina nefretê dibêje ku li Rojhilata Başûr mirov hewl didin ku li hev zarokan çê bikin, lewre ji ber her zarokekî/ê dewlet ji wan re pere dide, hem pere digirin him jî zarokan ber didin kolanan û zarok jî kevir diavêjin. Yekî jî sernavê "Ji bo kêfê tund û tûjî" daniye ser nûçeyê. Piştî guherîna zagonê me manîpulasyoneke wiha dît: Vê zagonê di rastiyê de hejmara zarokên ku tev li xwepêşandanan dibe, zêde kir. Wê demê gelek nûçeyên wisa hene ku îddîa dike ku zagona zarokên ku kevir diavêjin berê zarokan dide sûckirinê. Di gelek nûçeyan de qala wê tê kirin ku ka kî van zarokan bi rê ve dibe û bi kar tîne…

Bêguman paşê jî gelek nûçeyên wisa tên weşandin ku ev nûçe pêşniyar dikin ku ev zarok ji destê malbatên xwe werin girtin. Rapora Sedat Yağcıoğlu ku ji Zanîngeha Hacettepeyê ye û bi zarokan re hevdîtinan pêk aniye qala sê vegotinên têgîhana li ser zarokan a muxafezekaran dike. Sedat Yağcıoğlu dibêje ku ev zarok ji 18 salî biçûktir in, lê di nav wextê re gelek kemilîne. Di rastiyê de divê em wan wek zarok qebûl nekin. Ev helwest bi serê xwe helwesteke wisa ye ku divê li serê bifikirin. Eger ku zarok zû pêdigihên û dikemilin, egera vê çi ye? Divê em li egera vê bigerin?

Ev têgîhana muxafezekar a li ser zarokan dibêje ku ev zarok bi vîyana xwe ne li wir in. Em vê yekê gelek caran dibînin. Vegotina sêyem jî ev e ku ev zarok ji hêla hin kom, partî û rêxistinan ve tên bikaranîn. Vê yekê jî nîşan dide ku têgîhana muxafezekar çawa zarokên ku bi rêya xwepêşandanên civakî siyasetê dikin, bê nirx dike. Di çapemeniyê de şêwazeke din a nûçeyan heye ku rêveberiyên ewlekariyê yên mîna Mêrsîn û Edeneyê gazî nûçegîhanan dikin û nûçeyên dîtbarî didin amadekirin. Ev nûçe ne sîh sanîye lê belê 5-6 deqîqe dikşîne. Di bernameyên sereke yên nûçeyan de em nûçeyên hin çalakiyên ku rêvebirên ewlekariyê ji bo ku nêzîkî zarokan bin, temaşe dikin. Min nûçe di ber çavan re derbas kirin û çalakiyên wisa derketin pêşiya min: Gerandina zarokan li lunaparkê, qiraxa behrê û navendên mezin ên firoşgehan. Ango polîs ji bo ku nêzikî zarokan bin, wan dibin li navendên mezin ên firoşgehan digerînin. Wekî din? Bi hevre çûna pîknîkê, lîstina bowlîngê, li panzeran siwarkirin, danasîna hin seyareyên bizirx, ji ser mobeseyan geşteke dîtbarî li nav bajêr… Wisa nêzikî zarokan dibin. Dibe ku ev ji bo zarokan balkêş bin, lê divê em hinek li ser van bifikirin. Wekî din? Bi hev re goga pê dilîzin û dema ku dilîzin jî polîs dixwazin bi ser kevin. Wekî din? Pêwîstiyên zarokan yên mîna cil û berg û pêlîstok dîyarî kirine… Mûz di mijareke wiha de fêkiyeke remzî ye. Ji zarokan re mûz û fêkiyên din hatine dayîn.

Dema ku min li van nihêrî, nûçeyeke din dît. Di xwepêşandanekê de zarokek dixwaze lastîk bişewtîne û kevir biavêje. Sernavê nûçeyê wiha ye: "Şêniyên taxê zarokên ku kevir diavêjin terbiye dikin." Çend jinan hewl daye ku zarokan qane bikin û wiha gotine: "Zarokno lastîkê neşewtînin û keviran neavêjin." Dibe ku di van nûçeyan de pirsgirêk tune ye. Lê bi ya min gotina "welatiyê ku nahêle zarok…" pir girîng e. Ev di rastiyê de eşkerekirina têgîhanekê ye. Em dikarin bi awayekî din li ser kiryara wê jinê nîqaş bikin. Bêguman tiştekî baş kiriye û nehiştiye ku zarok zererê bide xwe. Belku bi rastî jî şêniyeke taxê ye. Lê ya girîng ew e jina ku

dixwaze zarok asê bike wek welatî û zarok jî wek sûcdarekî potansîyel û cinawir tê dîtin. Li paş her tiştî ku em ji destpêkê heta niha dipeyvin ev cihêkarî heye. Tevahiya kesên ku axivîn qala vê kir û divê çapemeniya ku ez jî parçeyekî wê me fêm bike. Çi eger wî zarokî 12 salî derdixe pêş panzerê mezin ku dikare ava bişid bipijqîne an jî bombeyên gazê biavêje? Heta ku em vê yekê fêm nekin ne mumkun e ku em zarokan biparêzin û rewşa wan baş bikin.

Par ji weşanên Metîsê pirtûkeke bi navê "Mîna Ku Tu Dizanî Nîn E" derket. Dibe ku we xwendibe. Li ser zarokên salên 1990'an ên li deverên Kurdan qala gelek tiştên giran hatine gotin. Tê hevokeke wisa derbas dibe ku min qet ji bîr nekir. Yekî ku îro sîh salî ye wiha digot: Kesên ku bi ecela xwe dimirin gelek xerîb tê jî me re. Di wê pirtûkê de qala hevalên wî yên ku pê li mayînan kirine û mirine, windahiyên malbata wî, kesên ku ji hêla Hîzbullah ve hatine kuştin, êrişên tîmên taybet ên li ser malan, şkenceyên ku bi wî hatine kirin, rewşa girtîgehan û tiştên din ên giran hatine kirin. Lê belê di van hemûyan du tişt hevpar bûn: Ya ewil ev bû ku mirov bi rêya jibîrkirinê dijîn. Wan digot ku "Eger em bînin bîra xwe, nikarin bidomînin." Ya duyem jî ew bû ku her kes digel her tiştî qala aştiyê dikir.

Min wek dewama vê pirtûkê, pirtûka Müge Tuzcuoğlu ya bi navê "Ez Kevirek Im" di hişê xwe de bi cih kir. Eger pirtûka "Mîna Ku Tu Dizanî Nîn E" qala salên 1990'an bike, ev pirtûk jî qala salên 2000'an dike. Müge Tuzcuoğlu ku jineke genc e, dema ku di rojnameya Evrenselê de rojnamegerî kiriye Uğur Kaymaz hatiye kuştin û wê nûçeya kuştina Uğur Kaymaz kiriye û xwestiye tenê bi nivîsandina vê nûçeyê nemîne. Wê antropolojî xwendiye. Piştî vê bûyerê ji bo Amedê bilêteke yek alî dikire. Ew bi 13 "zarokên ku kevir avêtine" re ango bi 13 zarokên ku mexdûrên TMK'yö ne, re axiviye. Di van hevdîtinan de tiştek bala wê kişandiye: Zarokan gava ku qala çîrokên malbatên xwe gotine dema boriya têdayî bi kar aniye. Ne mumkun e ku şewitandina gundê wan were bîra wan. Lewre ew wê demê yek an du salî bûn. Lê belê wan ewqas guhdarî kirine ku mîna ew bi çavên xwe şewitandina gundê xwe dîtibin kitkiteyên biçûk jî tê bîra wan. Ji pirtûka "Di Salên 1990'an De Zarok Bûn" cihêtir mijareke din heye ku divê em li ser bifikirin: Zarok bêyî ku ji bîr bikin dijîn. Zarok êş û derbederiya sê nifşan di nav xwe dehewînin û ji zarokên salên 1990'an cihêtir hêrsa xwe diparêzin.

Ev hemû jî ji ber ku gundên wan hatiye şewitandin koç kirine hatine navenda Amedê. Di ser van çîrokan li qay hejariyeke gelek giran hatine. Qala îş û karên xwe kirin. Em bêtir li ser wan kesên ku di pevçûnan de hatine kuştin agahdar in, dema ku hejmar tên dayîn bêtir ew tên bîra me. Lê di wê pêvajoyê de kesên ku nexweş in, hene û kesên ji ji ber keserê mirine hene. Wisa bi kerb qala wan dikin ku… Zanyariyên sê nifşan ku wan ji malbatên xwe girtine bi xwe re bar dikin. Her wisa diyardeyeke bi navê înternetê heye. Ev yek divê biçûk neyê dîtin. Wek mînak li Qilabanê tenê dikanek, qada goga pê ya bi xalîçe û înternetkafeyek heye. Ji xeynî van tiştekî din tune ye. Ev yek ji bo gelek gundên deverên Kurdan derbas dibe. Êdî diyardeyên bi navê Facebook û Twîtter hene. Ango ew tenê bar û hêrsa malbatên xwe ranahêjin. Bi van rêbazên nû ew hêrs û kerba hemû zarok û malbatên ku pê re dikevin têkîliyê radihêjin. Bi ya min divê bi hûrbînî bi mexdûrên TMK'yö û kesên ku dê bibin mexdûrê vê zagonê mijûl bin. Ev yek ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd ku pirsgirêka ewil a Tirkiyê ye, xala herî bingehîn e. Bi rastî jî zarokên salên 2000'an nifşa girîng e. Heta ku em van zarokan fêm nekin, heta ku em nizanin bê ka ev zarok çima kevir diavêjin, çima li ber panzeran radiwestin û çima xwe dişewitînin, ne mumkun e ku em bigihîjin encamekê.

Ez wekî şexs Müge Tuzcuoğlu nas nakim. Piştî ku ew kete girtîgehê, derheqê wê de min nivîsek nivîsand. Wê jî bi tesadufî nivîsa min xwendiye û ji min re nameyek nivîsandiye. Li ser ranzayekê ji min re qawîşê tarîf dike: Yek ji jinan ji ber ku di dest de kevir wêneyê wê hatiye kişandin, hatiye girtin. Ya rastî wê kevirek ji destê zarokek girtiye. Niha di doza KCK'yê de girtî ye. Her wisa qala xaltiyeke ku ji tevgera jinan e, dike. Wiha dibêje: "Ew jî li jêrê ji biraziyê xwe yê ku kevir avêtiye re name dinivîse." Qala serokşaredarên ku li kawîşa wê ne, dike. Dibêje "Ez gelek bi şens im, lewre bi tevî serokşaredaran radizim." Her wisa ji îfadeya xwe ya li dozgeriyê gotinek nivîsandiye. Dozger wiha gotiye: "Ez wek şexs dij li tund û tûjiyê me. Di civîneke ku hûn jî tev lê bûne de zarokek qala tund û tûjiyê kiriye. Divê we nehişta. Ji ber ku we hiştiye ev yek tê wê maneyê ku we tund û tûjî pejirandiye." Wê jî wiha gotiye:

“Çawa ku karê we hesab pirsîn e ji min, wek antropologek û rojnamegerek karê min jî fêmkirina wan zarokan e. Ez dixwazim hîn bim ka çi vê tund û tûjiyê pêk tîne.”

Wiha dawî li nameyê aniye: “Ji ber ku niha li vir gelek kes hene ez ji halê xwe bi gazinc nîn im. Lewre min pir guh da wan zarokan. Ez dizanim bê ka ew li girtîgehan li qay çi hatine û heta ku hatine girtîgehê li rastî çi hatine. Ji ber ku min pir guh da ka çi ew birine wê derê, niha bi halê xwe şaş namînim. Lewre zarokên min jî di wir re derbasbûn.”Ew ji zarokan re “zarokên min” dibêje. Her wisa wê gotiye “Eger firsenda we hebê ji zarokên min re silavan bikin”. Bi ya min ev der ji bo silavdana zarokan cihekî rast e.

**Mêvan**: Berî her tiştî ji gotarbêjan re spas dikim. Gelek tiştên hêja gotin. Lê dîsa jî min biborînin, zarokan tiştên herî hêja gotin. Ya rastî di serî de niqteyê danîn. Bêguman ji bo kesên fambar ev yek wisa ye. Ango bi rastî jî kesên ku bi tegîhana zarokan dizanin û bi zarokan re empatiyê dikin dê baştir fêm bikin. Yek ji hevalên me got ku hevdîtin li dewsa qereqolê li parkan çêbe dê baştir dibe. Bi ya min ev yek bi çavê zarokan giyanê peymana mafên zarokan eşkere dike. Tiştên ku yeko yek hatine gotin bêguman gelek binirx in, lê ez nêzîkî 11 sal in ku bi zarokan re him bi dil him jî bi awayekî profesyonel bi zarokan re dixebitim. Di nav van salan de gelek civîn û perwerdehî hwd. çêbûn ku ez tev lê nebûm. Ez bi tiştekî hesiyam, bi rastî jî tiştek meseleyê xirab dike û gelek caran jî em vê meseleyê nabînin. Peymana Mafên Zarokan, Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan ya rastî xîtabî saziyên ku mirov dixin navenda xwe, dikir. Sazî û civakeke ku dewletê dixe navenda xwe her çiqas Peymana Mafên Zarokan îmze bike jî ji wir mafên zarokan dernakeve. Min ev tişt dît û fêm kir. Gelo çima wisa ye? Lewre ev zagon hemû werin guhertin jî, gelek pispor bikevin nav pêvajoyê jî dema ku sazî dewlet be ev tev tên têk birin. Bêguman tiştên biçûk ên ku em ji bo guherandinê dikin tiştên binirx in. Lê divê ev tiştê ku ez dibêjim were eşkerekirin. Heta ku ev yek neyê eşkerekirin, ev têkoşîna me dê li qay kulekiyê were. Bêguman Komara Tirkiyê Peymana Mafên Zarokan îmze kir, lê dema ku xalên 17, 29, 30. derketin, eşkere bû ku çend xal nehatine qebûlkirin. Ango ji çilî zêdetir xal hatine pejirandin, lê sê xalên li ser etîka çandî nehatine pejirandin. Ev yek gelek girîng e. Lewre ev sê xal meseleyê deşîfre dike. Ev xal hemû bi pirsgirêka Kurd re peywendîdar in. Ev yek nîşan dide ku eger hewce be xalên din jî dê neyên bicihanîn. Ango dema ku ev şert tên danîn, dema ku mijar dewlet be mafê jiyanê jî tê binpêkirin û zarok jî dibe ku were kuştin. Ya rastî ez dixwazim vê ji Pınar Xanim û Yüce Beg bipirsim. Ya rastî eşkerekirina vê yekê pir girîng e û gelo ev deşîfre di çapemeniyê de çawa bi awayekî berdewam were kirin? Spas dikim.

**Nihat Tarımeri**
**Pisporê Xizmetguzariya Civakî**

Di destpêka xebata min a pirtûkê de ji bo kesên gihîştî gotineke wiha hebû: Kesên ku zarokatiya wan nayê bîra wan bila vê nexwînin. Ya girîng ev e. Ango çewtiya herî mezin ya mezinan ew e ku zarokatî û ciwantiya xwe ji bîr dikin. Qey hema di kêliyekê de mezin bûne. Eger em vê bînin bîra xwe em ê pirsgirêka zarokan û ciwanan kêmtir bikin. Her wisa dixwazim vê jî bibêjim, dema ku em li hiqûqa navnetewî dinihêrin, bi guherîna makezagonê ya piştî sala 2004'an, bi taybetî şertê civakî ya Ewrûpayê ji bo parastina zarok, jin û hema takekesan berpirsiyariyên mezin aniye. Ji vê hêlê ve tu cihêtiya welatiyekî Almanya û Tirkiyê qet tune ye. Dema ku di çarçoveya navnetewî de li meseleyê were nihêrin, xalên 13, 14, 16 û 17'an ên şertê civakî yên Ewrûpayê xwedî taybetmendiyên wisa ne ku piraniya pirsgirêkên ku me li vir gotine, çareser dikin. Berpirsiyariya gilîkirina yên ku van mafan bi cin naynin jî hatiye danîn. Li ser şêwaza bikaranîna mafan nêzîkatiyeke bingehîn heye. Bi ya min ji hêla maf û hiqûqa gerdûnî ve tu pirsgirêka me tune ye. Lê belê bi ya min ji bo bidestxistina maf û hiqûqa gerdûnî pirsgirêkên me hene.

**Yüce Yöney**
**Edîtorê Rojnameya Bianetê**

Eger formuleke ku were pêşniyarkirin hebe jî ez wê formulê çi mixabin nizanim. Lê belê divê em vê tespît bikin. Mîna gelek mijarên din, divê di vê mijarê de jî ji xeynî peywendiyên dewlet, çapemenî û bazarê qadên din jî hebin. Lewre dema ku navendên berjewindiyan, peywendiyên bazarê û dewlet hebin, dema ku sermayedarên çapemeniyê di kertên din de ji

dewletê îhale bigirin, dema ku ewqas berjewendiyên şexsî û berjewendiyên çînî hebin, ya rastî divê ji çapemeniyê zêde tişt neyê hêvîkirin.

Ya duyem jî ev e ku ji ber vê yekê divê alîkarî ji bo çapemeniya serbixwe were dayîn. Tenê çapemeniya serbixwe xwedî mekanîzma û têgihîştineke wisa ye ku dikare vê deşîfrasyonê bike. Lê belê ew jî di bin siya hin zagon, ceza û gefan de heyîna xwe didomînin. Lê digel vê jî gelek saziyên hêja hene ku dixebitin. Zêdebûna van dikare rêyeke veke. Bi baweriya min di vê rêyê de gelek tişt hatin kirin. Ya rastî digel ku nebes e jî gelek tişt hatin kirin.

Her wisa kesên ku di çapemeniyê de dixebitin wek şexs dikarin tiştekî bikin: Dikarin çavkaniyên bingehîn ên destnîşankirî bixwînin. Eger nûçegîhaniya zarokan were kirin, divê rêbazên taybet ên nûçegîhaniya zarokan were zanîn. Divê ji bo hînbûna van rêbazan hewl were dayîn. Ji bo parastina zarokan hin tişt dibe ku werin kirin. Rê û dirbên hevpeyvînên ku li gel zarokan tê kirin, h ene. Divê hevpeyvîn li gor wan rê û dirban werin kirin. Hevpeyvînên ku bi min re an jî bi yekî gihîştî re tên kirin tiştekî cihê ye. Di hevpeyvînên wisa de taybetmendî û rêbazên cihê hene ku divê mirov guh bide. Li gor şert û mercan di dema hevpeyvînê de dibe ku pêwîstî bi hin pisporan hebe… Lê li aliyekî din jî Tirkiyê şert daniye ser hin xalên Peymana Mafên Zarokan. Ji ber vê jî li Tirkiyê ji bo hînbûna van rê û rêbazên hevpeyvînan pêwîstî bi gelek hewldanan heye. Li ser vê yekê gelek çavkaniyên çapkirî û çavkaniyên li ser înternetê hene ku mirov bi hêsanî dikare bi dest bixe. Eger li ser zarokan nûçegîhanî were kirin an jî nûçegîhaniyeke rasteqîn were kirin, li derveyî peywendiyên sermayeyê nûçegîhanî were kirin lazim e mirov xwe bi taybetmendiyên pêwîst bixemlîne û pêş bixe. Bi tevî min ji bo her kesê ku di çapemeniyê de dixebitin ev yek pêwîst e. Ji bo ku sûdewar be dixwazim bêjim ku di malpera Bîanetê de li ser nûçegîhaniya maf, nûçegîhaniya zarok, nûçegîhaniya jin gelek xebatên kitekit hene, mirov dikare bi hesanî li ser înternetê bi dest bixe.

Ji bo cara dawîn jî dixwazim bêjim ku ji ber egerên ku min berê niha gotin divê mirov di vê rewşê de ji çapemeniya serdest tu xêr û bêrek hêvî neke. Wek şexs hin mirov hene ku di nav çapemeniya serdest de tiştên xweş dikin. Lê sînorên wan hene. Çapemeniya alternatîf gelek girîng e. Heta ku ji nav peywendiyên sermaye û bazarê dernekevin em ê gelek li ser van pirsgirêkan bipeyvin.

**Pinar Ogunc**
**Qunciknivîsa Rojnameya Radikalê**

Ez ê tenê tiştekî biçûk bi ser ve bikim. Lewre him tev li gotinên we dibim him jî Yüce jixwe mijarê berhev kir. Ez tev li wê dibim ku bi tevî guherînên zagonan ne mumkun e ku pirsgirêkek were çareserkirin. Ev yek di meseleya tund û tûjiya li hember jinan jî derdikeve pêşiya me. Hin zagon tên guhertin, lê jin dema ku ji qereqolê bi tevî polîsan vedigere malê û ji hêla polîsan ve jin bi mêrê xwe re tê aşkirin. Di rewşeke wisa de em sûdewariya zagonê nabînin. Meseleya me ew zemîna civakî ye ku wê pêk tîne. Di heman rewşê de jî ev ramyarî serdest e, girêdayî îradeya siyasî ye û mîna ku Yüce tarîf kir di nav wê sê goşeyê de hatiye sînorkirin, lê digel vê jî bêbandor nîn e. Qet nebe hin nakokiyên çapemeniya serdest eşkere dike. Hûn dikarin vê meseleyê bi çîrokeke zarokan an jî çîrokeke malbatan girê bidin û ji wir jî werin ser sê xalên ku şert li ser wan hatine danîn. Vê demê dîmena ku derdikeve dibe ku têgîhana ku jinê wek parçeyekî malbatê dibîne û zarok jî bi awayekî potansiyel sûcdar dibîne, eşkere bike. Bandora vê çiqas e, ez ya rastî nizanim. Lê mirov wexta ku bizane ku ne tenê ye û mirovên wisa hene ku ji bo vê yekê dixebitin, nûçeyeke biçûk a di nav çapemeniya serdest de jî dibe ku bigihîje armanca xwe. Qet nebe ez dixwazim wisa bawer bikim. Naxwe ji bo karê ku ez dikim divê baweriya min qet tune be.

**Mêvan**: Ya rastî hinek jî bingeheke wê ya psîkolojîk heye. Wek mînak dema ku em ji Qereçiyek dipirsin bê ka çima didize ew bêje ku malê dinyayê hevpar e û ew vê yekê ji xwe re wek mafek dibîne. Yan jî hûn dema ku vê pirsê ji yekî wisa ku girêdayî toreyan e, bikin ew ê bêje ku ew tiştê ku ji hêla kesekî din an jî ji hêla civakê wek sûc tê dîtin, wek tiştekî toreyî an jî wek tiştekî peywir be, bi cih tîne. Ango bingeheke wê ya civakî heye. Eger em vê rastiyê bidin aliyekî û li ser aliyê wê yê polîtîk rawestin mîna ku xanima hêja got ev pirsgirêk zagon û

yasayan nayê çareserkirin. Ango ev pirsgirêk incex bi civakê çareser dibe. Dema ku em aliyên aborî û polîtîk ên vê meseleyê dinihêrin nûçeyên manşetî him ji ber koçberî him jî ji ber guherandina cih pêk tên. Yên polîtîk jî ev in. Li cihên ku koçber diçin dewletan hemû karên xwe yên qirêj bi wan didin kirin. Di fîlmên Amerîkan de em dibînin, bi gefa dersînorkirinê her tiştî bi wan didin kirin. Her wisa em tiştên wisa li Tirkiyê jî bi awayekî din dibînin. Di çapemenî û organên weşanê de jî tê dîtin ku dewlet karên xwe yên qirêj bi koçberên ku ji deverên dûr tên, dide kirin. Ji ber vê jî ez bawer nakim ku ev mesele bi rêya zagonan were çareserkirin. Bêguman dibe ku hinek pêximker bin, lê bi ya min dewlet eger bi awayekî sosyolojîk guh bide exlaq, tore û nirxên civakê û bi vî şiklî bixebite dikare bigihîje encamekê. Wek mînak Qereçiyê ku li vî bajarî dizitiyê dike li Dêrsimê dizitiyê nake. Gelek ecêb e, ew jî mîna kesên din debara xwe dike. Bi ya min ev diyarde girêdayî wan bêterazî û bêedaletiya navcivakî ye.

**E.B. (16 Salî)**: Ramaneke min heye. Madem ku ji me re maf hatine dayîn û dewletan jî ev maf pejirandine, ev maf çima nayên bicihanîn an jî ev çima heta radeyekê tên bicihanîn? Lewre em hemûyan di bernameyên nûçeyê yên televîzyonan de û di rojnameyan de dibînin. Zarok rasterast ji bo dadgehan tên veguhastin û ji wir jî wan dibin girtîgehan. Ma yek ji mafên me jî ne ew e ku ceza divê ji bo sûdewariya zarokan were dayîn? Yan jî divê tu zarokek neyê şkencekirin an jî li rastî miameleyeke zalimane û nemirovî û cezayî neyê. Ev yek ji mafên me ye, lê çima em li rastî bûyerên ku di televîzyon û nûçeyan de tên nîşandan, tên? Zarokekî biçûk li girtîgehê tê tecawizkirin, psîkolojiya wê têk diçe û ji bo vê jî tu tişt nayê kirin, heta ji malbata xwe jî tê dûrxistin. Gelo ev bi ya we tiştekî adil e? Mafek ji mirovan re hatiye dayîn. Gelo çima ev maf nayê bicinanîn? Ez ji her kesî dipirsim. Ji bo cara dawîn jî dixwazim pirsekê bikim. Ger şaş nebim peymanek heye ku ji hêla 147 dewletan ve hatiye qebûlkirin û vê devletê sê xalên vê peymanê qebûl nekirine. Ev xal çima nayên qebûlkirin? Ger şaş nebim ev xalên 17, 29 û 30 bûn.

**D.A. (16 Salî)**: Ez ê pirsekê bikim û paşê jî serpêhatiyeke xwe ji we re bibêjim. Gelo mafê lêdanê ya polîsan heye? Se sal berê kekekî min ê 18 salî ji min re gotibû ku polîs tim bi cop lê didin. Em jî pênc kes bûn û digeriyan. Di nav wan de tenê ez Kurd bûm. Hevalên min ên din tu cihêkarî nedikir, heta min Kurdî hînî wan kiribû. Em tev bi hev re bi Kurdî dipeyvîn, lê ew Tirk bûn. Min ca nihêrî polîsek ji paş ve hat, ez jî reviyam. Ji min wetrî çawa ku ji min re hatibû gotin dê li min bixistaya. Paşê polîs em girtin û ji me pirsîn bê ka em çima ji polîsan reviyane. Min jî ji wan re got ku ez tirsiyam. Wexta ku ji min pirsîn bê ka çima ez tirsiyama, min jî ji wan re mesele got. Wan nasnameyên me ji me xwestin, me jî dan. Nasnameyên hevalên din dan, lê ya min nedan. Li ser nasnameya min de Îdir nivîsîbû. Wan fêm kir ku ez Kurd im û ji min pirsîn bê ka çima ez reviyame. Min jî dîsa mesele got. Tu sûcekî min tune ye, lê ew dixwazin min sûcdar bikin. Yekî got ez ê te bi terorîstiyê sûcdar bikim û te bibim merkezê û paşê li dev û pozê min xist. Lêva min xwîn bû. Paşê çû. Ez meraq dikim bê ka mafê lêdanê ya polîs heye yan na.

**Mêvan:** Pirsa min hinek dirêj e. Ez dixwazim li ser meseleya N.Ç.yê ji Ayşenûr Xanim pirsekê bikim. N.Ç. ji hêla 26 kesan ve hate tecawizkirin, lê dîsa jî hakim N.Ç. bixwe sûcdar kir. Hûn li ser vê çi difikirin? Her wisa dixwazim ji Serra Xanim pirsekê bikim. Piştî vê biryarê N.Ç. çawa dikare tev li civakê bibe?

**Mêvan:** Ez dixwazim pirsekê bikim. Çima ewil mafê pirsê we da mezinên me û kesên gihîştî?

**Gülnur Elçik**
**Moderator**

Li gor rêza rakirina destan min mafê pirsê da. Ez carna tiştekî wiha dibînim. Bi ya min em carna hin kom û mijaran dikin hêmayên nostaljiyê. Ev jî bi ya min cureyekî oryantalîzm e. Bi ya min gotarên ku li vir hatin pêşkêşkirin bi qasî gotinên zarokan hêja ne. Ji ber vê jî di rewşeke wiha de bêguman divê pêşekî ji bo kesên ku muxatabên yekem ên bûyerê ne, were dayîn. Min mafê pirsê da kesên ku ewil destê xwe rakir. Çawa bêjim nizanim. Ez qala rewşa ku ez tê de ji we re bikim. Wêjevanek, romannûsek. Eger hûn bi wêjeyê re mijûl bin û perdeya ku li ser wê berhemê ye bidin aliyekî hûn ê bibînin ku ew roman, ne romaneke baş e. Ev jî bi ya min cureyeke oryantalîzmê ye. Lewrê hûn ji yekî hêvî nakin ku berhemekê biafirîne û dema ku ew kes tiştekî biafirîne hûn wê berhemê dinepixînin. Ev yek jî oryantalîzmeke berevajî ye. Ji ber vê jî li vir naxwazim vê yekê bikim. Jixwe ji ber ku em girîngî didene şahidiyan em pêşekiyê didine zarokan. Lê dema ku pirs hatin kirin, min mafê pirsê li gor rêza destrakirinê da. Gelek spas ku te rê ji bo vê vekir ez vê bibêjim.

**Mêvan**: Du pirsên min hene. We qala wan zarokan kir ku ji malbatên xwe hatine qetandin. Ev zarok li cihên çawa tên hewandin? Gelo ew di ewlekariyê de ne? Ez dixwazim vê hîn bim. Di nav axaftinan de hate gotin ku ji bo zarokên 7 heta 12 salî hin bisînorkirin hene û di van bisînorkirinan de pîvan çi ne? Kê van sînorkirinan pêk tînin û çima ev bisînorkirin tên pêkanîn?

**Mêvan**: Ez ji KAY-DER'ê tev lê dibim. Min di sala 1968'an de dibistan seretayî qedand û ji bo herim dibistana navendî hatim li Stenbolê bi cih bûm. Wê demê di destê lêzimekî xwe de pirtûya Çetîn Altan ya bi navê “Bir Kirk Beşlîk Ahmet” dît. Ji aliyekî ve dihat gotin ku li Vîetnam û Kamboçyayê zarokên 13, 14, 15 salî di dest de çek şer dikin û tên kuştin. Ji aliyê din ve jî qala zarokên welatê me dihat kirin. Ez dixwazim bi qasî ku di bîra min maye qala beşa li ser zarokên me bikim. Axaftinek li ser roja 13'ê Nîsanê heye. Hîn 23 roj mane ji bo 23'ê Nîsanê. İro salvegera damezrandina Meclîsa Tirkiyê ye, îro cejna serwerî û zarokan e. Şa bin zarokên min, şa bin, bikenin, bilîzin, bibezin, biqîrin. Eger ku hûn dikarin biqîrin, diyar e hûn li welatekî serwer de azad û dilşad in. Ma bavê we li qata pêncan di pişt de tenekeya tijî bi xerc dixebite an jî li îskeleya seyareyan, li qiraxa riyan camên seyareyan paqij dikin? Eger ku we di nav wan seyareyan de zarokên ku cil û bergên xweşik li xwe kirine û porên xwe şeh kirine bibînin, qet axîn ranehijin. Lewre rahiştina axînek sosyalîzm û rahiştina du axîn jî komunîstî ye, rahiştina sê axîn anarşîstî ye, rahiştina çar axîn sîxuriya Rusan û Pekîn e. Kêf bikin zarokên min, bikenin, bilîzin, bibezin, biqîrin. Eger ku hûn dikarin biqîrin, diyar e hûn li welatekî serwer de azad û dilşad in. Ez dixwazim vê bibêjim, wê demê me di qata pêncan de xerc di pişta xwe dibir û ew zarok jî ji bo alîkariya bav û malbata xwe dixebitîn. Lê niha bavê wan zarokan, ango zarokên niha bêkar in û zarok bixwa jî niha li îskeleyên seyareyan de, li ser riyan camên seyareyan qaqij dikin û destmal difroşin. Ez wek şexs dema ku camên seyareya min paqij dikin aciz nabim. Ez camên seyareya xwe bi wan didim paqijkirin û ji wan destmalên kaxiz dikirim. Lê di rojname û televîzyonan de tê gotin ku seyareyên xwe bi wan neden paqijkirin, ji wan destmal nekirin, lewre eger hûn bikirin hûn ê wan ber bi sûckirinê dehf bidin. Em ji wan destmal bikirin yan na? Ez ji we dipirsim.

**Mêvan**: Ez jî dixwazim tiştekî bi ser ve bikim, lê ne ji bo pirsê. Berî her tiştî ji bo wan kesên ku di vê projeyê de xebitîne û ji bo rêvebir û xebatkarên Weqfa Çand û Hunerê ya Başak û ÇAÇA'yê spas dikim. Her wisa panelîst û hevalên beşdar re jî spas dikim. Belê mijareke pir hesas e û divê mirov bi dûr û dirêjî pê mijûl be. Lê gelek caran jî ev mijar tê piştguhkirin. Wek mînak dema ku min çîrok û serpêhatiyên zarokên li girtîgeha Pozantiyê di rojnameyê de dît, min hema nexwendibû. Min çavê xwe revandibû û kêliyek ez fikirîbûm ka ez bixwînim an na. Paşê min di dilê xwe got ku eger ku ez tehamûl nakim ku vê nûçeyê bixwînim, baş e gelo zarokan çawa tehamûl kir. Wexta ku min ev bûyer ji hevalekî xwe re got, wî wiha got: “Ji min qala van neqe, ez naxwazim bibihîsim.” Ez jî vê ji we dipirsim: Em ê heta kengê guh û çavê xwe li van bûyeran bigirin? Ma gelo divê em wiha bikin? Berevajî eger em çav û guhê xwe vekin û van rastiyan nîqaş bikin û van bûyeran bînin rojevê, wê demê ev bûyer jî ewqas kêm bin. Spas.

**Mêvan**: Ez tiştekî meraq dikim. Piştî ku zarok tên girtin, ango beriya ku derkevin dadgehê dema ku diçin tendirustiya edlî di bin çavdêriya doktoran de diçin an tenê ji hêla hêzên ewlekariyê ve tên birin? Li ser mafên zarokan em hemû jî nîqaş dikin, lê em vê heta çi radeyê ji zarokan re dibêjin? An jî heta çi radeyê em zarokan dixin nav vê pêvajoyê? Lewre qey tiştek kêm dimîne. Zarok wek sernav dizanin ku mafên zarokan hene, lê heta çi radeyê naveroka van mafan dizanin? Ez vê meraq dikim.

**Mêvan**: Ez jî vê meraq dikim: Nihêrîna malbatê ya li sûc û nihêrîna zarok a li sûc eynî ne an na? Ango we di vê xebatê de cih da malbatê?

**Mêvan**: Em jî wek GOÇ-DER ji kevn de bi zarokên ku bi zorê koç kirine dixebitin. Lê belê rewşeke wiha jî heye ku qada zarokên ku bi zorê hatine koçkirin qadeke zor e û ji ber vê jî incex hin weqfên civaka sîvîl dikarin vê pirsgirêkê çareser bikin. Lewre ev pirsgirêk bi qasî ku ew çareser bikin ne pirsgirêkeke biçûk e. Yên ku ev pirsgirêk pêkanîne, dewlet ji hêla zagonî ve divê berpirsiyariyê hilde ser xwe û vê pirsgirêkê çareser bike. Ji ber vê jî ya ku ev pirsgirêk pêkaniye ew bixwe ye. Bi ya min çareserkirina hemû neheqiyên ku heta niha hatine kirin di bin berpirsiyariya dewletê de ye. Ji ber vê jî ev pirsgirêk, ango pirsgirêka zarokan di berpirsiyariya dewletê de ye û di çarçoveya pirsgirêka Kurd de çareser dibe. Rast e, em di panel û çalakiyên din de van pirsgirêkan dibêjin, lê divê em di çarçoveyeke fireh de li meseleyê binihêrin. Em niha li ser zarokên ku kevir diavêjin, dipeyvin. Lê heta ku ev pirsgirêk neyê çareserkirin em ê li ser vê meseleyê bipeyvin. Lewre pirsgirêka bingehîn çaresernekirina pirsgirêka polîtîk e. Ji ber vê jî berê niha hevalekê got ku em bawer nakin ku bi guherîna zagonan ev pirsgirêk were çareserkirin. Lê ez tev li gotina wê nabim. Lewre di vê sedsalê de divê pirsgirêk bêtir di çarçoveya zagonî de were çareserkirin. Lewre dema ku hûn tiştekî qebûl dikin dikevin bin berpirsiyariyekê û divê bi vê berpirsiyariyê xebat were kirin.

**Mêvan**: Ez ê tu pirsekê nekim. Tenê dixwazim tiştekî bi ser ve bikim. Bi hizra min egerên ku zarok ber bi sûckirinê dehf didin malbat û derûdor e. Min xwest ez vê bibêjim. Her wisa dema ku zarokek kevir biavêjê, sûcekî din bike an jî ber bi sûckirinê were dehfdan, beriya ku em wî/ê zarokî/ê darizînin divê em egerên sûckirina wî/ê hîn bin. Zarok çima kevir diavêje. Divê ewil em vê yekê hîn bin paşê em zarok darizînin.

**M.A. (14 Salî):** Ez dixwazim vê bibêjim: Pınar Öğünç dema ku axivî qey wiha got: Polîs ji bo ku bi zarokan re peywendiyeke nêzik dayne diçin parkan, qadên lîstikan, seyrangeh û derên wisa. Ez meraq dikim ka ev yek heta çi radeyê tê kirin û çiqas bikêr e? Her wisa dixwazim vê jî bi ser ve bikim. Xaleke Peymana Mafên Zarokan dibêje ku hepskirina zarokan divê riya herî dawîn be. Li gor we ma tiştekî rast e ku civaka Tirkiyê tiştekî wiha bike.

**Mêvan**: Merheba. Navê min Meltem Turkcan e. Ez pispora xizmetguzariya civakî me. Li Edliyeya Stenbolê di Dadgeha Cezaya Giran a Zarokan a Yekem de wek pispor dixebitim. Ev neh meh in di ewlekariyê de dixebitim. Ya rastî Ayşegul Xanim bi awayekî xweş û bi kurtî rewşa giştî ya edliyeyan vegot. Lê dema ku em hinek difikirin bê ka çima rewşa me wisa ye, em pêgirtîbûnê dibînin. Amirê min ê sicîlê dibe serokê dadgehê. Di dema darizandinê de dema ku ez li ser zarokê ku ber bi sûckirinê hatiye dehftan an jî li ser kesê mexdûr tiştekî dibêjim carna bersiveke tund dikare bide min. Di vê rewşê de çi mixabin em wek parêzerê mexdûr an jî parêzerê gumanbar nayên piştgirîkirin. Ez dixwazim bêjim ku agadariya min a li ser zagonan pir tune ye lê ez bawer dikim rêbaza bêsûcbûnê di makezagonê de derbas dibe. Zarokê ku hê hukim negirtiye wek sûcdar tê binavkirin. Di dema darizandinê de ez bêtir alîgirê mexdûr im, ango em bêtir ji bo kesên mexdûr di pêvajoya darizandinê de cih digirin. Carekê ji ber ku min dizanî gumanbar nerehet bû, min jê re got ku tu dikarî rûnî. Lê serokê rûniştinê ji min re got ku tu selahiyeteke min a wisa tune ye. Wî got ku ew sûcdar e, tu nikarî tiştekî wisa daxwaz bikî. Ji xeynî vê mijara me zarok, koç û sûc e. Koçberî bi tena serê xwe pirsgirêkeke civakî ye. Ew lêkolînên ku min li ser vê pirsgirêkê kirine, mîna ku Ayşegul Xanim jî got em di dadgehê de

pêşkêş dikin. Dema ku ez bi tevî koçberiyê ku pirsgirêkeke civakî ye, li kategorîzasyona sûc dinihêrim ez dibînim ku sûcên cinsî di her astên sosyo-aborî de tê dîtin. Lê sûcên aborî yên mîna xesp, dizitî, talan û bazirganiyê maddeyên tevzîner bêtir ji hêla zarokên ku ji malbatên parçebûyî ya koçkirî ne, tên kirin. Bêtir jî min dît ku diyardeya koçberiyê di nav malbatê de heye. Ez hinek bi heyecan im, naxwe min dixwest gelek tiştên din bigotana.

**Mêvan**: Ez dixwazim pirsekê ji Serra Xanim bikim. Me qala têgîhana sûc, bi taybetî jî têgîhana zarokan a li ser sûc kir. Ji aliyekî ve bi rêya zarokan dixwazin sûc meşrû bikin û baweriya ku bi sîstemê heye xurttir bikin. Dema ku em dibînin digel ku sûc tê kirin û bi tu awayî nayê cezakirin, zarok jî nizanin ka sûc çi ye, heta tund û tûjiyê jî wek sûc nabînin. Di lêkolîna Sedat Karcioğlu de jî tiştekî wiha hebû. Ya rastî tiştekî pir balkêş bû. Di wê lêkolînê de di hevdîtinên ku bi zarokên mexdûrê Zagona Têkoşîna Dij Li Terorê re hatine kirin de zarokek wiha dibêje: Ew bi gelek panzeran tê, ma min du kevir avêtine çi bûye? Ma ev sûc e? Ev tiştekî pir balkêş e. Li vir dixwazim ji Serrayê bipirsim, zarokek ku bi vê têgîhanê mezin dibe çawa baweriya xwe bi dewleta ku em ji ber van pirsgirêkan berpirsiyar digirin, bîne? Piştî ku ewqas tişt tê serê zarokan, ma zarok çawa baweriya xwe bi hêzên ewlekariya dewletê û dewletê bi xwe bînin? Spas dikim.

**Mêvan**: Ez dixwazim tiştekî bipirsim. Ji bo zarokan bikaranîna peyva sûcdar çiqas rast e û çiqas çewt e? Çima li gor kesan, ango li gor kesên xwedî biryar temen û sûcê zarok diguhere?

**E.B. (16 Salî)**: Ez dixwazim du pirsên din bi ser ve bikim. Ez dixwazim ji Ayşenûr Xanim bipirsim. Kê sûc destnîşan dike û li gor çi tê destnîşankirin? Kesê ku bixwaze dikare pirsa min a duyem bibersivîne. Madem zarok dikevin hepsê, li dadgehan tên darizandin, em çima wan wek zarok qebûl dikin? Ma malbata me ne berpirsiyar e ku li me xwedî derkeve. Lê çawa ku mirovên çil an jî şêst salî darizînin dikarin min jî darizînin. Çima tiştekî wisa heye? Wê demê em ne zarok in.

**PINAR ÖGÜNÇ**
**Qunciknivîsa Rojnameya Radikalê**

Bersiva hin pirsan dikeve para min û çend pirs jî rasterast ji min hatin kirin. Ez bersiva wan bidim. Dema ku hûn dipeyvîn me navê E. dizanî. Lewre sibê me hevûdu nas kiribû. Di rojên 23'yê Nîsanê zarok li kursiyên serokwezîr, serokê parlamento û walî tên rûniştandin û bi wan gotarên diyarkirî tên jiberkirin û xwendin. Vêca eger ku zarok hatibin bikaranîn, bi ya min ew zarok, ango zarokên 23'yê Nîsanê hatin bikaranîn. Ez pir dixwazim ku hûn jî li ser wan kursiyan rûnin û bi vî awayî pirsên xwe yên zelal bikin. D. tu pir bi zelalî pirs dikî: Ma mafê polîsan heye ku li min bidin? Na. Pirs çawa ku zelal e, bersiva vê pirsê jî zelal e. E. tu dipirsî û dibêjî peymaneke navnetewî heye ku hatiye îmzekirin, lê çima sê xalên vê peymanê nayên bicihanîn. Ev, pirseke pir zelal e. Dema ku zarokek derkeve pêş îradeya siyasî û bi vî şiklî pirsên zelal bike ne mumkun e ku bersiveke gilover were dayîn. Lê ez nizanim ka ew mekanîzma çawa kar dike. Ango di rojên 23'yê Nîsan de ew zarok çawa xwe li ser wan kursiyan dibînin. M. jî got ku rêbazên ku rêveberiyên ewlekariyê ji bo ku bi zarokan re peywendî daynin hilbijartine, çiqas bikêr in û çiqas tên kirin. Carna, dema ku tê bîra wan ew karên wisa dikin. Dema ku ew bi zarokan re peywendî daynin û vê peywendiyê di ser çapemeniyê re rabigihînin, prestîja wan qewî dibe. Loma tiştên wisa dikin. Em bi deng bifikirin, di hin xwepêşandanên civakî de zarokan mîna ku fikrên xwe bêjin, bi kevir avêtinê fikrên xwe derdibirin. Zarokên wisa hene. Hûn van zarokan dibin û bi wan re bowlîng dilîzin, wan dibin navendên mezin ên firoşgehan. Ev çiqas bikêr tê? Ev cure rê û dirbên peywendîdanînê ewqas sosret in ku ne mumkun e em bibînin ka ev hewl bi kêr tên an na. Dema ku rêvebirên ewlekariyê ji bo ku bi zarokan re peywendî daynin maç dikin, mûz belav dikin û çalakiyên din li dar dixin, zarok bêguman ji ber vê kêfxweş dibin. Lewre wan bi rêya kamerayên mobeseyê bajar nedîtiye yan jî ew berê neçûne navendên firoşgehan. Bêguman

zarok ji ber vê kêfxweş dibin. Jixwe di nûçeyan de ev taybetmendî bêtir tê nîşandan. Lê mesele ev e ku ev kar ji bo çareseriyê çiqas bikêr e. Eger sûdewar bûya divê me careke din nedîta ku zarok di nav xwepêşandanan de cih bigirin. Eger zarok di van xwepêşandanan de hebin diyar e ev kar bikêr nîn in. Hevalêk di çarçoveya hiqûqî de li ser meseleya N.Ç. pirsek kiribû û gotibû N.Ç. çawa dikare tev li civakê bibe. Ez dixwazim agahiyeke wisa bidim ku carna bûyerên xirab sebr û hêzên mezin didin me. Ez N.Ç. nas dikim û dizanim ka ew çi rojên xirab derbas kirine. Lê N.Ç. niha 19 salî ye û jineke pir bi hêz e. Hêz di rewşên wiha de wisa dike ku em li ser piyan bimînin. Şanseke wê jî hebû, mîrovên ku lê rast hatin piştgiriya wê kir û wê ji xwe re jiyaneke nû ava kir. Ev yek ez dibêjim hinek girêdayî sebr û înyadiyê ye. Ev tiştên ku hatin gotin çîrokek anî bîra min, ez dixwazim wê ji we re bêjim. Ev çîrok di rastî de li ser zêna zarokên ku bi sû re tên têkîldarkirin û li ser rêbazên peywendîdanîna bi wan re mînakeke xweş e. Jonathan Swift di sala 1729'an de gotarek nivîsandiye. Di wexta xwe de ev gotar wek mînaka herî xweş a mîzaha reş dihat dayîn. Di dema xwe de pir girîngî pê hatiye dayîn. Lewre Jonathan Swîft bi devê aborînasekî li ser çareseriya hejariya li Îrlandayê tiştna gotiye. Ew dibêje ku malbatên hejar bila zarokên xwe bixwin. Bi vî awayî malbat dikarin maliyeta zarokên xwe bi dest bixin. Ev pêşniyareke absurd e. lê bêle ev pêşniyar ji hin kesan re tiştekî dibêje. Dibêje ku ramana we ya ji bo çareserkirina hejariyê mîna pêşniyara xwarina zarokan e û bi vî awayî qerfa xwe pê bike. Vêca piştî hemû axaftina dîmeneke wisa li ber çavê min xuya bû. Dema ku min dest bi axaftinê kir min qala bûyera dibistana Amadeyiya Erziromê kiribû. Mêrik gotibû ku "Zarokên ku dê ji welêt û gel re sûdewar nebê û xwedî potansiyela sûckirinê ne beriya ku bi meşê kevin ji holê rakin." Ev gotineke rastî ye û li gel vê jî gotareke absûrd û razber a ku di salên 1700'an de hatiye nivîsandin heye. Hema bêje herdu jî eynî tiştî pêşniyar dike. Rêbaza ku niha ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd hatiye hilbijartin bi ya min eynî tişt e, ango xwarina wan zarokan e. Rêbazên cihê yên xwarina zarokan hene. Jonathan Swift meseleyê dinepixand û tarîfên xwarinan dida. Jixwe gotara wî deng veda. Her wisa rêbazên din ên xwarina zarokan hene. Hûn dikarin wan darizînin, bi sûcên cihê sûcdar bikin û li girtîgehê miameleya xirab li wan bikin. Zarokatî pêvajoyek e û mirov wek zarok bikevin girtîgehan jî wek mirovên gihîştî yên sûcdar derkevin. Niha bi min wisa tê ku rêbazên dewletê li ser xwarina zarokan ava dibin. Gotaran ev anî bîra min, min xwest ez bi wer parve bikim.

**Abdulkadir Güger**

**Rêvebirê Şubeya Xizmetguzariya Zarok û Kreşê ya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê**

Di eslê xwe de ji ber ku rasterast pirsek ji min re nehat ez dixwazim bibîrxistinekê bikim. Belê, mafên polîsan ên ku li zarokan bixin û mafê wan ê jiyanê binpê bikin qet tune ne û heta mafekî wisa yê dewlet an jî hikumetan jî tune ye, lê ji lêxistin zêdetir em bi zarokên ku mafên wan ên jiyanê ji wan hatine stendin re dijîn an jî dixebitin. Di herî dawî de piraniya kesên ku di bûyera Roboskê de jiyana xwe ji dest dan zarok bûn. Beriya wê em li rastî dîmenên di 23'ê Nîsanê de ji bilî zarokên li ser paldankan dihatin rûniştandin bên, em li rastî dîmenên zarokên ku bi qûndaxan serê wan hatin parçekirin jî bûn. Em bûn şahidê zarokên ku qandî salên temenê xwe bi fîşekan hatin înfazkirin jî. Di eslê xwe de em pêvajoyên gelek giran dijîn, yanî hem wek civak û hem jî wek zarok em pêvajoyên pir giran dijîn. Em ê wisa nikaribin nifşên bitendurist bigihînin, yanî bi vî awayî ew ê wisa neçe. Ji hin ciyan bi pînekirinê sererastkirina vî karî, dê zêdetir bibe sedema pirsgirêkên mezintir. Gotineke psîkîyatrîstekî heye, William Reich dibêje, "ez bi dizîkirina mirovan mat nabim, ez mat dimînim çima bêhtir nadizin." Di eslê xwe de di binyatê de ev heye. Ji bo ku pêdiviyên bingehîn pêk bînin, yanî zarokek bi şidetê mezin bibe şidetê fêr dibe, hêrsê fêr dibe. Zarokên ku di girtîgehan de bi şidetê re mezin dibin teqez dê ji wir baş dernekevin an jî piştî ku derketin dê li dewletê yan jî rêvebiran pir baş nenêrin. Ez ê bîranîneke xwe ya kurt a berî niha 10-12 sal berê bi zarokekî 8 salî re ji we re vebêjim. Ez di saziyekê de dixebitim û em tê dixebitin ku zarokan bigirin saziyê, ji bo ku em bikarin bi zarokan re bixebitin em dixwazin wan bigirin. Zarok ji derê saziyê nediketin hundir, demeke gelek dirêj neketin hundir. Demekê li baxçe me bi zarokan xebat meşandin. Piştre bi tiştên wek

kek, ava fêkiyan me ew xapandin û hêdî hêdî kişandin hundirê saziyê. Ev zarokên bê nasname bûn, yanî zarokên heta nasnameya wan jî tune bû. Şêniyên taxa ku ez lê dixebitîm bi darê zorê ji warê xwe hatibûn koçberkirin. Yanî xaniyên wan tev hatibûn xerakirin û şewitandin, tevî zarokên xwe bi lingê xwasî, di berf û seqemê de 15-20 km rê meşiyane û hatine di taxê de bi cî bûne. Yek ji zarokan got, mamoste ji ber wî wêneyê li ser deriyê we em nediketin hundir: Ji ber ku heman wêne bi kesên ku malên me şewitandin û li malbatên me şidetê kirin re jî hebû. Zarok behsa ala tirkan dikir. Êdî şidetê ew qas bi sembolan re kiriye yek ku, nema baweriya xwe bi tiştên ku bi wê ve eleqedar in tîne. Ew zarok tu carî dê bi wan sembol an jî misyonên ku sembolan lê bar kirine re aş nebe, dê nikaribe aş bibe. Hûn wê tiştê dizanin, piştî bûyerekê di tipa edlî de serobiniyeke cidî çêbû, dosye ji nû ve hatin vekolandin û hwd. Hin pisporên tipa edlî îstifa kirin, Ayten Uludag. Tiştek wisa got, hemû zarokên ku hatibin îstîsmarkirin di wateya derûnî de hildiweşin. Li Tirkiyeyê gelek dosyeyên tipa edlî bi sedema ku tu tişt tê de nehatine dîtin bi şûn de tên şandin. Dadger heman dosyeyê dîsa dişîne tipa edlî, di eslê xwe de dadger vê dibêje, ez dizanim tu sûcdar î, ez dizanim ev zarok ketiye travmayekê lê ji bo ku ez karibim ceza bidim divê tipa edlî ji min re belge bişîne, dibêje gava ku dosyeyan bi şûn de dişîne. Tipa edlî jî bi heter bi sedema ku di dosyeyan de li tu tiştî rast nehatine bi şûn de dişîne. Pisporekî tipa edlî yê ku li Ewrûpayê nêzîkî 35 salan xebitiye dibêje, min di jiyana xwe de tenê du caran nûsaf nivîsandiye ku li tu tiştî rast nehatime. Di her du nûsafan de yek jê di 19 saliya xwe de xwe kuşt, yek jî di 45 saliya xwe de ji ber bûyera tacîzê ya berê xwe kuşt. Bi xwezayî dibêje ku, bi zarokên ku hatine îstîsmarkirin an jî tacîzkirin di wê gavê de encamek dernekeve holê jî di pêvajoyên pêş de encamên ku derkevin dê hebin. Li Tirkiyeyê jî her tişt tam li dijî vê dimeşe. Yanî, bi gotineke din karê me gelek zehmet e. Ez naxwazim pir jî bêhêvî bim lê tiştekî giran giran bûya jî belkî me yê bi protez an jî veguherîna rû re bikaribûya bimeşanda, lê em hema hema bêjin bi mijarên ku mirina mejî pêk hatine re di qada zarokan de dixebitin. Gava ku em van li vir nîqaş dikin niha li hin ciyan zarok bi awayekî sîstematîk bi işkenceyê re rû bi rû dimînin an jî cihê wan tê guhertin û ji Pozantiyê ber bi Sîncanê ve tên şandin, lê li Sîncanê di şaneyên yek kesî de di mercên girantir de, di mercên nikaribin bi hev re parve bikin de, di standardên Ewrûpayê de rewşa wan a girtîbûnê tê dewamkirin. Pergal ne ev e, yan jî çareserî ne ev e di eslê xwe de. Tenê ji bo tevkariyê min xwest ez behs bikim. Spasiyên xwe pêşkêş dikim.

**Parêzer Ayşenur Demirkale**
**Baroya Stenbolê**

Ez ê jî pirsên ku bi îstîsmara zarokan ve eleqedar in esas bigirim û bersivê bidim. Êdî li ser N.Ç.yê naxwazim biaxivim, ji ber ku ew mijar di raya giştî de gelek hat axaftin û li gor min êdî hinekî tê bedkarîkirin. Dadger jî derket got navê min jî N.Ç. ye, esil ez mexdûr dibim, hevokek wisa got. Ji ber wê, ji wê wêdetir tenê ez dixwazim vê bêjim: Di dosyeyên îstismara cinsî de, di zagonê de ji bo zarokên ku li îstismara cinsî merûz mane sererastkirineke wisa heye. Tê gotin ku, bi van zarokan re tenê carekê dê qeyda deng û dîmenê were kirin û piştî wê divê zarok nekevin pêvajoya dubarekirina îfadeyan, lê ev nayê kirin. Li Stenbolê li kêm ciyan îfadegirtina bi deng û dîmenê heye. Ji wê wêdetir di şaxên gerînendehiyên parastina zarokan de tiştekî wisa tune ye, di danişînan de qet tune ye. Ger ku hûn li rastî dadgerekî/e gelek baş bên, qe nebe ji bo ku hûn bi kompîtera xwe qeydên deng û dîmenan bigirin dadger dikare destûrê bide. Lê ew zarok, piştre ger ku parêzerê bersûc ji bo ku pirsan jê bike an jî bîne rûberî hev dîsa di danişînê de wê rûheviyê dijî. Careke din bûyerê vedibêje. Gelek caran neçar dimîne ku biçe tipa edlî û dosye diçe Yargitayê û ger ku dosye xera bibe pênc salên din zarok dîsa divê were û wê bûyerê ji nû ve vebêje. Ji tipa edlî du nûsafên cuda tên girtin. Yek jê piştî bûyerê nûsafeke ku di derbarê îstismara cinsî ya ku zarok lê merûz maye ye û piştî vê nûsafê bi giştî pisporên tipa edlî maweyeke nêzî 6 mehan dibêjin, piştî nêzîkî 6-8 mehan raporeke din a ku li ser kes an jî zarokê ku li sûc merûz hatiye xisar heye an na, tê amadekirin. Niha di darizînên di derbarê biçûkan de, di sûcên îstismara cinsî ya biçûkan de bi zarokekî/e biniya 15 salî re bi rizaya wan be jî têkiliya cinsî nayê danîn. Parastin her gavê wisa ye, fuhûşê dikir, temenê wê mezin dixuya û hwd. Li hewayê topan bigire jî, bi zarokekî/e biniya 15 salî re têkiliyeke cinsî çêbibe cezayê wê heye.

Di zarokên di sînorên 15-18 salî de jî, pevrebûneke bi dilxwazî hebe ceza nayê birîn. Piştî têkiliyên dilxwazî ger zarok bi hin delîlan seqetiyekê vebêje, yanî ger zarok bêje belê di destpêkê de bi dilê xwe bû lê ji ber van sedeman ez neçar mam, wê gavê ceza tê birîn. Ger ji sûc zerar zêde bibe û bûbe sedema xesareke fizîkî û hestî ceza carekî din tê zêdekirin. Em dawiya wê jî wisa girê bidin, belê bi rastî jî li Tirkiyeyê di derbarê zarokên ku gelek caran hatine tacîz û tecawuzkirin de nûsafên wek ji sûc zerar nedîtine tên dayîn. Vê, wê rojê bi pisporên tipa edlî re civînek hebû me anî ziman, gava me pirsî, wan jî gotin rast e, dikare neyê dîtin. Pîvana vê çi ye, hûn li gor çi dinirxînin, hûn dizanin dê encam di çend salî de derkeve holê? Gava di 30 salî, 40 salî de travmaya vê derkeve dikarin ji vê bûyerê cuda bifikirin? Wan jî wisa şîrove kirin, em li gor rewşa şênber a wê gava nûsafê amade dikin, di nav me de jî ev yek bi nîqaş e. Tenê ez ji wir agahiyekê bidim. Ji wê wêdetir gava ku zarok ji aliyê polîsan ve tên binçavkirin, piştî wê gava ku ji binçavan dibin dozger an jî ji dozgeriyê dibin dadgehan her carê dibin muayeneya bijîşkan. Ger ne parêzereke/î karê xwe baş dike an jî heterker be, parêzer di wan gavên muayeneyan de bi zarokan re neçin an jî li ser vê pir nefikire, ez dikarim wisa binirxînim. Lê hevalên ku dikevin dozên siyasî an jî yên vî cureyî hinekî din hewl didin ku li derdora zarokan bimînin. Lê di taybetiya mercên muayenê de ez dixwazim vê destnîşan bikim, di her mercî de divê ev muayene di hawireke ku bijîşk û gumanbar bi hev re tenê bimînin bê kirin. Divê polîs jî nekevê, parêzer jî nekevê, dê û bav jî nekevê. Lê belê li wir carinan bijîşk ji ber ewlehiya xwe dixwaze polîs jî hebe yan jî polîs ji ber sedemên polîtîk û bi gumana dê bireve dixwazin li wir bin. Di paş perdeyê de hûn dikarin ji bijîşkekî/e neytbaş re xwe îfade bikin û çend tiştan bidin nivîsandin, çi baş muaneyên wisa jî tên kirin. Wek keseke di nav vî karî de dem deman ez jî dikevim nav bêhiviyeke ku bersiva tu hewldanan nayê dayîn, carinan jî bi çirûskên gelek biçûk an jî bûyerên tên jiyîn ên hêvîdar re xwe baş his dikim. Ji ber vê jî ez di wê baweriyê de me ku temen, wezîyet, rewşa fîzîkî, zayend çi dibe bila bibe, divê her kes mafên xwe bizanibe û ji bo vê daxwazên xwe bînin ziman. Di xala zanîn û fêrbûnê de dewlet vê derfetê mecbûr e ku bide we. Ger peyde neke, ji bo ku mercên peydekirinê pêk bên em jî mecbûr in ku daxwazan bikin. Ez naxwazim vê di bingehên pir polîtîk de vebêjim. Lê belê, di Zagona Şaredariyan de di salên berê de verastkirineke hatiye kirin heye. Ji şaredariyan re ji bo berasteng û zarokan ji bo bikaribin têkiliyê deynin park, baxçe, asansor û divêtiyên din ji mecbûrî kirine. Ya ku vê yekê daye kirin jî dozên ku li Tirkiye û Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpayê yên ku hemwelatiyên berasteng vekirine ne. Tiştên ku em diaxivin û daxwaz dikin carinan yeka yek bersiva xwe nagire. Lê jê wêdetir avakirina hayjêxistinê jî ji bo gavên paş wê pêşaniyê ne. Peymana Mafên Zarokan a Yekîtiya Neteweyan hin verastkirin bi xwe re tîne û ji bo sê mijaran jî Komara Tirkiyeyê îtiraz dike. Perwerdehiyên ji bo kêmaran, perwerdehiya bi zimanê zikmakî û avakirina weşanên radyo û televizyonan. Gava ku di vê mijarê de pirs tê kirin bersiva hikumetê zelal e, jixwe ez van di pratîkê de dikim, hewce nake ez van li ser kaxizan binivîsim, min ji bo avakirina televizyonan destûr da, ez destûr didim ku dibistan vekin, kursan vedikin, bernameyên sertîfîkayan li dar dixin. Gava em zimanê ku tê bikaranîn ê wek min destûr da, dikin, didim kirin derxin holê, li wê derê jixwe ji peymanê dûr dikeve. Lê xalên bingehîn ên vê peymanê, di xala xêzkirina sînorên bingehîn de nade nîşandan ku wek welatekî red bike. Divê em ji peymanên ku ew ê me gaveke din wê de bibe û ji bo jiyana rojane sûdewar be gelek encaman derxînin. Ji bo ku li Tirkiyeyê rêgez werin rûniştin di hiqûqa navxweyî de çi ji destê me tê divê em bikin. Xaleke din jî ji hevalên me yên ku li vir axivin, min xelet fam kiribe ez lêborînê dixwazim, lê tu dibêjî qey karkeriya zarokan bi daxwazên zarokan, yanî ez dixwazim piştgiriyê bidim malbata xwe, ji ber vê jî divê azadiya min a xebatê hebe. Di xala karkeriya jin, zilam, zarokan de divê wekheviyek were peydekirin. Min wisa fam kir ku dê şîroveyek were kirin. Dîsa di çarçoveya Peymana Mafên Zarokan a Yekîtiya Neteweyan de dixwazim tiştekî bêjim. Heta 18 saliya xwe her kes zarok e. Li gor verastkirinên taybet ên biniya 18 saliyan kes kamil be jî dîsa ji parastinên xweserî zarokan sûdê werdigire. Heta 18 saliya xwe hûn ne mecbûr in bixebitin, ji bilî fêrbûna pîşe yan jî hunerekê. Ger hûn ji neçarî bixebitin jî, berpirsiyariya vê ya malbata we, malbata we di vê mijarê de kêm bimîne ya dewletê ye. Dewlet di vê derê de mecbûr e ku piştgiriyê bide malbatê, ligel ku piştgirî tê dayîn û malbat zarokên xwe dide xebitandin û zarok li derve dimîne wê gavê dewlet mecbûr e ku

rêbazên din ên parastinê têxe dewrê. Divê daxwaz wisa teşe bigirin. Di temeneke zûtir de kamilbûna zarokan çi ye, dixwazin em wê jî vebêjin. Bi taybet di zewacên zû de ev mijar li ber çav nayê girtin. Li gor Zagona Medenî temenê zewacê 18 ye. Jin û zilam dikarin di 18 saliya xwe de bizewicin, kesên 17 salî jî bi rizaya dê û bavê xwe, ev riza divê li ber karmendê mehrê bikeve girtenameyê, dikarin bizewicin. Gava dizewicin jî tenê di mijarên zewacê de kamil tên qebûlkirin. Jê wêdetir gava ku ew kes sûcek bikin divê wek zarokên biniya 18 salî bên pejirandin. Di 15 saliya xwe de bi mebesta mijûlbûna huner an jî pîşeyekê bi biryara dadgehê hûn dikarin kamil bên hesibandin, lê gava we sûcek kiribe hûn mecbûr in ji verastkirinên ji bo zarokan sûdê werbigirin, ev mafê we heye. Ez mijareke din destnîşan bikim. Dixwazin 30 alî bin, sûcên ku we di biniya 18 saliya xwe de kiribin dîsa mafê we yê zaroktiyê dest pê dike û dikarin ji wan mafan sûdê werbigirin. Gava ku em verastkirinên zagonî yên derbarê zarokan de û di meriyetê de pirsgirêkên ku derdikevin holê tînin rûberî hev, ew qas verastkirinên kitekit hene lê pirsgirêk jî ji hêlekê ve serê xwe digirin û diçin. Em çiyê çi dikin, di encama vê de gava ku ez tiştên ku em ê bi dest bixin dikim kefekê ez her demê wisa dinêrim. Ji bo îro di maweya dirêj de hîn cudatir dikare were nirxandin. Di jiyana kesekî/e tenê de jî bikaribe guhertinekê çêbike, bikaribe zerardîtinê asteng bike, divê di vê qadê de xebat were kirin. Ger em ser pirsa D.'yê, ji ber agahiyên di nasnameyê de, ne mafê polîsan ne jî yê hinekên din ê lêdanê heye.

**Doç. Dr. Serra Muderrisoğlu**
**Zanîngeha Bogaziçi**

Du pirs ji min re hatibûn. A yekemîn derbarê N.Ç.yê de bû, pirseke ku çawa dikare vegere nav civakê bû. Di eslê xwe de ez rast nabînim ku ji ser N.Ç.yê biaxivim, yek ez nas nakim û ji axaftina li ser xalên ji derve jî hez nakim, lê bi rastî jî pirsa di wir de çawa dikare rehabilîte bibe ye. Di eslê xwe de hêzdarbûn an jî nehêzdarbûna wê ne pirsgirêk e, mirov bi hêza xwe, belê ji van hemû ezmûnên travmatîk dikare saxlem bisekine. Dikare adaptasyoneke wisa bi awayekî bitenduristî jî bike, lê her hal mijar ne ev e. Ji ciyekî gelek derveyî vê gava ku pergalên ku bi parastina wê re berpirsiyar in, rewşeke îstismara duyem derxînin holê, divê em girîngiyê bidin vê. Li wir, ji xala ku ew saxlem disekine wêdetir çi dibin gelo? Ji ber vê jî ne tenê ji ser derûniyê, di girêdana van kesan a civakê de qutbûnên mezin pêk tên. Yanî bawerî, gava ku saziyên ji baweriyê berpirsiyar in peywira xwe bi cî neynin, ji îstismara duyem re rê vekin, ez dibêjim ev dikarin bibin xalên gelek giran û bi wê xalê re jî di eslê xwe de serê min bi pirsa Azîze re mijûl dibe. Tiştên ku pir jî ji hev cuda nîn in, kesên ku di hawira şideta hatiye rewakirin de mezin bibin, ji bilî ew bi xwe çi qas xurt in, girêdana ku bi civakê re kirine an jî bi hin saziyên civakê, kesan, dewletê re kirine dikare çawa bibe? Dikare heta ku biçe? Têkiliya baweriyê dikare ji nû ve çawa were sazkirin? Ev xaleke gelek girîng e ku divê mirov biparêze û bêguman bi lîstina gogê yan jî lidarxistina seyranê re wê neyê çareserkirin. Wekî din jî bi tu awayî ji vê nayê bawerkirin. Bersiva hêsan a vê jî tune ye. Her hal li gor serê xwe, li gor min, ez dikarim xelet bifikirim, belkî jî tu demê wê neyê sererastkirin. Lê bi awayekî îzafî neqandin dikarin werin kirin. Ev jî dikare her gavê mirov di xaleke şikdar de bigire, ji ber ku em nikarin wan jiyînan sifir bikin. Heta ku li hêviya tiştên gelek topyekûn bin û hişmendî heman bin hinek baş, hinek xerab li gor min tiştên guherbar nakin. Lê ez di wê baweriyê de me ku divê ev pirs gelek cidî were girtin.

**Yüce Yöney**
**Edîtorê Rojnameya Bianetê**

Ez jî çend hevokan bêjim. Bi rastî tiştên ku ez ê bêjim ji çend hevokan pêk tên û eleqeya tiştên ku ez ê bêjim bi pîşe yan jî profesyoneliya min re tune ye, hemû fikrên min ên şexsî ne. A yekemîn, tiştên ku dixwazin werin destnîşankirin ez fam dikim, lê hat gotin ku "berpirsiyarî di yê pirsgirêk derdixe de ye, di dewletê de ye", dîsa hat gotin ku "civaka sivîl nikare pirsgirêkên zarokan çareser bike" ku wek şexsekî ez beşdarî vê yekê nabim. Ez beşdarî vê dibim: Heta ku pirsgirêka kurdan neyê çareserkirin li ser vê xakê pirsgirêkên zarokan wek ku

hatibe çareserkirin nikare bê qebûlkirin. Lê fikrê min ê şexsî, gava ku pirsgirêka kurdan were çareserkirin jî hemû pirsgirêkên zarokan wê hal nebe. Hevaleke me got zarok mafên xwe çi qas dizanin… Em di serdemeke wisa xerab de dijîn ku, ez dibêjim qey vê gavê ya girîng ew e ku mezin mafê zarokan bizanibin. Vê gavê mafên zarokan zêdetir ji bo mezinan dixuyê. Ger ew bizanibin wê pêşiya vê terora ku li ser zarokan tê meşandin hinekî bê girtin, helbet bîrbiriya zarokan gelek girîng e. Û ez nîşeyekê jî lê zêde bikim, bi rast ger ez biçim malê tişta ku ez ê ewilî qala wê bikim asta bîrbirina zarokên li vir in. Di asta ku mirov heyran bibe de ye. Ez hêvî dikim ku gava keça min jî bê temenê we hevokên mîna we karibin bibêjin û hêvî dikim heman pirsgirêkan nejî.

**M.A. (14 salî):** Ez dixwazim tiştekî bêjim. Gavek berê heval pirsekê pirsî bû, ez dibêjim qey we nîşe negirtibû. Vê pirsî bû, cezayên ku tên birîn li gor temenan çawa diguherin an jî tên guhertin?

**E.B. (14 salî):** Pirsa min bi vî awayî bû. A yekemîn sûc kî diyar dike, ya din jî mirovek 40 salî û zarokek heman cezayî digirin. Madem tiştekî wisa heye, xelet fam nekin ger li dadgehên Tirkiyeyê wisa bin, wê gavê çima mafên me yên zarokan hene?

**Mêvan**: Merheba, ez jî pisporê xizmeta civakî me. Ji bo bersiva camêr dixwazim bibêjim. Ez mezûnê 2011 yê Zanîngeha Hacettepeyê me. Ez hatim Stenbolê. Li Agaçliya Stenbolê navenda parastin, lênêrin û rehabîlîtasyonê heye. Zarokên ku ketine nav sûcan û li îstismara cinsî merûz mane li wir tên civandin. Dezgeheke sosyeteyê ye. Li vê derê zarokek heye, pir cidî bi diziyê re mijûl e. Bi rastî jî zarokekî pir har e, li Stenbolê derketiye rojnameyan, wek dizekî gelek baş tê naskirin. Li lingê zarok şûna birîna kêrê heye. Di hevdîtinê de ji min re vê dibêje, ger min vê diziyê nekira min nedikarî ez li hember dê û bavê xwe bibim xwedî gotin. Dibêje ev şûna kêrê jî ji vê yekê maye. Ger hûn ji destê zarokan destmalên wan ji wan bistînin an jî nehêlin diziyê bikin ji bo ku bikevin çavên dê û bavê xwe, zarok dê dîsa diziyê bikin û dîsa dê ji dê û bavê xwe kêrê bixwin. Ji ber vê jî wek kes tişta ku dikeve ser milê me ne ew e ku em destmalê ji destê zarokan derxînin, ji bo ku ji zarokan re xizmet werin kirin roleke mezin dikeve ser milê medyayê jî. Medya ji dêvla ku bernameyên beredayî yên zewacê çêdikin bila bêhtir giraniyê bidin ser zarokan. Ez mînakên ji Rihaya ku lê xebitîm bidim. Behremendiya hejara zarokan gelek e, dê û bav ji ber ku dewlet alîkariyê dike zarokên xwe didin xizmetên civakî, an jî bi hêviya ku dê sibê roj zarokên wan bibin karmendek vê yekê dikin. Dibêjin em xizan in, qe nebe bila zarokên me xizan nebin û bi vî awayî zarokan ji hezkirina dê û bavan mehrûm dihêlin. Ji ber vê jî ji medyayê re, ji Yüce Beg û Pinar Xanim an jî ji hempîşeyên wan re dixwazim pirsan bikim. Medya di vê merheleyê de li ku ye? Çima ligel ku mijarên beredayî cih digirin û li ser mijarên wisa nayê sekinandin? Kesên di asta jor de ne, yên entelektuel rojname dixwînin, heta ev bi xwe jî nizanin. Mafên me yên çawa hene, mafên zarokan çi ne, zimanê zarokan di çi astê de ne… Ji ber vê jî ez dibêjim risteke mezin dikeve ser milê medyayê.

**Mêvan**: Min berê jî pirsî, li ciyên ku zarokên ku ji diya xwe hatine sendin çi qas dikarin baş li wan were nêrîn? Sedemên ku didin wir çi ne? Ew zarok di ewlehiyê de ne?

**Mêvan**: Ez dixwazim ji bo gotina we ya berê tiştekî bêjim. We got ku divê zarok heta 18 saliya xwe bi tu awayî neyên xebitandin. Ez tevlî vê nabim, di eslê xwe de gelek tiştên wek peymana mafên zarokan û mafên mirovan ji Rojava ji me re tên. Em jî wek ku ya rast ev e tev digerin. Li gor min berê li Rojava ev ne wisa bû, piştre bi dema nûjeniyê re gotin divê zarok nexebitin. Ez dixwazim vê bêjim, helbet divê bi vî awayî neyê mêtandin, atolyeyên tekstîlan de nexebitin an jî li derve kar nekin, lê heta 18 saliya xwe zarok çawa dikarin tevlî hilberînê bibin?

**Parêzer Ayşenur Demirkale**

**Baroya Stenbolê**

Çima bila bibin, tu qet li vê fikirî?

**Mêvan:** Çima nebin, ez fam nakim. Em wisa bifikirin, malbatên ku li çolteran dijîn, ez jî wek kesek ku li wan deran mezin bûme, wek tiştekî xwezayî ez jî beşdarî wê pêvajoyê dibim. Ez li zeviyê jî dixebitîm, lê yanî çi qas min bikariya bikirama yan jî di bajaran de jî li gor min zarokek di hundir malê de bi dê û bavê xwe re di metbexê de dikare bixebite, bi awayekî dikare kedê hilberîne. Li gor min ev jî derdikeve holê, ger em bi temamî li derveyî wê bigirin wê gavê dê behremendî çawa derkevin holê? An jî heta 18 saliya xwe ew mirov dê mîna hevîr teşe bigirin û piştî 18 saliya xwe ew ê dest bi tiştekî profesyonel bikin. Ez nizanim di eslê xwe de, ez pir wisa nanêrim, li gor min ev rewşeke biproblem e.

**Parêzer Ayşenur Demirkale**
**Baroya Stenbolê**

Ji bilî fêrbûna pîşe û hunerê ku min vê jî bi taybetî da xuyakirin, ev li derveyî ku eleqeya wê bi peymana navneteweyî re heye, qet nebe baweriya min a şexsî ye. Ez pir jî bawer nakim ku divê zarok di nav jiyana xebatê de bin. Piştî ku we hin destbikariyên jiyanî, wek hizirîn, xwendin, nivîsandin an jî xwe parastinê fêrî wan kir ew ê vê li gor pêdiviyên xwe di merheleyên jiyana xwe de temam bikin. Ez ne di wê baweriyê de me ku divê keçeke 13 salî vê fêr bibe an jî keçeke 16 salî. Ev nayê wê wateyê ku dê li malê tu berpirsiyariyên dikeve ser milê wê bi cih neyne yan jî kar neke. Tenê karê ku li gor temen û destbikariyên wê û karê ku ji jiyana hevpar derdikeve holê bike bes e.

**Mêvan:** Ez gava ku dibêjim karê malê ez nabêjim bila tenê keç bikin. Lê li gor min di wir de dibe sedemeke wisa jî. Hûn nizanin ew zarok mîna we bi awayekî xwezayî çi qas têkeve nav kar nizanin, rewşa ku li wir ew bi qasî we nizanin derdikeve holê. Wek pêvajoyeke xwezayî divê ew jî beşdar bibe. Wê gavê ew ê bibe xwediyê mafê gotinê jî. Malbateke wisa bifikirin, bav li derve ye yan jî dê jî dikare bixebite, ji ber ku ew pere tîne yan jî ger em behsa tiştekî wek kedê bikin ji ber ku dê û bav vê dikin zarok li derveyî vê dimîne. Mîna ku ji hinekan hêviya hin tiştan e. Zarok diçin dibistanê, dê û bav li derve dixebitin, karê zarokan jî çûyîn û hatina dibistanê ye, ji derveyî wê jî havînan bêhna xwe bidin, piştî demekê jî piştî ku dibistanê biqedînin bibin xwediyê karekî. Em vê yekê ji wan re ji nû ve pevdixin, yanî em li gor wan tiştekî diyar dikin û wan li wê pêvajoyê tînin. Ji min re wisa tê ku di wir de jî aciziyek heye, min tam nekarî îfade bikim lê.

**Yüce Yöney**
**Edîtorê Rojnameya Bianetê**

Ez dixwazim tişteki biçûk bi ser ve bikim. Min pirs an jî xem rast fam kir ez nizanim, lê tu xema kesî ya ku zarokan ji pêvajoyên kolektîf dûr bigire tune ye, qet nebe ji bo kesên ku di vê salonê de ne wisa difikirim. Tişta ku tê behskirin ne ev e, karkeriya zarokan, xebitandina zarokan mekanîzmayeke din a mêtinê, mekanîzmayeke mêtina kedê ye. Encax em dikarin ji ser vê karkeriya zarokan vebêjin. Ez behsa tenduristiya mercên xebatê, tiştên ku dê li hember keda xwe bi dest bixin nakim jî. Ez dibêjim divê zarok di vê serdema zaroktiyê de ji bo vê jiyanê razemeniyê bike û qandî ku pêkan be ji vê mekanîzmaya mêtinê dûr bimîne. Fêrbûna zarokan a hurmetdayîna kedê, beşdarbûna pêvajoyên kolektîf tiştekî din e. Ger bikaribe zelaliyekê bide ez dikarim van bibêjim.

**Mêvan**: Biborînin, ger hûn bixwazin ez jî ji keda zarokan dest pê bikim, çinku tiştê ku heval dibêje ji nîqaşê re ew qas vikiriye ku, zaroktî, zaroktî li ku tê guhertin, dîroka zaroktiyê,

ev bi nûjeniyê re veqetiyan lê li vir yên me veneqetiyan. Ez wek mirovekî bi salan bi ILO û LÖSEV'ê re xebitiye û kampanyayên gelek dirêj çêkirine, li ser navê ji keda zarokan re dawî, helbet ne serketî bûn. Ji ber ku li Tirkiyeyê ji keda zarokan re daxwazek heye û keda erzan, keda jinan û keda zarokan. Lê helbet li vir krîter hene, zarokan ji pêşerojê re amade dike? Mesela we got firotina destmalan. Ez ji sala 89'an vir ve bi zarokên kuçeyê re dixebitim, ez dixwazim vê têgehê jî hinekî nîqaş bikim. Lê me kampanyayên ji zarokan tiştekî nekirin jî kir. Lê ez dizanim ew zarok û malbatên wan çi qas bêçare ne û pêdiviya wan bi bihaya wan destmalan heye jî. Tu kes vê nabîne ku, niha ez ji zarokan bipirsim bê karên giran û xetere kîjan in, her kes her hal dê maden û derên wisa bînin ber çavên xwe. Na, xebata li kuçeyan li gor peymana saziyê di nav karên giran û xeter de ye. Tiştekî vê ku were nîqaşkirin tune ye. Lewre li cihên herî bi xeter bi rîskên herî mezin dixebitin. Ji ber wê sedemê, vê sedemê gelek sedemên wê hene, ez wan pir baş dizanim, min gelek lêkolîn kirin. Hevalên ku ji Amedê hatine dizanin. Çi qas pêdivî ye, helbet ev rastiyek e, lê divê zarok bixebitin an na? Ez dereng hatim, bi taybet ji ber ku min axaftinên zarokan guhdar nekirin ez gelek xemgîn dibim. Do êvarê hemû şevê ji Enqerê, di rê de hatim, serê sibê bi şaredariyekê re xebateke me hebû di mijara şidetê de, şideta nav malbatê. Di wê mijarê de soza min hebû, ji ber wê jî min serê sibê nikarîbûm bêm û pir xemgîn bûm. Niha li vir qandî ku dibînim di olçekên pir cuda de nîqaş tên kirin. Zarok bi govanî û dîtinên xwe ve diaxivin. Mezin pir cuda, her kes li gor pîşeya xwe tiştekî dibêje, encamên lêkolînên xwe dibêjin. Xwendekarên min ên delal li vir in, ew ji sepanên xwe tiştinan tînin. Lê ev mijareke ew qas berfireh e ku divê em di her olçekê de hilbigirin dest. Ez dixwazim vê bêjim, wek parêzvanekî mafên zarokan, her zarok kirdeyek e, wek bireserek ne ew zarok û ev zarok in. Yanî divê bi her yekê re yeka yek em bixebitin. Ev di asta mîkro de, di olçekeke nû de divê em pirsgirêka zarokekî/ê bi tena serê xwe hilbigirin dest. Divê em bi malbatên rewşa wan navîn in û saziyên din re bixebitin. Lê bi xebatên li Tirkiyeyê jî bi rastî jî em tê dixebitin ku pergalê jî biguherînin, di dema xwe de em xebitîn. Çinku ez binê vê xêz dikim, zarok li benda me namînin. Min bi zanebûn, hin zarokan bi girîn di karên zehmet de daye bicîkirin. Ji ber ku gava ew zarok biçûya malê dê nikarîbûya têketa hundir, wê lêdan bixwara, wê işkence pê bihata kirin. Ez di jiyana xwe de dudiliyên wisa jiyam û hûn ew qas neçar dimînin ku, di hin rewşan de hûn neçar dimînin ku van bikin, zarok jî neçar dimînin van bikin. Lê divê em a îdeal, li ser navê riyeke rast vê bikin. Ez mirovekî ji nifşê 68'an têm û me wê demê digot ku pêşiyê bila ev şoreş pêk bê dê her tişt sererast bibe. Niha li vir jî em nikarin bibêjin bila ev pirsgirêka kurdan çareser bibe her tişt dê sererast bibe. Yanî ez ji bo ku ew pirsgirêk çareser bibe, divê em hemû bixebitin, em dixebitin jî. Van mexdûriyetên ku derketine holê jî em dixwazin ji holê rakin. Li ser ji holê rakirinê jî civînên me çêdibin lê di vê navberê de zarok nasekinin. Heta em karibin divê em bi her kesî re têkevin nav tevkariyê. Şaredarî, rêxistinên sivîl, malbata zarok, dibistan, bi hemû kesan re bixebitin. Ji aliyê zagonî ve Ayşenûr Xanim beşdarî min dibe nizanim. Ez dibêjim zagonên me bes in, ji bo her tiştî bes in, yanî em verastkirinên zagonî bikin em ê Tirkiyeyê xelas bikin, em dikarin pir baş bixebitin lê bes ku bila dadgerên me, dozgerên me, biryardarên me ji bo vê biryar dabin. Em bi gelek wezîran re jî xebitîn, mesela wan jî ji bo zarokên kuçeyan biryarên pir baş dan, peyman çêkirin. Ev hemû hatin kirin, divê em li sepanên baş ên ku li Tirkiyeyê hatine kirin jî binêrin. Bi zarokan re yeka yek hat xebitîn û zarok bi xwe çareseriyan anîn. Em karibin hinek li van tiştên ku hatine kirin jî binêrin, em ê ji nû ve kifş nekin. Ji ber ku ev nîqaş li Tirkiyeyê di her gavê de ji nû ve tên kirin, em demê winda dikin. Spasiyên xwe pêşkêş dikim.

**Mêvan:** Ez ji Mêrsînê hatim. Ez serokê GOÇ-DER'a Akdenîza Mêrsînê me. Em ji bo nîqaşa makezagonekê hatibûn vir, min vir jî dizanîbû, ji ber vê jî min qeys dît û ez hatim vir. Di derbarê koç û sûcên zarokan de gelek tişt dikarin werin gotin, lê ez dixwazim li ser vê Pozantiyê, li ser zarokên mexdûrên TMK'yê ne çend tiştan bibêjim. Gelekên van zarokan li Mêrsînê ne, em taxên ku dijîn û malbatên wan jî nas dikin. Ez malbatên zarokan jî nas dikim. Di eslê xwe de ev bûyer çawa hat vir, di vê mijarê de agahiyên têr tune ne, ez dixwazim hinek ronî bikim. Ev du sal in em dizanin ev bûyerên taciz û tecawuzê diqewimin li girtîgehan, di bin çavan de. Em dizanin ku sedemên vê bûyereke sîstematîk e. Li hemberî têkoşîn û berxwedana

kurdan helwesteke întiqam sendinê ye. Em vê di her carê de dibînin. Em wek Goç-Der, Komeleya mafên Mirovan û Navenda Jinê her sê sazî hatin gel hev û me got divê em li ser vê mijarê hûr bibin, kedekê bidin. Em li malbatan jî geriyan. Di eslê xwe de şansa me ya herî mezin 15 zarokên ku hatibûn girtin û hatibûn berdan bûn. Di nav van de zarokên gelek cuda jî hebûn, wek van zarokan. Em nikarin van malbatan jî qaneh bikin. Lê zarok qaneh bûn, yanî me got ku, em bi ser vê pirsgirêkê de biçin, hûn vê pirsgirêkê jiyan, hûn derxînin holê. Em li 68 malan bûn mêvan û êvarê me çaya wan vexwar, xwarina wan xwar, yanî di hawireke jidil de em li ser pêvajoyê axivîn. Ev pêvajo salek dewam kir. Paşê zarokên me yên wêrek, leheng derketin gotin çi hatibe serê me em ê vebêjin. Hatin komeleya mafên mirovan, pêşî serî li wir dan û li wir vegotin, piştre ji medyayê re vegotin. Paşê ev bû malê raya giştî. Ez dixwazim vê bêjim, rola rêxistinên sivîl ne biçûk e, em biçûk nebînin. Em bizanibin ku di vê qadê de dewlet sûc dike û derxistina vî sûcî nirxdar e. Em neçar in ku têkoşîna vê bidin. Me li wir sê koman xebat meşand û bû malê hemû Tirkiyeyê. Ma qey wekî din sûcên zarokan pêk nayên, li her qadê çêdibin. Em wisa dizanin, me lêkolînek kir, yanî par li Edeneyê me di lêkolîna koçê de nûsafa xwe jî pêşkêş kir. Li Edeneyê hevalên me yên jin ji jinan dipirsin: Tu li tacîz an jî tecawuzekê bûye şahid? Jinik, belê dibêje. Piştre dîsa gazî wan dike û dibêje, “ez bi xwe hatime tacîzkirin û tecawuzkirin. Ez her gavê dibêjim ez şahid bûme, heta niha min nekarî ez ji hevser û zarokên xwe re vebêjim. Hûn jî ji tu kesî re vê nebêjin, çinku ev ê bibe dawiya jiyana min.” Ev koça bi darê zorê ya ku di salên 90’î de bûye trajedî û travmayên cidî da jiyandin. Em hîn jî vê dijîn. Di bajaran de gelek tiştên xizanî, tunebûnî, neçarî hene, travmayek heye. Va ye ev zarok êsîrên wan rojan in, ev zarok wê koçê nejiyan lê li vir hatin dinê. Di van bajaran de tên dinê, sûcan dikin. Bi zanebûn kevir davêjin panzeran. Em diçin taxê em dipirsin dibêjin ev çawa çêdibe, dibêjin ka em nîşanî we bidin. Diçin tiştekî bi çetelastîkê ve dikin davêjin panzerê, panzer kuçeyê tîne xwarê, ev jî keviran davêjin panzerê, va ye dîmen wisa ye. Ev tiştên heyî ew anîne vî halî. Em dibêjin ew qerekol êdî li wir sûcan asteng nakin, sûcan derdixînin. Ev bi polîtîka bi zanebûnî tên kirin. Ez dixwazim rewşenbîr û kesên ku li vir diaxivin vê yekê bizanibin. Ev bi awayekî fecî wisa diçe û ev tecawuz û tacîzkirina van zarokan jî encamê polîtîkayên bi zanebûn tê meşandin e. Li vir hinekî hat deşîfrekirin, em ji niha pê ve jî deşîfrekirinê bidomînin. Ez ji we re serkeftinê dixwazim.

**Mêvan**: Ez dixwazim behsa mijareke din bikim. Bavê min di sala 2000’an de gihîşt ser dilovaniya xwe. Diya min hîn jî dijî. Beriya ku bavê min bimire karmend bû, mehmiza wî jî hebû, teqawît bû. Piştî ku mir divê pereyên wî ji min re bimînin, lê niha diya min digire û diya min zewicî. Piştî ku zewicî wî pereyî digire yan na, ez dixwazim vê fêr bibim, çinku ji min re dibêjin piştî 18 salî divê tu wî pereyî bigire, ez pir mijûl kirim.

**Parêzer Ayşenur Demirkale**
**Baroya Stenbolê**

Piştî ku bavê te mir ji bo te mehmiz nehat girêdan?

**Mêvan**: Qet agahiya min jê tune ye.

**Parêzer Ayşenur Demirkale**
**Baroya Stenbolê**

Baş e, wê gavê tenê tu dikarî daxwaznameyekê ji Gerînendehiya Sandoqa Teqawîtbûyî ya Enqerê yan jî Dezgeya Ewlehiya Civakî re binivisîne û wênekopiya nasnameya xwe jî pê re bişîne. Bêje bavê min di vê dîrokê de miriye. Ji roja ku bavê te miriye tu yê para xwe bigire. Piştî ku diya te zewicî jî nikare mehmizê bigire, lê pereyên diya te nadin te.

**Mêvan**: Spas.

**Parêzer Ayşenur Demirkale**
**Baroya Stenbolê**

Baş e, ez tenê vê bi ser ve bikim. Pirsên wek sûc çi ye, ceza çi ye hatin pirsîn. Pirseke di Xizmetên Civakî de zarok çawa tên bicîkirin hebû. Di pirtûkên hiqûqê de bi pênaseyên kesên nivîsandî ve sûc û ceza di çarveya peymanên navneteweyî û makezagonan de, rewşa ku welatên di hiqûqa xwe ya navxweyî de hin bûyerên diyar bi mueyîdeyê ve girê bide ye. Bersiva cezayê gava ku zerarek li mal û canê yekî/ê bê kirin ev kirin bi mueyîdeyekê ve tê girêdan. Hema hema di her civakê de ya eslî parastina dewletê ye û bergirtiyên ku ji bo mekanîzmayên parastina dewletê tên kirin di zagonên cezayî de teşe digirin. Li gel vê di zagona me ya cezayê de nirxa esas a ku tê parastin, mueyîdeyên ji bo sûcê li hember malan bêhtir giran in. Di Zankoya Hiqûqê de tê gotin ku, hûn ê çavên mirovekî derxînin lê berçavka wî neşikînin. Çinku cezayê ku hûn ji bo zerara malekê bidin ji cezayê zerara can bêhtir e. Di zagona cezayê ya di 2005'an de derket, hevsenga navberê hinekî hat girtin lê dîsa jî mueyîdeyên li hember mal zêdetir in. Ji ber ku sûcek bi navê gaspê heye. Ew ê ev bê bîra we, di çapemeniyê de derketibû. Zarokên nan û beqlewe dizîn hatin cezakirin felan. Pênaseyeke bi navê diziya hêsan heye. Cezayê hûn alavekê ji vir bigirin û bibin cuda ye, cezayê ku hûn kilîta deriyê vir bişkînin û alavek bibin cuda ye. Gava ku hûn zerar bidin mal û diziyê bikin hin sûcên din derdikevin meydanê û helbet cezayê wan jî heye. Ez dixwazim ji bo zarokên ku destmal difiroşin jî hin tiştan bêjim. Sepaneke ku Şaredariya Mezin a Stenbolê jî di nav de bû pêk hat. Hin tîman ava kirin û ji bo ku karibin rewşa zarokên ku li kuçeyan destmal difiroşin fam bikin zarokan ji kuçeyan dan hev. Zarokên ku li kuçeyan destmal difirotin hatin girtin. Hemû zarokan li navendeke civakî tînin ba hev, agahî ji malbatên wan re tê şandin û cezayê pereyan li malbatên wan tê birîn. Jixwe ev malbat ji ber ku xizan in zarokên xwe li kuçeyan didin xebitandin. Piştre di derbarê wan de nûsafên vekolînên civakî tên amadekirin û ji bo van zarokan alîkariyên pereyî tên kirin. Ev lêkolîn nêzîkî salekê didome. Mecbûr in ku wan zarokan dîsa radestî malbatên wan bikin. Tam rewşeke xwedubarekirinê hat avakirin, lê dîsa jî ez bawer nakim ku çareseriya pirsgirêkê ji zarokên kuçeyan kirîna tiştekî ye. Em bêjin ku li kuçeyê bebikek hat dîtin, carinan di rojnameyan de jî derdikevin, ji satila çopê bebik derdikeve yan jî zarok bêkes e, cîran an xeber dane, li baxçe bi tena serê xwe rûniştiye. Di xala ku ji bo vî/ê zarokê dikare çi were kirin de, biryarên parastinê, biryarên ji bo bicîkirina zarokên wisa ya wargehên zarokan divê ji hêla dadgehê ve were dayîn. Ji bo ku biryara dadgehê were girtin hin maweyên pêwîst hene, di vê maweyê de bi erêkirina milkî amirê wir jî zarok ji bo demekê dikare di wir de were bicîkirin. Têgehek jê re erêkirina parêzger dihat gotin hebû yan jî şaxê gerînendehiya parastina zarokan jî dikarin li derekê bi cî bikin heta ku dadgeh biryarê bide. Naveroka saziyan, di warê çawa li zarokan dinêrin de ez bawer dikim ku li gor temen û saziyan cudahî hene lê bi awayekî giştî li gor salên berê hinekî din ber bi başiyê ve çûye. Lê belê ew qas malbatên ku ji ber xizaniyê neçar mane dev ji zarokên xwe berdin hene ku sazî wek ku di pêkanîna zagonan de kêmasî tên kişandin, ji aliyê xebatkaran ve pirsgirêk tên jiyîn, cih, pispor û kesên li zarokan binêrin gelek kêm in. Lê di bicihkirina zarokan ya saziyekê de divê teqez biryara dadgehê hebe.

**Gülnur Elçik**
**Moderator**

Em ji we hemûyan re spasiyên xwe dibêjin. Gelî hevalan ez dixwazim tiştekî pir biçûk lê zêde bikim. Fikra ku li Tirkiyeyê bi zagonan tu tişt nayên guhertin gelek belav e lê li welatên wek me ku ji bilî hilbijartinê nikare bi dewletê re têkilî deyne, ez hem pêvajoyên amadekirina zagonan û vekolandina zagonan gelek girîng dibînim, ji ber ku em dikarin bi van riyan li ser dewletê giraniyekê çêbikin. Ez ezmûneke xwe ya şexsî parve bikim. Ez di Weqfa Hevgirtina Jinan de dixebitim û weqfa me endamê Kolektîfa Femînîst a Stenbolê ye. Em li wir dozên bi jinan re têkildar in dişopînin, wek jin. Hem em diçin pêşiya dadgehan qelebalixiyekê çêdikin,

daxuyaniyê didin û hem jî salonên dadgehan dadigirin û daxwaznameyên mudaxeleyî didin. Ez wisa difikirim ku ev bi awayekî cidî giraniyê çêdike. Di eslê xwe de dozê ku em diçinê gava ku em li tiştên wek tacîza zarokan rast tên, ez li hevalên ku di komeleyên zarokan de dixebitin jî digerim. Bi ya min komeleyên ku bi zarokan re mijûl in jî ji ser însiyatîfeke wisa li ser dadgehan giraniyekê ava bikin, encamên baştir dikarin werin bidestxistin.

**Mêvan**: Tenê sedeke min a ku ez tiliya xwe bilind dikim heye, ew jî ez dixwazim vê pirs bikim. Bi rastî jî ez difikirim ku girîng e. Pirsa min ev e, li vir Abdûlkadîr Beg, mirovên ji ÇAÇA'yê, mirovên ji Weqfa Çand û Hunerê Ya Başakê hene, gelek tişt tên nîqaşkirin lê di pratîkê de ji bilî vê civînê, ji bo diyarkirina stratejiyê, di qadên cuda de pêwistiya me bi hevkariyeke cidî heye. Bi rastî jî pêwistiya me bi plan û stratejiyeke cidî heye. Xebateke wisa heye, tê kirin an jî tê fikirandin? Yanî dê tiştên ku di vê civînê de hatine axaftin ji çi re bibin?

**Gülnur Elçik**
**Moderator**

Min ji ber vê yekê xwest agahiyeke wisa parve bikim. Tişteke wisa tê kirin û em dibînin ku ev bandorker e.

**Abdulkadir Güger**
**Rêvebirê Şubeya Xizmetguzariya Zarok û Kreşê ya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê**

Ez ji bo Amedê bêjim. Li Amedê bi gelek sazî û dezgehên civakî yên sivîl re bi hev re ji bo xebatên li ser zarokan baştir bimeşînin xebat tên meşandin. Di kordînasyonê de aciziyên cidî hene. Em ê çawa bikaribin kordîne bikin xebatên me hene. Heta planên me yên wek rênexşe û komxebat hene.

**Gülnur Elçik**
**Moderator**

Em ji her kesî re spasiyên xwe dibêjin.

## ATELYEYÊN FOTOGRAFAN Û ÇÎROK JI ZAROKAN

Wek ku me di beşa pêşekê de jî da xuyakirin di çarçoveya xebatên me de Weqfa Çand û Hunerê Ya Başakê û ÇAÇA bi hev re atolyeyên fotografan li dar xistin. Di van atolyeyan de bi zarokan re xebatên xwendin û nivîsandina medyayê hatin kirin û li ser bûyerên zarok û sûc di medyayê de çawa tên bikaranîn, çawa dibin nûçe hat rawestin. Piştre, zarok di çarçoveya bûyerên me qal kirin de wan bi xwe fotograf kişandin û nûçeyên ku hûn ê li jêrê bixwînin nivîsandin, kirin çîrok. Li Stenbolê ji bo xebata ku li ser fotograf û metnan hat kirin komên du kesî hatin avakirin. Yek ji zarokên komê ji jiyana xwe çîrokekê dinivisîne û wek lehengê vê çîrokê portreya xwe dikşîne, zarokê din jî fotografê ku hatiye kişandin dike nûçe. Di xebatên komî ên Amedê de jî zarok bi karekterên ku ava kirine temsîlên xwe afirandine. Beriya ku em berhemên vê atolyeyê wek nûçe, fotograf û çîrokan bidin em dixwazin cî bidin nêrînên Yücel Tûnca ku ev atolye bi saya serê wî hatiye lidarxistin.

## FOTOGRAFÊN KU HESAB JI SÛCAN DIPIRSIN

Nêzîkî 15 sal e ji derveyî mezinan ez bi ciwan û zarokan re atolyeyên fotografan li dar dixim. Hilberînên komên temenên cuda di van atolyeyan de cudahiyekê derdixin. Di xebatên van atolyeyan de ez dibînim ku çelengbûna mezinan zêdetir bi awayekî ye û di kaliban de bi sînor in. Hal we ye ku bi ciwan û zarokên biniya 17 salî re nêrîneke bêkalib û xweser heye. Ji ber vê jî – bila mezin dilê xwe negirin – ez xebata bi zarokan re datînim dereke din. Ez bi rehetî dikarim bêjim ku gava ez bi zarok û ciwanan re me bêhtir tiştan fêr dibim, bêhtir kêfê jê digirim, dibin sedem ku ez xwe di ber çav re derbas bikim. Di Projeya Ez Sûcdar im? Em Sûcdar in? Ew Sûcdar in? De jî ev yek nehat guhertin, li dijî wê zexm bû.

Gava ku min 11 ciwanên (ez nikarim ji wan re bêjim zarok, lewre wê dewrê ji aliyê temenê aqil ve li dû xwe hiştine) ku beşdarî atolyeya me li Stenbolê, li Weqfa Çand û Hunerê Ya Başakê di Sermaweza 2011’an de meşand û min rêbertiya wê dikir nas kirin, min nizanîbû ez ê têgehên sûc û sûcdariyê ew qas rehet nîqaş bikim. Hîn di deqeyên ewilî de hayjêbûna wan min bi giştî rehet kir. Min fam kir ku, ev têgehên ku ketine nava projeyê, hem jî fotograf; lewre jiyan bi xwe bi wan re dikare were axaftin, min dikaribû ez zanînên xwe ji wan re vebêjim û bi merak li wan guhdar bikim.

Di xebata xwe ya çar hefteyan de destpêkê em tê xebitîn ku têgehan li ciyê wan bidin rûnişkandin, yanî yekîtiya ziman biafirînin. Me xebatên kolajê kirin û bi alavên dîtbariyê ezmûna çîrokirinê bi dest xist. Her ku em li ser medyayê axivîn, ez tê gihiştim ku aliyên medyayê yên bi pirsgirêk ji hêla hemûyan ve tê zanîn û qandî ditirsiyam li ser şopdarên medyayê bandor nekiriye û ez bi vê yekê kêfxweş bûm. Me nûçe û fotografên medyayê yên ku di rojname û kovaran de derketine danîn ser masê. Gava ku me fam kir xwendin û nivîsandina me ya medyayê naxape, me xeletiyên hatine kirine dîtin û em li ser a baştir çawa dikare were kirin axivîn.

Paşê jî me dest bi pêşxistina çîroka xwe kir. Çîrokên temaya wan "Zarokê sûcdar – Zarokê tê sûcdarkirin" yek bi yek derketibûn holê. Me di çîrokan de îzafiya legalê, texrîbatên ku di civak û kesan de pêk hatine yên ku xweferzkirinên civakî û siyasî derxistine holê didît. Her beşdar çîroka ku nivîsandibû, da hevalê xwe yên din û bi vî awayî kir ku fotografeke wê were kişandin. Û di dilqê her karekterê pevxistî yê di çîrokan de oto-portreyek hat hilberandin.

Ji ber ku di dema kêşanan de ez ne li cem wan bûm ez gelek xemgîn bûm, çinku di fotografan de wisa duxuya ku pir kêf kirine. Gava ku fotografên ku hatine kişandin ji aliyê naverok û çelengbûnê ve dinirxandin, gava ku ji bo pêşandanê hilbijartinan bi axaftin û nîqaşan dikirin, gava ku di navbera xwarinê de bûyerên rojê dinirxandin her gavê heman kêfê, em kêfa aqil û wijdanê hevpar jiyan.

Piştî çar hefteyan gava ku di Depoya Topxaneyê de ez li pêşaneyê geriyam li hember rastî û jidilbûna fotografên min temaşe dikirin û metnên min dixwendin careke din mîna ku ez nû dibînim kelecanê ez girtim.

Ez ji 11 hevalên xwe yên ku kirin ku ez hesabpirsîna xwe ya li hember sûc û sûcdariyê zelal bikim re spasiyên xwe dibêjim.

***YÜCEL TUNCA***
***Serokê Weqfa Fotografan***

# Çîrok Ji Zarokên Stenbolê



**Nûçe 1**
**H.K (15 Salî)**

Zarokeke nîvê şevê li parkeke tenha ya semta Osmaniyeya Stenbolê tena serê xwe digere, bi agahdayîna kesên li derdorê re radestî rayedaran hat kirin. Hat famkirin  ciwanê ku radestî rayedaran hat kirin heftayek li kuçeyan e. Şevîn heftayek berê li Osmaniyeyê piştî ku bavê wê diya wê kuşt li kuçeyan dest bi jiyanê kir. Diya Şevîn Nermîn Xanima ducanî, şevekê ji bo ku dereng radibe paşîvê, mêrê wê Alî Beg bi vê rewşê diqehere û bi pehînan wê dikuje. Derket holê Şevîna ku piştî bûyerê travmayeke giran derbas dike li kuçeyan dijî û car caran jî tiryakê bi kar aniye. Bijîşkê ku Şevîn muayene kir da xuyandin ku Şevîn di encama travmayeke giran de ji bûyeran xwe berpirsiyar dîtiye.


**Çîrok 1**



Şevîn hîn 11 salî ye. Di malbateke 4 kesî de li Osmaniyeyê dijî. Di meha Remezanê de diya wê Nermîn Xanim ji bo ku ji paşîvê re xwarin amade bike diçe metbexê. Sifreyê amade dike. Lê belê ferq dike ku dem hêj zû ye, mêrê xwe Alî Beg şiyar nake. Ew jî diçe ser ciyê xwe û radizê. Demek paşê Alî Beg şiyar dibe, diçe ser sifreyê û di wê gavê de bang tê xwendin.  Bi hêrsa wê kêliyê pihîneke li dilê Nerîman Xanim dixe. Û Nerîman Xanim bi zarokê di malzaroka xwe de jiyana xwe ji dest dide. Şevîna ku van bûyeran dibihîse (dibîne) derûniya wê xera dibe û dixwaze hezkirin û hurmetê di kuçeyan de bibîne. Şevîna ku dest bi tiryakê kiriye her gavê dubare dike ku hemû sûc ê wê ye û her tişt ji rûyê wê qewimiye.

**Nûçe 2**
**H.Î (14 Salî)**


Do di encama serdegirtinên cihên cuda de, mensûbên rêxistinê yên ku çalakiyên şidetê dikin hatin bidestxistin. Tê ragihandin ku di operasyonên di çapana Tirkiyeyê de hatin kirin de, bi giştî hezar-du hezar kesên ku beşdarî çalakiyên protestoyê bûne û li hember dewletê, li hember miletê derketine hatine girtin. Di derbarê dê çend rojan di bin çavan de bimînin de tu agahî nayê dayîn.



**Çîrok 2**

Demekê malbateke ji 3 kesan pêk tên hebûye, Berçema 11 salî qîza malê ya tenê ye û gelek ji dê û bavê xwe hez dike... Werin em bi hev re li çîroka Berçema ku gelek ji malbata xwe hez dike guhdar bikin… Ev malbat ji bo ku mafên xwe biparêzin diçin çalakiyan, ji bo ku zimanê xwe yê zikmakî biaxivin têkoşîn dikin, polîsên ku ev dişopînin jî, rojekê davêjin ser malê û dixwazin dê û bav bigirin bin çavan. Berçem jî ji ber ku biçûk bûye ji kiryarên polîsan tirsiyaye, çinku dê û bavê wê di heman demê de digirin bin çavan û hem jî bêsûc ew digirin bin çavan. Berçem li ber vê rewşê xwe negirtiye, gava ku tam dê û bavê wê ji derî derdixînin û ji pêlikan dadixin bi wê hêrsa xwe ya wê gavê êrîşî polîsan dike û ew jî digirin bin çavan, demek paşê ber didin. Ji wê rojê pêve Berçemê ew tiştan ji bîr nekirine û wê jî mîna dê û bavê xwe dest bi têkoşînê kiriye, çinku ferq kiriye ku bi rastî hem mafên wê nayên dayîn û hem jî işkence pê didin kişandin.





**Nûçe 3**
**F.K (14 Salî)**
GEL RABÛ SER PIYAN!!!

Li welêt F.K. jî mîna hemû hevalên xwe yên ku di rêxistinên ku ciwanên lîseyiyan ava kirine de winda ye… Ciwanên lîseyî ku hewl didin welat bikin welatekî tam serbixwe û aramiyê bînin mirovan serwext dikirin, ji bo wan û xwe rizgar bikin bi dewletê re di nava têkoşînekê de bûn. Gelê ku ferq kirin ji nav wan ên wek F.K. winda dibin şiyar bûn. Hikumet hat belavkirin, şoreşek çêbû. Piştî van bûyeran li welat rojên aramiyê dest pê kirin.

**Çîrok 3**

Li welat li gel tehdayî û işkence dihat kirin. Kuştinên faîlê wan nediyar û winda zêde bûbûn. Ji vî welatî re şoreşek hewce bû. Ên ku vê şoreşê dan destpêkirin çend xwendekarên lîseyê bûn. Ev xwendevan hêdî hêdî ji holê winda dibûn. Ji nav wan yek jî Firat bû. Ew di çalakiyekê de girtin û işkenceyên nedîtî lê kirin. Tenê sûcê wî dewleteke serbixwe û biaram bû. Mirov serwext dikirin û ew diparastin. Piştî ku hat girtin çi bû ji wî nedihat zanîn. Piştî vê bûyerê gel şiyar bûbû û rabûbû ser piyan. Hikumet belav bûbû. Li welêt şoreşek pêk hatibû. Hîn piştre rojên aramiyê dest pê kiribûn.



**Nûçe 4**
**D.K (14 Salî)**

*Mercên jiyanê carinan mirov nabe ciyê ku dixwaze. Serra jî wek gelek mirovan mecbûr e jiyana ku dixwaze bidomîne.*

Serra 14 salî ye, qîza malbateke bextewar û halxweş bû. Lê belê di encama derketina şewatê de hemû malbata xwe winda kir. Ji nav wan tenê ew filitî bû.



ELÎF: Tu dikarî ji me re bi kurtasî qala malbata xwe bikî?

SERRA: Em malbateke gelek bextewar bûn. Diya min bijîşk, bavê min jî mamoste bû. Em du xwişk bûn. malbateke min a bextewar û biaram hebû.

ELÎF: Te malbata xwe çawa winda kir?

SERRA: Ji ber şewateke nediyar a di mala me de, min hemû malbata xwe winda kir. ELÎF: Şewat çawa derket?

SERRA: Em her kes di malê de raza bûn, şewateke nediyar derket.

ELÎF: We çawa xwe ji şewatê xelas kir?

SERRA: Cîranên ku dîtine ji mala me dûmana reş bilind dibe gihîştine alîkariya me. Di wê gavê de ez ne li ser hişê xwe bûm. Ez tam nizanim çawa xelas bûme. Gava min çavên xwe vekirin her der bûbû xwelî.

ELÎF: Polîsan çima tu sucdar kirî?

SERRA: Ji ber şoka ku ez jiyabûm bêyî ku bizanibim çi dikim hema ez reviyam. Ji ber vê jî gotin qey ez sûcdar im.

ELÎF: Gava ku tu ji polîsan reviya, tu çû cem kê, ku derê, çima tu çûyî?

SERRA: Ji ber ku tu nasê min tune bûn ji mecbûrî ez li kuçeyan razam. Ji bo ku karibim bijîm min dizî kir û hatim girtin.

ELÎF: Gava ku polîsan tu girtî cezayekî çawa dan te?

SERRA: Min di dadgeha zarokan de darizandin û cezayekî dirêj layiqî min dîtin.

ELÎF: Tu çi difikirî, ev biryareke adil bû?

SERRA: Bi ya min ev ne biryareke adil bû, çinku ez beredayî hatim sûcdarkirin û ji ber sûcekî min nekiriye cezayekî dirêj li min hat birîn.

ELÎF: Ji bo hevpeyvînê spas.

SERRA: Ez jî spas dikim.

**Çîrok 4**

Serra qîza malbateke bextewar û halxweş e. Rojekê li mala wan şewat derdikeve û ji nav wan tenê Serra xelas dibe. Serra ji bo dê û bavê xwe gelek xemgîn dibe. Wekî din jî ciyekî wê yê lê bimîne tune ye. Ji merivên wan tu kes li vî bajarî najî. Gava polîs tên Serra hêj devê xwe venake muameleya sûcdaran pê re dikin. Tenê riya xelasiyê ya Serra'yê rev e û bi hemû hêza xwe direve.  Polîs şopa wê winda dikin. Roja ewilî Serra bi birçîbûna xwe li kar digere. Lê belê kar nabîne. Hin fîrma ji ber ku salê wê biçûk e û hin fîrma jî ji ber ku dîplomaya wê tune ye ew nagire kar. Serra êdî nikare bitebite û diziyê dike. Çinku zikê wê gelek birçî bûye.  Gava polîs Serra'yê digirin cezayekî hefsê yê dirêj danê. Çinku sûc kiribû yan jî polîs wisa fikirî.



**Nûçe 5**
**D.A. (14 Salî)**

Li Stenbolê zarokek gava ku ji beqal nan dizî hat girtin.



D.A.'yê 11 salî bi xwişka xwe ya B.A. re li Kayişdagi tenê dijiya. Xwişk û bira debara xwe bi firotina destmalan dikirin. Rojekê B.A. nexweş ket û D.A. hemû pereyên xwe dan dermanan. Xwişk û bira birçî man. Li ser vê D.A. ji beqalekî nas nan bi deyn xwest, lê beqal got heta tu pere neynî ez nan nadim te. D.A.'yê wekî din çareya wî nema biryar da ku nan bidize û tam di gava ku ew ê bireviya de hat girtin û radestî polîs hat kirin. D.A.'yê ku avêtin nezaretê gotina wî ya ewil ev bû, 'xwişka min nexweş bû, em birçî mabûn'.

**Çîrok 5**

Ez Dîcle, 11 salî me, em du xwişk û bira ne, ez û xwişka xwe ya Berfînê destmal û tiştên wisa difiroşin û pê debara xwe dikin. Rojekê xwişka min Berfîn gelek nexweş ket, min hemû pereyên xwe dan dermanên wê, paşê perê me qet nema û em pir birçî bûn. Ez çûm beqal Husên min jê re got, "apê Husên ez dikarim nanekê bigirim, lê wek deyn, xwişka min gelek nexweş e, min hemû pereyên xwe dan dermanên wê." Apê Husên got, "Ooo! Me ev gelek bihîstine Dîcle, pereyê xwe bîne wisa nan bigire." Ez gelek xemgîn bûbûm, çavên min tije bûbûn, ji bo ku ez negirîm min xwe bi kotekî digirt, dîsa jî dilopek du dilop herikî, paşê min nanek girt û ji beqal baz da, ji bo xwişka xwe ez mecbûr bûm wê bikim. Apê Husên jî li pê min baz da. Min xwest ez gelek lez baz bidim lê nebû, ez girtim û ji bêrîka xwe telefona xwe derxist û li polîsan geriya, paşê ez girtim û avêtim vezaretê, tenê "JI BO NANKOKEKÎ!!!"



**Nûçe 6**
**F.G. (16 Salî)**



*Êdî zarokên qîzîn jî dest bi kapkaçiyê kirin.*

G.G.'ya 17 salî, gava ku xwest çenteyê C.A.'ya navsere ya ku mehmiza xwe nû ji bankayê kişandibû birevîne ji aliyê esnafên derdorê ve hat girtin û radestî polîsan hat kirin. G.G. xwest ku sedema kapkaçiya xwe vebêje, tenê got "min ji kêfa xwe nekir". Piştî ku C.A.'yê giliyê xwe paş ve kişand G.G. serbest hat berdan.

**Çîrok 6**

Gîzem pir li ber diya xwe diket. Difikirî ku çawa alîkariyê pê re bike, êşên wê çawa sivik bike. Ji aliyekî ve dixebitî û mesrefên malê derdixist, ji aliyekî ve jî tê dixebitî ku pereyên dermanên diya xwe bide ser hev. Gava ku Gîzem bi van re mijûl bû rojekê diya wê nexweş ket û birin ser bijîşk. Fêr bû ku divê diya wê emeliyet bibe û ket mitaleyan. Xwest ji nasên xwe deyn bixwaze, lê belê nasên wê deyn nedidan wê. Bi rojan ponijî û biryar da ku di jiyanê de tişta herî nebaş didît bike. "DIZÎ". Fikrên ez ê vê çawa bikim, ez ne diz im serê wê dixwar.



Sibeya din tê xebitî ku dev ji biryara xwe berde û derket derve. Xwest çenteyê jinika ku nû dîtibû bidize. Ên derdorê rewşê ferq kirin û ew bir polîsan. Polîsan Gîzem xist lêpirsînê û Gîzem her tiştî got. Lê ji wê bawer nekirin û avêtin nezaretê. Piştî ku rojekê di nezaretxaneyê de ma jinikê giliyê xwe paş de kişand û Gîzemê serbest berdan. Ji îro pê de rojên zehmet li benda Gîzemê ne.



**Nûçe 7**
**A.T. (14 Salî)**

Ji kurê bîst sal e winda ye ji diya wî re name hat.


Di nameya ciwanekî hevdeh salî yê ku demeke dirêj e winda ye ji malbata xwe re şandiye,"Dê û bavê min ên delal, ez dizanim demeke dirêj e we ji min agahî negirtiye lê niha ez xwediyê şîrketeke mezin im, şukir her tiştên min hene, êdî zilamekî profesyonel û rêzdar im. Li ciyên pêwîst nasên min ên girîng bila sax bin, ez ji qebetiyên xwe yên ciwantiyê xelas bûm, ez xwediyê şîrketeke bikar im, em muhîmatan(xwarin, çek hwd.) difiroşin Rojhilata Navîn, hûn dikarin bi min re şanaz bin. Ez ê hinekî pere ji we re bişînim, ger hûn hesabê xwe yê bankayê ji min re bişînin." Malbata ku hesabê wan ê bankayê tune bû li postaneyeke herî nêzîk hesabek vekir.

**Çîrok 7**



Ciwanek hebû 17 salî, qama wî 1.72, kîloya wî 65, ciwanek esmer bû. Tenê sûcek wî hebû li kesên derdora xwe dinêrî û wî jî sûc dikirin. Ên derdora wî cixare dikişandin û araq vedixwarin. Ev ciwan jî xwe li wan digirt û wî jî wek mal vedixwar. Gava van vedixwar kesê ku didît li wan dixist û gasp dikir. Piştre gava ku sûc dikir hinekî fikirî û got ez çima sûcên mezintir nakim. Û piştî wê demê ket malan û dest bi diziyê kir, erebeyan qundax kir. Paşê polîs li vî ciwanî geriyan, kirin nekirin nedîtin. Niha li ku ye nayê zanîn û lê digerin. Ez ê bibim çi ne diyar e lê ez kî me diyar e…

**Nûçe 8**
**E.B. (16 Salî)**



Îro em ê bi we re li çîroka E.B.'ya ku çawa jiyana xwe domandiye ku ew bi xwe jî nizane ji ku dest pê dike, ji devê wê guhdar bikin.

DÎCLE: Hin tiştên jiyana we ya ku beriya hûn bibin endamê çeteyê heye gelo, ên ku tên bîra we?

E.B.: Ji ber ku ciyekî min tune bû, tê bîra min ez li kuçeyan dimam. Ji bo ku ez karibim xwe ji talûkeyên kuçeyan biparêzim min wek kuran cil li xwe dikirin. Tiştek din jî baş tê bîra min, ji ber ku şansê min ê xebatê tunebû perê min jî tune bû, ji bo ku zikê xwe têr bikim an min ji çopê nan dida hev an jî min diziyê dikir. Hin deman jî ez birçî radizam.


DÎCLE: Tu çawa beşdarî çeteyê bû?

E.B.: A.K.'yê ku ji zarokên din ên ku em li heman herêmê dijiyan fêr dibe ku kesî min tune ye, di wan deman de mirovan dida parskirin. Min jî ji bo parsê bikim revandin.

DÎCLE: Hûn çawa gihîştin keça bi navê O.A. û we çawa ew revand?
E.B.: Gava em li derdorê dîsa ji bo diziyê digeriyan em li rastî keça bi navê O.A. hatin û em fikirîn ku dikare ji bo me parsê bike û me ew revand.
DÎCLE: We O.A.'yê li wir çi qas girt?
E.B.: Me O.A.'yê heftayekê li ciyê ku em dijîn girt.
DÎCLE: Çima hûn poşman bûn?
E.B.: Ji ber ku malbateke wê hebû li ser min bandor kiribû. Ji ber ku min nedixest zarok ji malbata xwe dûr bimîne, ew jî nebe wek min, min ew radestî malbata wê kir.
DÎCLE: Gava ku we O.A.'yê radestî malbata wê kir, helwesta malbata wê li hember we çawa bû?
E.B.: Spasiyên xwe ji min re kirin û ji bo ku qîza xwe dîtibûn gelek bextewar bûn.
DÎCLE: Tiştekî ku we ji bo jiyana xwe plan kiriye heye?
E.B.: Ewilî ez gelek dixwazim ji çeteyê veqetim û ji nû ve ji xwe re jiyanekê ava bikim



**Çîrok 8**
Ew zarokeke keç bû û mecbûr mabû ku bi tena serê xwe û li kuçeyan bijî. Rojekê ji aliyê kesên nasnameya wan nediyar ve ji kuçeyeke tenha tê revandin. Ev kes di eslê xwe de çeteyek in. Sedema revandina wan a E.B. firotina organên wê bû. Lê paşê dixwazin E.B. mezin bikin, bikin endamê çeteyê. Piştre wek ku dixwazin dibe. E.B. pêş xistin û dibe endamê çeteyê. Gava ku li derdorê dîsa ji bo ku zarokek birevînin digerin, li qîza bi navê O.A. rast tên. Gava fam dikin ku qîz winda bûye, wê direvînin. O.A., li ser E.B.'yê bandorekê çêdike û dixwaze vê keçikê bişibîne xwe. Tenê cudahiya wan ew e ku malbata O.A.'yê heye. E.B., biryar dide ku O.A.'yê radestî malbata wê bike. Lê belê çete nizanin kê O.A.'yê radestî malbata wê kiriye.



**Nûçe 9**
**D.A. (15 Salî)**
Êdî di her qoziyê de zarokên parsek ên ku çete ew didin xebitandin hene.

Malbatên zarokên wan pir ên ku ji Rojhilat tên bajarên mezin zarokên xwe didin çeteyan, ew jî parsekiyê dikin û ji çeteyan re pere qezenç dikin. Ev bi hewldana mezin a hêzên me yên ewlehiyê tên girtin û bajarên me dîsa vedigere paqijiya xwe.

**Çîrok 9**

Ez Abîdîn, 11 salî me. Em 4 xwişk û bira ne, xwişka min a Fîknat 8 salî, birayê min Abdî 7 salî, heka min Huzniye 12 salî, diya min Abdiye 32 salî, bavê min jî beriya ku ez bêm dinê miriye. Xwedê rehma xwe lê bike. Lê em dikarin diya xwe winda bikin, ger diya min dermanên xwe yên penceşêrê negire dê bimire. Paşê gava di rê de min mitale dikir ez rastî parsekek hatim û li pêşiya wî bi tonan pere hebûn. Min got ez jî parsê bikim, hem em ê bi pereyên ji wir werin zikê xwe têr bikin û hem jî me yê dermanên diya min pê bikiriya. Û min jî dest bi parsê kir, paşê polîsek sivîl hat, parsekê li cem min reviya, lê mixabin min nikarî birevim, ez hatim girtin. Min ji apê polîs beg re got, “min berde bi rastî jî pêdiviya min pê heye, diya min nexweş e divê ez ji wê re derman bistînim û bi min re pere tune ye.” Apê polîs beg ji min re got, “hiş be ûlan.” Min ji bo birevim dev li piyê wî kir, ew jî hêrs bû, piyê min şikenand û min avêt hefsê. Ew qas…



## Çîrok Ji Zarokên Amedê



**Çîrok 1**
**H.Y. (15 Salî)**

Zarok çima dixebitin?

Zarok naxwazin bixebitin lê ji ber ku bavê zarokan nikarin malê xwedê bikin dixebitin, ger Serokomar derfetên kar bida gel mesela wê debara xwe bikirana, febrîqe vekirana, market vekirana, dê bavê wan zarokan bixebitiyan û dê mala xwe pê xwedî bikirana. Dê zarokên wan nexebitiyan. Dê bavê zarokan ew bidana xwendin û bikirana xwediyê pîşeyekê û gava zarokên wan bibûna xwediyê pîşeyekê dê li malbatên xwe binêriyan û dê gelek baş xwe xwedî bikirana.



**Çîrok 2**
**A.F. (13 Salî)**



Onur Kurt û hevalên wî

Gava ku Onur Kurt hat temenê xwe yê ji xwe re hevalan çêke, ji xwe re li hevalên nû geriya. Hawira wî ya berê ya hevalan ne li gor wî bû. Hînbûyînên wan ên xerab ên wek diziyê hebûn. Onur jî ji bo ku ji wan xelas bibe hawira xwe ya hevalan guhert. Ji xwe re hevalên nû çêkirin. Li gor hevalên wî yên berê baştir bûn. Zû li hevalê xwe yên nû germ bû. Onur û hevalên xwe yên nû her roj lîstik dilîstin. Onur ji vê rewşê gelek razî bû û qet li hevalên xwe yên berê negeriya.



**Çîrok 3**
**C.H. (15 Salî)**



**Dîmen 1**

Onur Kurt zarokê malbatekê ye. Diya wî kevanî, bavê wî teqawît bûye. Onur Kurt diçe dibistana seretayî. Onur Kurt ji ber tevlî hevalên xerab bûye ew jî bûye zarokekî xerab. Onur Kurt dev ji dibistanê berdaye. Hezkiriyeke Onur Kurt çêbûye. Û Onur Kurt gelek ji wê hez kiriye. Piştî wê Onur Kurt biryar dide ku biçe Stenbolê. Onur bi dê û bavê xwe re axiviye. Lê dê û bavê wî destûr nedanê. Lê Onur biryar daye ku ji malê bireve. Onur ji xalê xwe re telefon kiriye û gotiye ez ê werim Stenbolê, ji xalê xwe re jî gotiye ji bo ku ez bixebitim ez têm, xalê wî gotiye were.

**Dîmen 2**

Onur Kurt biryar daye biçe Stenbolê. Ji hezkiriya xwe re telefon dike. Dixwaze hezkiriya xwe bibîne û hezkiriya xwe dibîne. Ji hezkiriya xwe re dibêje ji bo xebatê ez ê biçim Stenbolê û bi hezkiriya xwe re nîqaşê dikin. Lê mixabin Onur dîsa jî diçe Stenbolê.

**Dîmen 3**

Onur Kurt diçe Stenbolê û xalê xwe dibîne. Ji xalê xwe re dibêje ez ji bo kar hatime vir û dixwazim bixebitim. Xalê wî jî yekî riyên xerab e. Xalê wî çi qas riyên xerab hene ketiye wan riyan. Xalê wî dibêje, “di destê min ji bo te karekî xweş heye.” Onur dibêje, “ew karê tu dibêjî çi ye, ez ê çi bikim.” Xalê wî dibêje, “ew ê niha xebatkarê min nîşanî te bide.”

**Dîmen 4**

Di destpêkê de Onur ji bo bizanibe heter dike. Lê gava fam dike ku di dawiya kar de pereyeke pir heye ji vî karî re dibêje erê. Rojekê Onur Kurt derdikeve karê diziyê, ji bo diziyê bike dikeve dikana zêrgerekî. Ji zilam re dibêje, “hemû pereyên kaseyê derxîne, zêran derxîne.” Gava ku zilam nade, çeka xwe dirêjî zilam dike û li zilam dide, polîs tê.

*Ji bo Onur Kurt bigirin!*



**Çîrok 4**
**Ç.C. (15 Salî)**

Onur Kurt çima dixwaze biçe Stenbolê



Rojekê Onur Kurt gava ku dê ji mal derkeve zerfek ji diya xwe re hiştiye. Li ser zerfê çima diçe Stenbolê gelek nivîs nivîsandiye. Sedema wî ya çûyîna Stenbolê qezençkirina pereyan e. Li ser peyva çûyîna Stenbolê gelek xemgîn bûbû. Diya wî qet nedixwest Onur biçe Stenbolê. Lê Onur Kurt bi gotina diya xwe nekiribû û çûbû. Diya wî ji Onur Kurt re di serî de gotibû ku ger ku te li vir ji bo ku pereyan qezenç bike li karekî bigeriya û te kar bidîta wê gavê çûyîna te ya Stenbolê dê texîr bibûya. Lê Onur Kurt ji bo li Stenbolê bixebite ji hevalekî xwe re telefon vekiribû. Hevalê wî ji ber ku bêriya Onur Kurt kiribû û dê wî di karekî xweş de bida xebitandin bi gotina wî pir kêfxweş bûbû. Onur Kurt li Stenbolê mesela bixwesta biçe Topkapi Sarayi ji bo wî dê biçûya. Hevalê wî çûbû pêşiya Onur Kurt. Gava Onur Kurt ji hevalê xwe pirsîbû dê çi karî bike hevalê wî di serê xwe de karê diziyê derbas kiribû. Onur Kurt vê yekê qet nexwestibû. Mirov karê ku nexwaze nake. Ji ber ku dê hevalê wî pereyekî zêde bidayê qebûl kir. Mînakek nîşan da û êdî dest bi karê diziyê kir û wisa dewam kir. Domahiya jiyana xwe wisa domand.

Ne ji ber ku dê bidîta, ji xebitandinê poşman nebûbû



**Çîrok 5**
**H.O. (16 Salî)**

Jiyana Onur Kurt



Navê min Onur, paşnavê min Kûrt e. Bavê min teqawît bûye, diya min kevaniya malê, em heft xwişk û bira ne. Ez diçim pola 6'an. Hinekî rewşa me ya aborî ne baş e lê dîsa jî dê û bavê min ez didim xwendinkirin, ez jî naxwazim bixwînim, ji ber ku rewşa me ya aborî ne baş e, ez jî naxwazim wan têxim zorê. Her çi qas ez naxwazim bixwînim jî ew destûr nadin, ji ber ku naxwazin em bikevin rewşa xerab. Ez ji bo ku bixebitim xerciyên xwe yên dibistanê didim hev û ji xwe re alavên boyaxê distînim, piştî ji dibistanê derdikevim diçim dixebitim. Rojekê bavê min ji min ket şikê û ez şopandim. Û fam kir ez dixebitim. Destûr neda lê dîsa jî dixwazim bixebitim.



Ji bo ku bixebitim rojekê min bi bavê xwe re xeber da û min got ez dixwazim biçim Stenbolê. Wî jî got, "ma kî heye tu yê here Stenbolê." Min jî got, "ma ne apê min heye." Wî jî got, "apê te tune ye, ji yekî ku li me nagere, li me napirse re nebêje apo." Ez hêrs bûm û ji malê derketim û bi pereyên ku min dabûn ser hev ez çûm otogarê, min bilêta xwe birî. Êvarê ez derketim rê min telefonî apê xwe kir, ez pê re peyivîm. Min got, "ez têm wir." Wî jî got, "were li ser seran çiyê te heye." Min jê re got, " apo ji min re karekî bibîne." Wî got, "were karê te amade ye." Roja paşê ez gihîştim wir. Ez ji otogarê girtim. Em çûn mala wan me xwarin xwar. Min got, "apo karê min çawa bû", got, "hal bû."

Apê min got, " hadê em herin." Min jî got ev kar tiştekî çawa ye. Wî got, "bike tu yê bibînî." Onur Kurt got, "apo ez vî karî nakim." Gava apê wî got, "di vî karî de pereyeke mezin heye", pştî ku wê gotinê bihîst got, "temam". Û rojekê derket kar û gava diziyê dikir hat girtin. Ji ber ku ew nû bû hat girtin.

Va ye rewşa aborî mirov dixe çi halî!

**Çîrok 6**
**K.T. (13 Salî)**

Jiyana Onur Kurt

Onur Kurt 18 salî bû. Dibistana seretayî terikandibû. Sedema ku dibistana seretayî terîkandibû jî Stenbol bû. Onur Kurt Stenbolê merak dikir. Onur Kurt Stenbolê ew qas merak dikir ku rojekê biryar da ku bi dê û bavê xwe re biaxive, û ji wan re got “min biryar daye ez ê biçim Stenbolê”. Gava ku dê û bavê Onur Kurt ji bo çûyînê destûr nedan, Onur Kurt ji dê û bavê xwe xef dest bi berhevkirina pereyan kir û di navberê de roj derbas bûn. Paşê gava ku ji malbata xwe re dîsa got ez ê herim, wan dîsa destûr nedan.



Onur Kurt biryar da ku ji malê bireve. Û Onur Kurt ji malê reviya. Beriya biçe, xwestiye cara dawîn biçe hevala xwe ya keç bibîne. Li hevala xwe ya keç geriyaye û wê gazî parkê kiriye. Li parkê axivîn. Onur Kurt paşê li apê xwe yê li Stenbolê geriyaye gotiye, “ez ê bêm Stenbol. Were min bigire.” Apê wî jî gotiye, “temam ez ê bêm” û çûye Onur Kurt bigire. Apê wî ewilî ew biriye malê bi xwarin kiriye, paşê pirsiye, “ez karekî bidim tu yê bikî”. Wî jî gotiye, “ger kar li gor min be ez ê bikim.” Apê wî karê kapkaçitiyê pêşniyar kiribû. Onur Kurt nexwest bike lê gava apê wî zorê dayê Onur Kurt biryar da ku dest bi kapkaçiyê bike.



**Çîrok 7**
**K.P. (15 Salî)**

Ev yek ji malên ku rûxuyaye ya taxa me ye. Di van wargehan de zarok agir pê dixin, lîstik dilîzin. Derfetê kişandina cixare ya ku hînbûyîneke nebaş e û ji mezinan fêr bûne dibînin. Li vir tenê ne zarok, mezin jî hînbûyînên xwe yên nebaş bi cî tînin, ji van hînbûyînên ne baş jî kişandina baliyê, esrar, kişandina cixarê…



Ji ber ku qadên lîstikê yên zarokan tune ne, zarok diçin van derên bi mîkrop, zarok li cihên ku dixwazin lîstik bilîzin diçin nexweş dikevin.

Bi ya min di şûna van ciyan de divê qadên lîstikê bên avakirin.



**Çîrok 8**
**M.M. (16 Salî)**



Rojekê em ji kuçeyê dihatin, li pêşiya me zarok bi kevir û daran di kuçeyan de bi polîsan re pev çinîn. Yek ji zarokan bi kevir êrîşî erebeyan kir. Gava ku polîs bi aliyê zarokan de meşiyan, zarok kevir û daran firandin wan. Gava kevirên zarokan qediyan, reviyan. Polîs li pê wan çûn. Polîsan bi bêtêlê agahî da çevîk kuvet, panzer, toma 4, akrep û balafiran.

Gava balafir gaza îsotan avêt, çavên zarokan şewitîn, û polîs bi akrep, panzer, toma 4 û çevîk kuvet zarokan girtin, hin ji wan ketin hundir avahiyan xwe veşartin. Mi dît ku kamera hatin. Min polîs, akrep, toma 4, panzeran dîtin û ez çûm pêşiya kamerayê, wan ez jî kişandim û gava çûn min xwe di televizyonê de dît.



**Çîrok 9**
**M.U. (14 Salî)**

Du kes diziyê dikin



Rojekê gava ez çûm dikanê, ez ji du kesan ketim gumanê û ji ber ku ew ji min mezintir bûn min tiştek negot û ez ketim dikanê û derketim. Ew her du kes erebeyekê dişopandin. Û ez çûm malê, ez ji wan her du zilaman gelek ketim gumanê û paşê ez hinekî di pacê de mam. Min dît ku dixwazin erebeyê vekin. Min derhal ji diya xwe re got. Paşê ez li 155'ê geriyam û min navnîşan da. Wan her du zilaman jî erebe vekir, min digot qey zilam in. Lê zarokên 15-16 salî bûne. Erebe vekir, çûn û min jî plaka wan girt. Piştre polîs hatin û ez derketim derve. Ez çûm cem polîsan, min plakayê da wan. Wan jî dan pê şopa wan. Ez nizanim çi kirin.





**Çîrok 10**
**V.F. (13 Salî)**

Jiyana zarokên avê difiroşin

Ji bo ku pere bînin malê li goristanê avê difiroşin. Ji bo ku xerciyên xwe yên dibistanê derxînin dixebitin. Ji bo îdaniya xwe dixebitin. Ji bo cilan bikirin.

Çima dixebitin?

Gava pere hindik tê malê û pereyên kirê û cilan têrê nekin li goristanê avê difiroşin. Û gava bavê zarokên di xebatê de zehmetiyê dikişînin avê difiroşin. Hin zarok gava bavê wan dimirin wek mezinên malê dixebitin. Û ji bo ku karibin alavên dibistanê bikirin li goristanê avê difiroşin.

Di xebatê de zehmetî dikişînin.

Li goristanê hin zarokên mezin pereyên zarokên biçûk bi zorê ji wan distînin û dixwin. Hin diz tên çenteyên mirovên ku tên wan deran didizin, dibêjin qey zarokên avfiroş vê dike. Dibêjin ev dizîne û bêheq li me dixin û didin polîsan. Hin zarok jî li zarokên biçûk dixin û dibêjin li vir avê nefiroşin. Lê dîsa jî zarok avê difiroşin. Çinku ji bo ku ji malê re pere bînin divê bixebitin.



**Çîrok 11**
**Z.L. (14 Salî)**

Hevalek min heye, navê wî Zekî ye. Ew jî bi me re hat vê xebatê. Heta 3-4 hefteyan hat. Paşê nikarîbû bê, sedema wê jî ji ber rewşa aborî ya malbata wî nebaş bû, divê ew jî bixebitiya.



Paşê li Balikçilar, li cem sobefiroşan dest bi xebatê kir, divê ew li cem me bûya. Lê ji ber rewşa madî ya malbatê divê ew jî bixebitiya. Wî van zehmetiyan girt çav û niha satilên giran ên sobeyan hildigire, divê niha ew li vir bûya.

DIVÊ EW NEXEBITIYA.



**Çîrok 12**
**Z.D. (15 Salî)**



Onur Kurt zarokê malbatekê ye. Diya wî kevaniya malê bavê wî, teqawît bûye. Onur Kurt zarokekî diçe dibistana seretayî. Onur Kurt ji ber ku bi hevalên xerab re rabûye û rûniştiye bûye zarokekî xerab. Onur Kurt qet nexwestiye têkeve nav hevalên xerab, lê hevalên wî dikişîne xwe. Hezkiriyeke Onur Kurt çêbûye. Onur Kurt gelek ji wê hez kiriye. Onur Kurt ji ber ku êdî vê sefalet û tebatîbûnê nikare bikişîne biryar daye biçe Stenbolê. Onur bi dê û bavê xwe re xeber daye. Lê dê û bavê wî destûr nedane. Lê Onur biryar daye ku ji malê bireve. Ji ber vê li dê û bavê xwe guhdar nekiriye. Onur telefonî apê xwe kiriye û biryar daye biçe Stenbolê. Onur telefonî hezkiriya xwe dike û dixwaze wê bibîne û ji hezkiriya xwe re dibêje min biryar daye, ez ê biçim Stenbolê.

Onur ji malê direve û diçe Stenbolê û ji apê xwe re dibêje, “apo ez ji bo xebatê hatim Stenbolê.” Apê Onur dibêje, “min karekî baş ji te re dîtiye”, Onur jî dipirse, “karê ez ê bikim çi ye?”, apê wî dibêje, “ez ê ji te re bêjim”.

Dîsa rojekê Onur derdikeve diziyê û di dikana zêrgerekî de diziyê dike. Zilam destûr nade, Onur li dijî vî zilamî derdikeve. Onur Kurt li zilam dide û gazî polîs dikin. Polîs tê.



# JI ÇAPEMENIYÊ

**Müge İplikçi**
**Vatan**
**30.01.2012**

## Gelo Ez Sûcdar İm? Gelo Em Sûcdar İn? Gelo Ew Sûcdar İn?

'Ez hikumeta Tirk û Çînê protesto dikim.' Paul Aûster (Ev hevok ji aliyê nivîskarê navdar ê Amerîkayî ji bo di welatên ku di mijarên rojnamegerên girtî de di cîhanê de ketine pêşbaziyê gotiye. Spas Paul Auster.)

***

Serenivîsa ku min bi nivîsê ve kiriye li gotinên Paul Auster, li rastiya ji ber polîtîkayên çavnedîtî yên dewlet û hikumetan, cîhan bûye girtîgeheke mezin tê. Di ser de ji bûyerên ku di demên dawiyê de diqewimin em dizanin serê vî karî jî Amerîka dikişîne!

Lê belê di bin banê vî serenavî de îro ez ê projeyeke ku hêvî dide bi we re parve bikim. Ev projeyeke koçê ye û bi zarok û ciwanan re têkildar e, proje bi şîrikiya Weqfa Çand û Hunerê Ya Başakê û ÇAÇA'yê (Komeleya Zarok Di Bin Heman Banî De Ne) pêk tê. Beriya ku proje were qebûlkirin Weqfa Çand û Hunerê Ya Başakê ji sala 2003'an vir ve bi zarokên ku bi koça darê zorê hatine Kayişdagiya Stenbolê re dixebitin, ÇAÇA jî xebateke heman bi zarokên ku ji gund û bajarokên li derdorê hatine Amedê re berdewam kirine. Piştî ku proje ketiye jiyanê ev xebat ketine heman cihokê û bi 108 zarokên di navbera 12-18 salî de xebateke anketê hatiye kirin.

Encamên di van anketan de derketine, wek Stenbol û Amed cuda hatine nirxandin. Li têgehên wek edalet, sûcû şidetê zarok çawa dinêrin hatiye nirxandin. Li bersivên pirsên wek sedemên zarokan dixin nav sûcan çi ne, divê bergitiyên kirina sûcan bên girtin û ji aliyê kê ve were girtin, çawa were girtin dê bêhtir bi bandor be, geriyane. Hêviyên zarokan jî esas hatine girtin!

Di serê cudahiyên di navbera herêman de têgeha şidetê tê. Li gor zarokên mexdûrên koça mecbûrî yên li Stenbolê dijîn şidet di destê zilaman de ye. Zarokên li vir bersivên li ser şideta di nav malê de zêde dane. Lê şideta ku zarokên li Amedê destnîşan dikin şideteke giştî ye û şideteke li derveyî malê ye. Bersiva zarokên li Amedê ji bo pêşgirtina şidetê ev e: 'Belê dikare pêşiya şidetê were girtin.'

Beşek gelek hindik ji wan dibêjin 'Na pêşiya wê nikare were girtin.' Zarok difikirin ku bi axaftina mirovan a nav xwe de, guhdarîkirinê, zêdebûna têkiliyên navbera mirovan, geşbûna

empatiyê, zêdebûna perwerdehiyê, hezkirina mirovan a ji hevdu, başbûna ji hev re dê şidet kêm bibe. Jê wêdetir bawer dikin ku civakeke ku ji aliyê mirovên hevdu guhdar dikin maf û derfetên wan ên wekhev hene bê avakirin dê ji bo jiyînê civakeke xweştir be. Ev jî bê şik û guman xeyala civakeke demokratîk a 'lê tê gerîn' e!

Di xebata anketê de beşdar ji têgeha 'sûc' çi fam dikin, çawa pênase dikin, ciyekî girîng digire. Ji vê pirsê zarokên li Stenbolê bersivên wek 'kuştin, katilbûn, birîndarkirin, îftirakirina beleheq, şideta li hember jinê, cîneanîna zagonan, pêlêkirina zagonê, dizî, bikaranîna tiryakê, xerabiya bi her awayî, zordariya hêzdaran a li ser lewazan, her tiştên ku hevsengê xera dikin, zerara li hinekan a ji bo berjevendiyên xwe, xerabî, her tiştên derveyî rêgezan, her tiştên ku divê neyên kirin, bêçaretî' dane. Şîroveyên balkêş jî yên wek 'îftira kirin, zordariya hêzdaran a li ser lewazan, her tiştên ku hevsengê xera dikin' hatine kirin. Di bersivên ku di derbarê pêşîgirtina sûcan de jî li ser edalet, wekhevî, zêdekirina saziyên ku piştgiriya mirovan dikin, hatine rawestin. Wekî din jî alîkarîhezî, hindikbûna nefretê û perwerdehiya bi zimanê zikmakî jî serî dikişînin.

Kordînatora projeyê Sîbel Erdûman dide xuyakirin ku di vê projeya ku li Amed û Stenbolê hevdem tê meşandin de, pêşaneya fotografên ku ji aliyê zarokan ve hatine kişandin a bi temaya 'sûc' dê di 1-4 Reşemiyê li Depoya Tıtunê ya Stenbolê were nîşandan.

Ji bo ku têkiliya derzî û şûjinê were ferqkirin pêşaneyeke îdeal e... An jî ji bo tenê ji çavên zarokan sûc çi ye were dîtin.

**Banu TUNA**
**Hürriyet**
**11 Reşemî 2012**

## Zarok Çawa Dibin Tînerkêş?

Em naxwazin nifşên tînerkêş mezin bibin ya, gelo riya vê sêwiranên nifşên oldar in? Gelo zarok çi dixwazin? Gava ku daxwazên wek lihevkirin, edalet, aştî, azadiyê ji devê wan derdikevin pêwist nake ku em baldartir guhdar bikin?

Vê heftê li Depoya Titunê ya Tophaneya Stenbolê pêşaneyeke bêdeng a sê rojan domiya hebû: 'Ez sûcdar im? Em sûcdar in? Ew sûcdar in?'

Ne pêşaneyeke hunerê ye, di eslê xwe de encamên projeyeke bi zarok û ciwanan re pêk hatiye ye. Projeya hevpar a Weqfa Çand û Hunerê Ya Başakê ku li Stenbolê bi zarok û ciwanan re dixebite û Komeleya Zarok Di Bin Heman Banî De Ne ya ku li Amedê bi zarok û ciwanan re dixebite ye. Sedemên ku zarok dikevin nav sûcan û ji bo ku sûc were astengkirin ji aliyê kê, kîjan bergirî werin girtin hatine lêkolînkirin. Mebest, ji bo ku gotin û têgihîştina zarokên ku ketine nav sûcan an jî neketine, bîrxistinekê çêbike.

Pêşî li Stenbol û Amedê bi 108 zarok û ciwanên ku ji ber koçê û koça darê zorê hatine van deran re anket çêkirine. Paşê ji zarokên ku komên du kesî çêkirine çîrokek xwestine, ji bo çîrokan jî ji jiyana xwe îlham girtine. Van çîrokan, bi fotografekî ku ew bi xwe leheng in vegotine. Li Stenbolê her fotografê ku zarokek kişandiye yê din kiriye nûçe. Mebest, ji bo di derbarê têgihana medyayê de fikreke zarokan çêbibe. Li ser navê xwe min yeka ku ez girîng dibînim girt vê derê. Mîna ku hûn ê li jêrê bibînin, cudahiya çîroka rastîn û nûçeyê, gelek zelal derdixe holê ku ev zarok pir baş dizanin ku ji derve (taybet ji aliyê medyayê ve) li wan gelek cuda tên nêrîn. Di cudahiya navberê de zarok ji me re dibêje ku; “Tu bi min re mijûl nabî, ez kî me, bi mercên ku ez dijîm re tu eleqeder nabî, tu meraq nakî û tu bijartparêz î.”

Di pêşaneyê de 42 fotograf, 21 çîrok û 9 jî çîrokên hatine nûçekirin hebûn. Min hemûyan yek bi yek xwendin, ez dixwazim ev ên min li jêrê bijartine hûn jî bixwînin. Ev çîrokên zarokên hîn 11 salî ne, lê neçar mane ku mezin bibin in. Çîrokên ku di nav wan de mirin, tiryak, bêedaletî, şidet heye. Em ê niha çi bibêjin, qey em ê bêjin ‘ger ev zarok hinekî din oldar hatibûna mezinkirin dê wiha nebûya’? Baş e, ew ê pergala ku ‘çevîk kuvet, panzer, toma 4, akrep’ xistiye devê zarokekî/ê çawa bibe?

Ha di vê navberê de, di anketê de wan pirsîne, “gava edalet tê gotin çi tê hişê we?” Bersiva zarokên Stenbolê jî yên Amedê jî heman e: Azadî, wekhevî, demokrasî, heq û hiqûq, aheng, axaftina bi zimanê xwe yê zikmakî.

Pihîna li dil

**Çîrok 2**

Şevîn hîn 11 salî ye. Di malbateke 4 kesî de li Osmaniyeyê dijî. Di meha Remezanê de diya wê Nermîn Xanim ji bo ku ji paşîvê re xwarin amade bike diçe metbexê. Sifreyê amade dike. Lê belê ferq dike ku dem hêj zû ye mêrê xwe Alî Beg şiyar nake. Ew jî diçe ser ciyê xwe û radizê. Demek paşê Alî Beg şiyar dibe, diçe ser sifreyê û di wê gavê de bang tê xwendin. Bi hêrsa wê kêliyê pihînekê li dilê Nerîman Xanim dixe. Û Nerîman Xanim bi zarokê di malzaroka xwe de jiyana xwe ji dest dide. Şevîna ku van bûyeran dibihîse (dibîne) derûniya wê xera dibe û dixwaze hezkirin û hurmetê di kuçeyan de bibîne. Şevîna ku dest bi tiryakê kiriye her gavê dubare dike ku hemû sûc ê wê ye û her tişt ji rûyê wê qewimiye.

Zarokên ku çete ew didin xebitandin

**NÛÇE 8**

Êdî di her qoziyê de zarokên parsek ên ku çete ew didin xebitandin hene.

Malbatên zarokên wan pir ên ku ji Rojhilat tên bajarên mezin zarokên xwe didin çeteyan, ew jî parsê dikin û ji çeteyan re pere qezenç dikin. Ev bi hewldana mezin a hêzên me yên ewlehiyê tên girtin û bajarên me dîsa vedigere paqijiya xwe.

Min ew gez kir, piyê min şikand

**Çîrok 8**

Ez Abîdîn, 11 salî me. Em 4 xwişk û bira ne, xwişka min a Fîknat 8 salî, birayê min Abdî 7 salî, heka min Huzniye 12 salî, diya min Abdiye 32 salî, bavê min jî beriya ku ez bêm dinê miriye. Xwedê rehma xwe lê bike. Lê em dikarin diya xwe winda bikin, ger diya min dermanên xwe yên pençeşêrê negire dê bimire. Paşê gava di rê de min mitale dikir ez rastî parsekekî hatim û li pêşiya wî bi tonan pere hebûn. Min got ez jî parsê bikim, hem em ê bi pereyên ji wir werin zikê xwe têr bikin û hem jî me yê dermanên diya min pê bikiriya. Û min jî dest bi parsê kir, paşê polîsek sivîl hat, parsekê li cem min reviya, lê mixabin min nikarî birevim, ez hatim girtin. Min ji apê polîs beg re got, “min berde bi rastî jî pêdiviya min pê heye, diya min nexweş e, divê ez ji wê re derman bistînim û bi min re pere tune ye.” Apê polîs beg ji min re got, “hiş be ûlan.” Min ji bo birevim dev li piyê wî kir, ew jî hêrs bû, piyê min şikenand û ez avêtim hefsê. Ew qas…

**Çîrok 5**

Ez Dîcle, 11 salî me, em du xwişk û bira ne, ez û xwişka xwe ya Berfînê destmal û tiştên wisa difiroşin û pê debara xwe dikin. Rojekê xwişka min Berfînê gelek nexweş ket, min hemû pereyên xwe dan dermanên wê, paşê perê me qet nema û em pir birçî bûn. Ez çûm dıkandar Husên min jê re got, “apê Husên ez dikarim nanekê bigirim, lê wek deyn, xwişka min gelek nexweş e, min hemû pereyên xwe dan dermanên wê.” Apê Husên got, “Ooo! Me ev gelek bihîstine Dîcle, pereyê xwe bîne wisa nan bigire.” Ez gelek xemgîn bûbûm, çavên min tije bûbûn, ji bo ku ez negirîm min xwe bi kotekî digirt, dîsa jî dilopek du dilop herikî, paşê min nanek girt û ji dıkanê baz da. Apê Husên jî li pey min…

Min xwe di televizyonê de dît

**Çîrok 10**

Rojekê em ji kuçeyê dihatin, li pêşiya me zarok bi kevir û daran di kuçeyan de bi polîsan re pev çinîn. Yek ji zarokan bi kevir êrîşî erebeyan kir. Gava ku polîs bi aliyê zarokan de meşiyan, zarok kevir û daran firandin wan. Gava kevirên zarokan qediyan, reviyan. Polîs li pê wan çûn. Polîsan bi bêtêlê agahî da çevîk kuvet, panzer, toma 4, akrep û balafiran.

Gava balafir gaza îsotan avêt, çavên zarokan şewitî û polîs bi akrep, panzer, toma 4 û çevîk kuvet zarokan girtin, hin ji wan ketin hundir avahiyan xwe veşartin. Mi dît ku kamera hatin. Min polîs, akrep, toma 4, panzeran dîtin û ez çûm pêşiya kamerayê, wan ez jî kişandim û gava çûn min xwe di televizyonê de dît.

**Feryal Saygılıgil**

**Mesele, Hejmar 63**

**Sûcdar Kî Ye?**

Bi aliyê neolîberal ê kapîtalîzmê, ji salên 1970'î vir ve pêş dikeve ve dewleta civakî wateya xwe winda dike. Ji bo civakê islahkirina komên bixetere/marjînal/ên nayên xwestin, derdikeve pêş. Ev kom yanî xizan, seqet, hevezayend, bêkar, koçber, zarokên tînerkêş tên daxkirin; parastina civakê ya ji wan, islahkirina wan ji bo bekaya pergalê gelek girîng e. Ji ber ku feraseta dewleta civakî ciyê xwe ji dewleta sivîl re hiştiye, sedema xizaniyê, tunebûnê di kesan de tê dîtin. Li gor vê ferasetê birçîbûn û xizanbûna kesekî xetaya wî ye. Divê em şîretên wisa li zarokên xwe jî bikin û wan perwerde bikin. Tevgerên li dijî vê bê ceza namîne. Ger bê bîra we bi sedema ku bi rizaya wê ye, kesên ku tecawuzî zaroka sêzdeh salî kiribûn bi cezayê herî jêr hatin cezakirin û di heman pergala hiqûqê ya Tirkiyê de ji ber ku beqlewe dizî bûn, cezayên giran li çar zarokan hatibû birîn. Çar zarokên ku şeva 10 Gelawêj 1997'an li Dîlokê deriyê dikana Gulluogluyê namdar şikandibûn û beqlewe û fisteqên entabê dizîbûn neh sal ceza li wan hat birîn. Lê ji ber ku sê zarok di mêjûyê dîrokê de di biniya 18 salî de bûn, cezayên wan daketibû şeş salan. Dîsa di sala 2001'ê de sê zarokên di çaxa lîseyê de ji ber ku ji ber bêperetî û birçîbûnê çokokrem, çîkolata û biskuvî dizîbûn, hatibûn girtin û di derbarê wan de doz hatibû vekirin û heşt sal ceza ji wan re dihat xwestin.4

Nûçeyên di derbarê zarok ji ber birçîbûnê dizî kirine û li hember vî cezayên gelek giran li wan tên birîn di medyayê de gelek cî girtin; lê li vê derê mijar bi aliyê kirdeyên nûçeyan re nehat axaftin, hinekên din, ji aliyê mezinan ve hat nîqaşkirin. Kirdeyên pêşaneya ku ez ê behsa wê bikim jî zarok in. Ji bo zarokên mexdûrê koçê "sûcdar"bûn çi bû, vê rewşê çawa bîr dibirin, çawa şîrove dikirin? Pêşaneya bi mijara "koç, sûc, zarok" bi navê "Ez sûcdar im? Em sûcdar in? Hûn sûcdar in?" di 4-8 Reşemî 2012'an li Tutun Deposiya Tophaneya Stenbolê bersivê ji van pirsan re digeriya. Ev pêşane encama atolyeya fotografan a yek ji xebatên projeya heşt mehan a ku Weqfa Çand û Hunerê Ya Başakê û Komeleya Zarok Di Bin Heman Banî De Ne bi hev re hat meşandin. Fotograf û metnên di pêşaneyê de cih digirin li Stenbol û Amedê ji aliyê zarokên 15-18 salî ve hatine hilberandin. Di xebata fotograf û metnan de ya ku li Stenbolê hatiye meşandin de komên ji du kesan pêk tên hatine çêkirin. Ji du zarokan yek ji jiyana xwe derketiye rê, çîrokek nivîsandiye û wek lehengê/a vê çîrokê portreyê xwe bi cî kiriye; zarokê din jî fotografê ku hatiye kişandin kiriye nûçe. Di komên Amedê de jî ji ber ku zarok nekarîbûne qala xwe bikin, bi karekterê ku afirandine temsîliya xwe afirandine.

Yek ji çîrokên di pêşaneyê de cih girtiye wisa ye: **"**Şevîn hîn 11 salî ye. Di malbateke 4 kesî de li Osmaniyeyê dijî. Di meha Remezanê de diya wê Nermîn Xanim ji bo ku ji paşîvê re xwarin amade bike diçe metbexê. Sifreyê amade dike. Lê belê ferq dike ku dem hêj zû ye, mêrê xwe Alî Beg şiyar nake. Ew jî diçe ser ciyê xwe û radizê. Demek paşê Alî Beg şiyar dibe, diçe ser sifreyê û di wê gavê de bang tê xwendin. Bi hêrsa wê kêliyê pihînek li dilê Nerîman Xanim dixe. Û Nerîman Xanim bi zarokê di malzaroka xwe de jiyana xwe ji dest dide. Şevîna ku van bûyeran dibihîse (dibîne) derûniya wê xera dibe û dixwaze hezkirin û hurmetê di kuçeyan de bibîne. Şevîna ku dest bi tiryakê kiriye her gavê dubare dike ku hemû sûc ê wê ye û her tiştî ji rûyê wê qewimiye.

4 Semra Pelek, Rojnameya Milliyetê, 20 Rêbendan 2002.

Nûçeya wê jî wisa ye: “Zarokeke nîvê şevê li parkeke tenha ya semta Osmaniyeya Stenbolê tena serê xwe digere, bi agahdayîna kesên li derdorê re radestî rayedaran hat kirin. Hat famkirin ciwanê ku radestî rayedaran hat kirin heftayek li kuçeyan e. Şevîn heftayeke berê li Osmaniyeyê piştî ku bavê wê diya wê kuşt li kuçeyan dest bi jiyanê kir. Diya Şevîn Nermîn Xanima ducanî, şevekê ji bo ku dereng radibe paşîvê, mêrê wê Alî Beg bi vê rewşê diqehere û bi pehînan wê dikuje. Derket holê Şevîna ku piştî bûyerê travmayeke giran derbas dike li kuçeyan dijî û car caran jî tiryak bi kar aniye. Bijîşkê ku Şevîn muayene kir da xuyandin ku Şevîn di encama travmayeke giran de ji bûyeran xwe berpirsiyar dîtiye.

Çîrokeke din jî, “Ez Dîcle, 11 salî me, em du xwişk û bira ne, ez û xwişka xwe ya Berfînê destmal û tiştên wisa difiroşin û pê debara xwe dikin. Rojekê xwişka min Berfîn gelek nexweş ket, min hemû pereyên xwe dan dermanên wê, paşê perê me qet nema û em pir birçî bûn. Ez çûm beqal Husên min jê re got, “apê Husên ez dikarim nanekê bigirim, lê wek deyn, xwişka min gelek nexweş e, min hemû pereyên xwe dan dermanên wê.” Apê Husên got, “Ooo! Me ev gelek bihîstine Dîcle, pereyê xwe bîne wisa nan bigire.” Ez gelek xemgîn bûbûm, çavên min tije bûbûn, ji bo ku ez negirîm min xwe bi kotekî digirt, dîsa jî dilopek du dilop herikî, paşê min nanek girt û ji beqalê baz da. Apê Husên jî li pê min…”

Dîsa çîrokeke din, “Rojekê em ji kuçeyê dihatin, li pêşiya me zarok bi kevir û daran di kuçeyan de bi polîsan re pev çinîn. Yek ji zarokan bi kevir êrîşî erebeyan kir. Gava ku polîs bi aliyê zarokan ve meşiyan, zarok kevir û daran firandin wan. Gava kevirên zarokan qediyan, reviyan. Polîs li pê wan çûn. Polîsan bi bêtêlê agahî da çevîk kuvet, panzer, toma 4, akrep û balafiran.

Gava balafir gaza îsotan avêt, çavên zarokan şewitîn û polîs bi akrep, panzer, toma 4 û çevîk kuvet zarokan girtin, hin ji wan ketin hundir avahiyan xwe veşartin. Min dît ku kamera hatin. Min polîs, akrep, toma 4, panzeran dîtin û ez çûm pêşiya kamerayê, wan ez jî kişandim û gava çûn min xwe di televizyonê de dît.”

Bi xebata anketê re ya ku di çarçeveya projeya bi navê “Ez sûcdar im? Em sûcdar in? Hûn sûcdar in?” a ku kordînatoriya wê Sîbel Erdûman dike de li Stenbol û Amedê bi 108 zarokan re hevdîtin hatiye kirin. Pirsên wek li têgehên edalet, sûc, wekhevî, şidet hwd. çawa dinêrin, ji zarokan hatine pirsîn û ji bo çareseriyê xwestina hin tiştan bi dest bixin. Wekî din pirsên wek wargeh, zimanê tê bikaranîn, hejmara kesên di heman xaneyê de dijîn, rewşa civakî-aborî jî hatine pirsîn. Ger em ji encaman hinekan ragihînin: “Zarokên li Amedê ji bo zarokên ji xwe mezintir têgeha zarokên mezin bi kar tînin û didin xuyakirin ku koma herî zêde şidetê dikin ev kom e. Zarokên li Stenbolê vê têgehê bi kar naynin. Li Amedê koma herî zêde şidetê dikin mamoste ne. Li Stenbolê zilam di nav koma herî zêde şidetê dikin de ne, li Amedê kêm beşdar bersiva zilam didin. Li Amedê ligel hejmara zêde ya zarokên li kuçeyan dixebitin jî zarokên li kuçeyan dijîn tune ne. Dîsa li Amedê zimanê zikmakî yê zarokan kurdî ye. Li Amedê di xebata li kuçeyan de ji aliyê zayendê ve cudahî tune ye.”

Li gor zarokên ku di anketê de bi wan re hatine axaftin ji bo ku pêşiya sûcan were girtin divê edalet, wekhevî, saziyên piştgiriyê bidin mirovan, alîkarîhezî, hindikbûna nefretê, serbestiya zimanê zikmakî hebin. Pêşane ji bo ku em karibin ji nû ve li ser têgehên maf, edalet, wekhevî û exlaqê bifikirin û çîrokên zarokên li kuçeya dijîn, “parsê, kapkaçiyê” dikin, tîner dikişînin, nan didizin dibe hinceteke baş.

**Pınar Öğünç**
**Radikal**
**23 Nîsan 2012**

**Li Ser Pîrozgeha 23'yê Nîsanê Wan Bidin Rûniştandin**

Cidîgiritna zarokan wêrekî dixwaze. Zarokekî/e rola xwe ji ber nekiribe hûn dikarin di wê paldankê de bidin rûnişkandin? Mesela mexdûrekî/e TMK'yê?

Saet bû çi? Zarokên ku dê hevokên xwe yên çend beden ji mezinan biçûktir bi wan hatine ezberkirin dê li ser paldankê di 20 deqeyan de bêjin cihê xwe girtine gelo? Li cem wan serokê Meclîsê, serokwezîr, mezinê wan parêzger, gava ku bi awayek, ku hûn dest bidin wan dê bikenin disekinin, flaş pê ketin gelo? Cidîgirtina zarokan wêrekî dixwaze. Bi rastî divê hûn ji tiştên ku bibihîsin re amade bin.

Roja 31'ê Adarê bû. Di pêşengiya Weqfa Çand û Hunerê Ya Başakê ku bi awayekî bêdeng karên gelek girîng dikin de paneleke têgehên zarok, koç û sûc anî ba hev, hat li dar xistin. Wê rojê her çi qas em mezin axaftvan bûn jî axaftina herî baş zarokên ku ji bo pêşaneya bi navê 'Ez sûcdar im? Em sûcdar in? Hûn sûcdar in?" fotograf kişandibûn û metn nivîsandibûn kirin. Piraniya guhdaran mezin bûn, lê di dawiyê de pirsên herî baş van zarokên 10 salî ku hemû mexdûrên koça darê zorê bûn kirin.

**Pirsên rast ev in**

Pêwistî bi navan tune ye. Mesela yekî got: "Tirkiye, Peymana Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî îmze kiriye. Sê xalên ku ji aliyê her kesî ve hatine qebûlkirin, lê ji aliyê Tirkiyeyê ve nehatine qebûlkirin hene. Çima?"

Ev pirseke ew qas zelal e ku, werin vê keçikê di paldanka serokwezîr de bidin rûniştandin. Bila ji wezîrên xwe bipirse bê çima em xalên 17, 29 û 30'emîn qebûl nakin? Navberekê me hêviyekê dabû ku me yê îtiraza xwe rakira, paşê çima me ji pakêtên demokratîkbûnê derxistin? Bila ew jî ji Lozanê dest pê bikin û bersivê bidin. Bila li ser van xalên ku ambargo danîne ser wan ku ev xal ji azadiya xweîfadekirinê, perwerdehiyê, jiyandina çanda xwe û mafên bikaranîna zimanê xwe pêk tên kemkumê bikin.

Paşê zarokekî kur ku 10 saliyên xwe nêvî kiribû pirsî: "Mafê polîsan ê ku hema li ciyê xwe li me bixe heye?" Ji vê pirsa ku qet zîvironekên wê tune ne encax hûn dikarin bersiva "na" bidin. Hinek wê de jî bîranînekî wî hebû ya ku bi me re parve bike. Bi komeke ji pênc kesan pêk tê û di nav wan de ew tenê kurd e re digere. Heta gotinên kurdî fêrî wan dike, her çar jî hevalên wî yên nêz in. Gava ku dibînin polîs bi ser wan de tên, dest bi bazdanê dikin. Dibêje, "Ez reviyam, çinku li gor tiştên ku heta wê gavê ji min re hatibû gotin min got qey ew ê li min bixin." Gava her pênc tên girtin û li nasnameya wan dinêrin, ji nav wan tenê ew lêdan dixwe. Li hember me zarokek dipirse, "Mafekî wisa yê polîs heye?" Hûn amade ne ku vê pirsê ji zarokekî li paldanka parêzger rûniştiye bibihîsin?

**'Ji zarokan re silav'**

Ji bo îro min dikarîbû van binivîsanda; tirsa derengmayîna provaya 23'ê Nîsanê, tatêla dê û bavên ku "qe nebe bila tiştekî paşê jî karibe li xwe bike be" a ku her roj diçin ber deriyê dibistanê, mamosteyên ku leşkerê di hundirê zarokan de kifş dike yê ku gava zarokan bi

awayekî leşkerî didin meşandin û tevdê wê dê ji aliyê rastê an jî çepê bidin zîvirandin, pêşbaziyên bi awayê herî jidil ê xwendina helbestan, di meha Nîsanê de gava ji serman dikefilin û tişta herî baş bêhna herî xweş a gihayên stadê… Lê êdî gava 23'ê Nîsanê tê gotin tiştên ku zaroktiyê didin jibîrkirin ewilî tên bîra min. Zarokên qîz ên ku hîn di temenê bi bebikan bilîzin de ne tên zewicandin, ên ku hêj neketine 10'ên xwe bi fîşekên dewletê dimirin, zarokên ku gava bi roj dixwendin û bi şevê jî diçûn qaçaxê bi Heronan ser wan tên xêzkirin, mexdûrên tacîzê yên girtigeha ku lê hatine neqilkirin ji aliyê Meclîsê ve 'super' tê dîtin, ên ku di tecawuza ku li wan hatine kirin de li rizaya wan tê gerîn, zarokên mexdûrên TMK'yê yên ku bi guhertina zagonê serbest hatin berdan û piştî ku temenê  wan bû 18, yek bi yek dîsa hatin berhevkirin…

Di wê roja panelê de min çingînî ji guhê antropolog, rojnameger Müge Tuzcuoglu ya xwediyê pirtûka bi navê 'Ez Kevirek im' û niha ji ber operasyona KCK'ê girtiye anîbû. Hem ji ser vê pirtûka wê ya ji bo fam bike çîroka 13 zarokên kurd nivîsandiye û hem jî ji ber wê nameya wê ya ku ji girtîgehê şandiye… Di dawiyê de digot "Hûn dikarin ji zarokên min re slavên min bibêjin?" Piştî wê panelê cara duyemîn, ji vir bibim qasida slavên wê.

Gerînendehiyên ewlehiyê di wexta xwe de ji bo ku karibin nêzîkî 'zarokên kevir davêjin' bibin ji wan re mûz kirîn, li navendên firoşgehan gerandin, bi wan re maç kirin, birin bowlîngê. Ka yekî/ê jî li wan paldankan bidin rûniştandin. Bila vebêje, hûn guhdar bikin, fam bikin ya… Ev edet jî ji tiştekî re biba.